


BERXWEDAN

BERXWEDAN JÎYANE

Hejmar 5

Sebat 1984

Biha 2,-DM



BERXWEDAN

TÊDAYÎ

Di dawên PKK de biryara
145 bidarvekirinên din
3

Çima rojiya mirinê?
4

Ma gelo sazûmana Özal
mal ji agir direvine?
5-6-7-8-9

Li Wan'ê çi dibe?
10-11-12

"Deriyên me ji wan re vekirine....
Hêviya me ew in...
13

"Ez, dilxwazekî PKK,
bi şoreşgerê wusa reserbilindim"
14-15

Provaqasyona cunta
faşista Tirk a nûh: KKTC
16-17-18

George Habbaş: "Ketina Arafat, ne
hilweşandina Şoreşa Filistin e!"
20-21-22-23

Qonaxa dawîya xwesipariyê!
24-25-26

Şerê Navbera Îran û Îraqê
û tewra Tirkiyê
27-28

Diroka gelê me bi bingeh
kaniya çanda wê dewlemend e
29-30-31-32-33

TÎYATRO -3-
34-35-36-37

BANG!
39

Berpîrsiyar

SERXWEBÛN
Postfach: 10 16 83
Neusser str 13
5 KÖLN 1

Xwendevanê Hêja;

Berxwedan, ku hejmara dawî di meha Tirhemê
1983an de hatibû weşandin, bi vê hejmarê,
nivîs û agahiyên nûh dişa dighîje destê we.

Berxwedan, ji bo kovareke hêja bighîjîne des-
tê xwendevanan, xebatê zor giran dimeşîne,
her çuqas di ev mehên werin de demderbasî çêbibin
jî, di wê bawerîyê de ye ku ev karûbarê giran wê
bighîjin armancên xwe.

Berxwedan bi alîkarîya we bihîm dibe; em
Berxwedan bixwînin, bidin xwendin û bi
name û nivîsan alîkarîyê pêre bikin.

Berxwedan
Sebat 1984

*Di Dawên PKK de***BÎRYARA 145 BÎDARVEKÎRÎNÊN DÎN!**

Di dadingahên mêtîngerên faşist dihat ditin dawên PKK de, li gel ji aliyê dadingahê biryara 62 bidarvekirinan hatin girêdan, du dawên din de biryara 145 bidarvekirinên din ji hate xwestin. Bona dilyên şer yê PKK hê di destpêkê de biryara mirinê eşkere dikin, di dadingahên mêtîngerên faşist yê cunta de, payhev daxû-yankirin kirin û xwestina biryarên bidarvekirinan, hercarê ji hêla dilyên şer yê şoreşger û girsên gel, bi protes-to û şiaran tî lîhember derketin.

Hêsîrên şer, yê di eywana dadîngahê de, girêdana xwe bi parti û gel re bê tirs qêrî dikin, di dadingah û girtî-gahê de li hemberê hingavtî û pîko-liyên tîm zêdetir dibin de, şanî kirin ku şopkarên mîrxas a serpêhatîya ber-xwedana PKK ne û dibêjin; cezayên mirinê, hingavtî û lêdan ji hêla kesên bo mafên xwedî rûmet û xwedî heq tekoşîn dajon re, rastî ev tewrên hana îspatên diyarin ku çawa dijmin bin-keftin dibe, har û dîn dibe ye.

Çend mehên talî de, di dadîngahên qolonialistê faşiste de dihatin ditin dawên PKK de, biryarên daxûyan bûn wûsa ne:

**DÎ DAWA PKK A
BATMANÊ DE
84 BÎDARVEKÎRÎN
TÊN XWESTÎN!**

Di dadingaha leşkerî a bin ser-leşkerîya girêdana awarta qolordîya heftemîn de, sekne dibû dawa PKK a Batmanê de, bona 84 kesên 155 caran bidarvekirin tê xwestin.

Di dawa PKK a Batmanê ku li Diyarbekir tê ditin de, 313 kes hene. Kesbûna, 84 mirovên derheqê wan de bidarvekirin tê xwestin hêj baş diyar nebûye.

**DAWA PKK-HÎLWAN Û
SÊWREKÊ A TALÎ DE
61 BÎDARVEKÎRÎN
TÊ XWESTÎN!**

Di dadingaha leşkerî li Diyarbekir tê ditin, dawa PKK a Hilwan û Sêwrekê de, dadgerê leşkerî ji 108 kesên derheqê 61 kesên de biryarê darvekirinê xwest.

Di sekna 20ê kanûnê 1983an de çêbû de, dadgerê leşkerî îddianama ji 18. kanûnê xwend û derheqê 61 kes, bidarvekirin daxwaz kir. Kesên derheqê wan de bidarvekirin tê xwestin evin: Îsmail Ahnaz, Celalettin Ahnaz, Lami Agirman, Kemal Aktaş, Ali Agirman, Mahmut Aydin, Ahmet Altınyüzük, Halil Ağırç, Mahmut Ağırç, Veli Ağırç Abdulkadir Atim, İzzet Baykal, İrfan Babaoglu, Ramazan Çat, Mehmet Çat, Ali Çobanyıldız, Nurettin Çatalak, Hasan Demir, Celalettin Delibaş, Eyup Demir, Mustafa Delen, Abuzer Dehşet, bozan Gultekin, İrfan Güler, Ramazan İlhan, Mehmet Kancak, Hamit Kandal, Muzaffer Kevci, Salih Dodanlı, Mehmet Dodanlı, Bekir Dodanlı, Mehmet Dodanlı, Seydi Dodanlı, Abdulkadir Dodanlı, Hasan Man, Kadir Manav, Salih Ogaç, İbrahim Halil Öcal, Ramazan Ödemiş, Fuat Ökten, Suleyman Pertav, Mehmet Sabali, Halil Kayan, Ramazan Ülek, Fevzi Yetkin, Mustafa Yetkin, Guli Basmaci, Saadettin (Sadun) Sevgat, Mustafa Yüksekayla, Remzi Geyik, Osman Gültekin, Budak Karamanli, Kazim Kiliç, Celal Kiliç, Ali Kiliç, Cevher Kandal, Emin pertav.

Di îddianama dadgerê leşkerî ku ji 49 rûpelan pêkhatibû de, bilî wan di derheqê 24 kesên bi kêmasî heryek 11 sal, derheqê 15 kesên navbera 5 û 10 salan, derheqê 8 kesên navbera 3 û 5 salan ceze girtî hiştina giran hate xwestin.

**DAWA PKK A
ELEZÎZÊ DE
6 KES CEZAYÊN
GÎRTÎMAYÎNÊN
BABETÎ GÎRTÎN**

Dawa PKK a Elezîzê ku li dadîngaha leşkerî a girêdana awarte Elezîzê de dihat ditin de, 6 kes cezayên babetî girtin. Dawa bi 16 kesên de, 10 kes ji ber kêmasiyên delîlan hatin berdan.

Mîna ku sereketîya girêdana awarte diyar kirî, kesên derheqê wan de ceza hatî dayîn, evin:

Engin Karaaslan 13 sal 4 meh, Mahmut Aker 5 sal 6 meh 20 roj, Muharrem Karagul 3 sal 8 mih 13 roj, Nuri Işık 6 mih 20 roj, Turgay Işık 6 meh 20 roj û Mehmet Özçelik 5 sal 6 meh 20 roj.

Di vê dawê de "berbidadîngeh dibûn": Devrim Akdeniz, Ertan Karagöl, Akman Gedik, Hasan Işık, Abdurrahman Yıldırım, Hayrettin Kızıltaş, Mehmet Bilir, Huseyin Yuce, Mehmet Bingöl û Yakut Bingöl, ji ber kêmasiyên delîlan hatin berdan.

**DAWA PKK A QERSÊ DE
DU KES,
CEZAYÊN GÎRAN
GÎRTÎN!**

Dadingaha leşkerîya yekemîn a girêdana awarta qolordîya nehemîn de tê ditin, dawa PKK a Qersê de du kes heryek 6 sal û 8 meh, cezayên giran girtin.

Bi bawerîya ku li dora Qers û Ardahanê propexendekirine, endamê PKK ne, ceza kesên girtin evin: Selahattin Yavuz û Kerem Akbaş.

Ev nivîs, sedemê rojîya mirinê ya di 2. Êlûnê 1983an de hatibû destpêkirin, hatibû nivîstin. Ji ber ku rojîya mirinê, a ji hêla hêstîrên şer yên PKK ve di meha Çile 1984an de hatiye destpêkirin manake din nagre, me weşandina vê nivîsê liçih dît.

Berxwedan

ÇIMA ROJÎYA MİRINÊ?

Di bin hemû pêkanînên nemirovî, hov û zerpên dijwar, êrişa qolonyalistên Tirk de, nexasim di bin nîrê pêkanînên van sê salan de, ku hêza qolonyalist binxistin û temirandina berxwedanê daye pêş xwe, bê guman di van hoyên dijwar de, bê rawestandin, tewr û hêza berxwedanî pêş ketiye û bilintir bûye.

Bi ve rewşa eşkere li hember hemû dijarî û pêkanînên hêza qolonyalisttan, girtixana Diyarbekir bûye, bircek bilind û bendeka bi hêz.

Hêzên qolonyalist, karbidestên faşist li pêş hemû nemirovî, hov û pêkanînên xwe yê dijwar, şervanên PKK hember xwe rawestandî dine. Û bi tewrên berxwedanî, tekoşîna şoreşê bilind kirine. Li ber hemû dijarîyan, bi canfidaî û wundabûnên giranbiha tewrê xwe domandine, û di vî alî de sistî nişan nedane.

Di vê pêvajoya hêza qolonyalist serdestxistina serxwariyê amanc kirîye, berxwedanên PKK ji bo pûçî û betalbûna amanca qolonyalisttan û ji bo pêşxistina tewrê berxwedanê canê xwe danine holê. Û di hoyên dijwar de tewrê şoreşgerî di girtixanan de serdest kirine, leystik û destikên dijmin betal hiştine. Bi berxwedan û tewrên bê emsal ji, girtixanên Diyarbekir bûne birca gelê me, hember qolonyalisttan rawestiya ye.

Xeleka van berxwedanan bi daxûyankirina şervanê PKK, Celalettin Delibaş di 1ê Êlûnê de bi biryarî hatiye aşkerekirin ku; li hember pêkanîn û amanca qolonyalisttan welew bibe sebebên cangoriya şervanên hêza ji, girtiyên girtixanê dest bi birçibûna mirinê bikin û vî tewrê berxwedanê bidomînin.

● Ev tewrê berxwedan û biryarê kirina rojiyê, ku ji 2ê Êlûnê ve didome, laqayî biranîna birçibûna 14ê Tirmeh 1982a ku destpêkir û 8ê Êlûnê bi domandina 55 rojan gihiştibû dawîkê dibe. Bi daxûyana hogirê M. Hayî Durmuş ev biryar daxûyan bûbû. Di bin hingavtin û lêdanên dijwar, û rewşa mirina birçibûnê de gelê Kurdistan sê lawên xweyê heja wundakiribû. Di vê rojîya mirinê de Endamê Komîta Navendî M. Hayri DURMUŞ, Kemal PÎR û şervanê PKK Akif YILMAZ di vê birçibûna

55 rojî de şehid ketibûn. Bi dehan şoreşger û şervan ji ketibûne rewşa ber mirinê.

Di wê pêvajoya ku hemberê karbûna PKK hêza qolonyalist li nav welat û di girtixanan de bi pergalekê êrişî, tevger girêda ku serxwariyê li hember vê pêşketinê serdest bixîne, pêkanînên xwe yê girtixanan diwartir domand, ji bo amanca hêza qolonyalist bingeh negre, û pêkanîn û amanca qolonyalisttan li ber pêkanîn û amanca şoreşgerî betal û pûç bibe, aşkere di daxûyana hogir M. Hayri de ji zalale, ku şervanên PKK canê xwe di bin hemû dijarîyan de li ser destê xwe girtine û hebûna xwe danina holê. Ku amanc û pêkahtina serxwariyê, di girtixanan û nav gel de cih negre, tewrê berxwedanî bikemile, li hember dijmin tekoşîneka bê emsal afirandine.

Ev berxwedana ku laqayî salewexta berxwedana hogirên M. Hayri DURMUŞ, Kemal PÎR hwd. daxûyan bûye, bi hemû taybetên xwe aşkere ye ku berxwedana van hogira bi berxwedanê hatiye domandin û bilintir bûye. Û bûye nişana bir û bawerî û hebandina rêça şehîdan. Bi vê berxwedanê ji aşkere ye ku di rewşa kuştina rêbera û bê rêberî bimînin, şervan û birewerên PKK bê sistî û bê dudilî tekoşîna berxwedanê hember dijmin domandina rêça ronakrewanên rêber, Mazlum, Hayri, Kemal, Akif hwd. ranawestînin.

Mirina rojiyê di vê rewşa ku dijminê qolonyalist di pêvajoya "demokrasi" û "hilbijartinê" kirasên derewîn li xwe dike, hemberê pêkanînên girtixanan ku diwartir bûn, li diji van yekan pêkhatiye.

Dijminê qolonyalist di karbûna derbasiya "demokrasiyê" de kirasên derewîn û rûreşîya xwe didomîne û ji bo girtiyên êsirê destê xwe ferman û karê bidarvexistinê û hingavtin û lêdanên ser girtiya zûtir dike. Bi van pêkanînên lez û bezi van pêkanînên nemirovî û hov ji karbidestên sivil re nahêle. Li ser pêkanîna vê amancê bi lez û bez ji dadigehan biryarên bidarvexistinê derdixe. Di vî alî de ji bo girtiyên PKK hetta neha derheqê 54 şervanan de biryarê bidarvexistinê derxistiye. Lê, dijminê qolonyalist

tesira bidarvexistina başdizane. Ji bo vê tirsê ye ku bidarvexistina 54 kesan nade berxwe. Lê kuştina yek-biyekî dide pêşîya xwe. Şervanên derheqê wan de biryar ku hatiye sitendinê ji hev parvekirîye û wan yeko-yeko di "hücran" de têdixe binê hingavtin û lêdanê, ev taybet bi hemû rengan daxûyan dike ku, ev amanc amanca hêza qolonyalist e.

Ji alî din ve tesira bidarvexistinan li ser gelên cihanê pêktê, ji bo ev yek ne afire, rêya kuştina veşarî ji xwe ra pêwîsttir dibîne.

Lê, bi berxwedana birçibûna mirinê, bi tevgera şervanên PKK ev amanca rûreşî derî holê bûye û li hember vê amancê benda rawestandîne hatiye vegirtin.

● Li hember rewşa girtixanan, pêkanînên ser girtî û malîyên wan û li diji pêkanînên dijmin ku dixwaze tesira berxwedan û tewrê girtiyan û tesira fermanên bidarvexistinan li nav gel de bişkine, rojîya mirinê li diji van yekan pêkhatiye. Ku ji nas û malîyên girtiyan ta girseyên gel bi hûr-bijarî li ser rewşa û pêkanînên girtixanan û girtiyan disekin û di nav vê rewşa dijwar de piştgirtina vê hêllê roj-biroj bihêz dibe. Ji ber vê pêşketinê ku dijminê qolonyalist zerp û êrişbaziya ser gel diwartir dike, hemû destik û pêkanînên xwe ji bo serdestxistina xwesi-pariyê bikartîne.

Êsirên şerê serxwebûnê, di hoyên dijar da binjî, bê rawestandine. Him li hember pêkanînên hemberê xwe, him ji di rewşa girtitî de li diji pêkanînên ser gel radiwestin. Û ev yek hev-girtin û piştgirtinê bihêztir dike. Taybetê destpêkirina rojîya mirinê gellekin û yek ji van ji ev e, ku li hember karbûna PKK li hêlên welat ber bi bingeh avayîve diçe hêza qolonyalist bi harî êrişbaziye li diji bê karbûnê dimeşîne. Rojîya mirinê xwediyê taybetê dijberîya êrişa dijminê qolonyalistê û di vî alî de berxwedaneka pêwîste.

Mîna di 25ê Gulanê de aşkere bû, hêza qolonyalist vê amanca xwe bi êrişa Kurdistan a Başûr aşkeretir kir ku, binxistin û tunekirina PKK jê ra amanca yekemîne, di vî alî de bi gellek

(Dûmahik di rûpelê 38an de ye)

MA GELO SAZÛMANA ÖZAL MAL JÎ AGÎR DÎREVÎNE?

PARTÎYA Turgut Özal 6. Mijdarê, bêyi mirov bawer dikir, hîlbijartinan de serkeft û 7. Kanunê sazûman ji qabîna Bulent Ulusu, ku rejîma 12. Êlûnê a pêşemîn bû, girt.

Mîna me li jor ji xuyani kir, serkeftina ANAP (Partiya Nîştîmanî) bi pêşhêjmareke bilind, nelihevhatinek bi plan û xebatên cunta yên berî hîlbijartinan de dikir, daxûyan dike; serekên cuntayê yên ku bi zora leşkerî û rêzanî, hêldidin jîngariya civakî, ji ber ku giraniya xwe bo alikariya MDP (Partiya Demokrasiya Nasyonalist) danibûn, mirov bawer nedikir ku wê hîlbijartin wûsa dawî pê bêtin. Eşkere ye ku, bivê; tiştê tê diyarkirin, ne eve ku; dawîya hîlbijartinan dubendîki bi rejîmê û daxwazên nûnerên wê yên bîngehî, datîne berçav. Nexasim hersê partiyên hîlbijartinê de cihê xwe girtin, mîna hewceyîyên rejîma faşîsta leşkerî a 12. Êlûnê û gora bicîh anîna daxwazên wê hatin sazîkirin, û bo domanîna rejîmê, ev hersê partî bîngeh hatin derîvandin.

Kiryar û xebatên, hîlbijartinan ji hêla rejîma leşkerî a faşîst destpêkiribûn, yên bona bikaribê xwe pê veşêre (maske bike), û ger ev, bona bîngeh kirîna berdewama rejîmê bi tedayîyên leşkerî û zagonî kemilandibe ji, dihat xwestin ku li hemberê hin pêşketinên neberçav bûn, girîng bû hin amadekariyên din yên rabartir û riknewar bûn pêkanî. Di pêvajoya dewra sazûmanê li "sivîlan"; dakû pêşîya ji rêderketinê ji sazûmanê bê girtin; berberîya (muxalefeta) civakî bînin bin qontrolê û bikaribin bernameca (proxrama) xwe bikarbînin, serê tedbirên wan yên pêkhatin de, sazîkirina sê partiyên nuh hebû, yek wê bîba "partiya dewletê" herduyên din ji wê bibuwan "partiyên muxalefete".

MDP a ku rastûrast ji hêla Kenan Evren û cûnta wî sazibû, mîna dijbehîki CHP (Partiya Komara Gel), a kû ji hêla Ataturk sazibûbû, dihat xwestin, vê pêvajoya nûn de, mîna nûnerîya rejîmê a rast û bikaranîna wê, bê bîngeh rabar kirin. Herdu partiyên din yên ku bi navê Anavatan Partisi (Partiya Nîştîmanî) û Halkçi Partî-HP (Partiya Gel) hatibûn damezrandin, yek wê li "rastê" a din wê li "çepê", berberîya xaponek bimeşandan, lew ev barûkar ji wan re hatibû danîn.

Lê belê, ev partiyên hana, bi sazibûn û fonksiyonên xwe, ji partiyên dijbehên xwe yên di demokrasiya borciwazî de, ji partî û sazûmanên tirkîyê yên berî 1940an, taybetîyên cuda di xwe de hildigrin. Partîyan, hata derba leşkerîya faşîst a 12. Êlûn 1980an, parlamento û sazûmanê de, jîyana civakî de, sazîyên giranîki wan heyî bûn. Lê roja me de, nûnerwanî û berpirsiyarkariya va sazîyan û cihên wan civakê de, çuqas bê gotin, bîsinor bûye. Dîkarê bê gotin ku, navbera cunta ordî (artêş), û sazîyên sîvîl, levabûna kar heye. Çêkirina û meşandîna polîtîka gelemperî û a parastîna hundur û derveyî bin nûnerî û berpirsiyariya cûnta û arteşê ye û nikare dest pê bêdayîn;

jîley polîtîka aborî, civakî û çandî a ku ji hêla va hêzan hatiye danîn, divê jîne de bi destê va sazîyên sîvîl bê bikaranîn, û tê meşandin. Ev modela piştî 12. Êlûnê bi sazûmana Bulent Ulusu bikarhat, çara yekemîne ku li Tirkîyê tê ajotin. Bîlî vê, welatên dinê yên din de, ku bi dijbehê vê modelê rejîma wan tê ajotin, ev model bo bikaranîna xwe dorfirehîki, dîkarê peyda bike.

Cûnta Kenan Evren, mîna giş licnan, vê navçê de ji Kemalîzmê bê kêmasî bikartêne. Şêwa, bi hîlbijartinê 6ê Mijdarê demokrasiyê vebûye tê gotin de, partî bi hin tedbirên babetîyên zagonî û leşkerî, bi rewşên xwe ku bi parlamento û sazûmanê li hemberê artêşê hatine danîn, taliya bikaranîna Kemalîzmê vê merhelê de ye.

Di navbera salên 1920-40an Ataturk û ordî, bîlî hemû zordestîya dewletê destê xwe digirtin û diqtatorîki hişk bikartanîn, bona bikaribin vê diqtatorîyê bin av bikin, demajotê de, bi dorûkesên nêzîki xwe hinakan re rola îqtîdarê, hinakan re ya berberî, navxwe belav kirin û sê-enîşka; partî, sazûman û meclîsê, şerekê ji zûve hatibû pêkanî û lihevhati, pêşîya çavan daweşandin. Sazûman û sazîyên sîvîl, pêşgav Îsmet İnönü, Celal Bayar, Fevzi Çakmak hwd. û kesên mîna wan bi navûdeng, vê navberê de tenê mîna Bûrok ku biryaran bicîh dianîyan, dixebitîn û nekarin xwe ji bêşek bûna sencîra ferman-dîrektîfa xwe serbest bikin.

Balam, ev sazûman bîngeha xwe a rast a sistemê, bi qapitalîzma yekdesta bihevexebatdar sazî kir. Lew, qapitalîstbûneke wûsa, aborî de talan û kedmîjandinê gewretir, rêzanî de bi emperyalîzmê re her babet bihevrexebatî, ser berberîya civakî pikolîyên bêsînor û ser merhela civakî (sosyal) çuqas bê gotin, belengazî û bêkarî tanî. Bona bikaribê xwe serpê bigre, xwe ser zora leşkerî dadihilmând. Ev ji rejîmeke bêsînor navend (merkezî), zorhewce dikir. Rojên me de, rejîmê wûsa bêhtir bi cura diqtatorîyên faşîstên leşkerî xwe derdixin têmaşê û berpêşê. Diqtatorîyên wûsa ji ber sedemên taybetîyên xwe, naxwazî nûnerî û berpirsiyarbûnê xwe bi hin otorîte û sazîyên din re leva bikin. Vê tenê bona bîrdozên wan re girêdenek hişk hebe, û bona berjewendên ew nûnerî jê re dîkinre, ser bîngeha xîzmetê, bizavî hebe, dikarin bîderîvênin. Bêguman, sazûmana bi sistemeke wûsa hemû jîngariyên civakî, rêzanî û aborî, diqulîbine leşkervaniyê (mîlîtarîzmê), ango hemuyan dîkşîne nav sencîra biryar-dîrektîfan, kin bê gotin, taliyên bi vî awayî, diafirîne. Rojên me de, li Şîlî hwd. û li hin welatan bikartê, ev modelên rejîman, ger cudayîyên nuansî diyar bikin ji, bi bîngehî bivê taybetîyê ne.

Belê, ev rewş bi hebûna partîyan, sazûmanê û parlamento seranser, dij-bendî diyar dike, ger ev çuqas ji hêla cunta xwerû û normal bê şanîdan, bila be; ev rewş ji hêla partî û sazîyan ne mimkîne bi temamî bê derîvandîn (qebûlkirin). Û ev, li navbera van hêlwestan û cunta, hem-

berhev, têkçûn û peritandin birêve dibe; béguman wê nav wan de dubendî û lihevdan sadir bike.

Ev rastî, ji nuha de ketiye nav berpêşa rojgoranî a Tirkîye. MDP a ku bihisaba partiya dewletê hatibû damezrandin û hazirkirin, dema hîlbijartinan hindakir, û bêyî bê xwestin ANAP serkeft û ji ber tekoşîna nav hêzên borciwazî û hêrsûgira gel hemberê vê rejîmê, mîna kedeki dawîya van rastîyan hat ser kar, rewşa rejîmê kire zehmetkêş û peyvajoya wêranbûna wê lezand.

Turgut Özal û partiya wî demekî wûsa de, sazûman girtin. Bili ku nûneriya rikna aborî a 12. Êlûnê dike û bi erkên wên yên hundurî û derveyî girêdayîye, ev tengasî û aloziya rejîmê, navbera Evren-cûnta wî û sazûmana nû, hemberhev, xofanî û dubendî sadir kiriye. Turgut Özal û partiya wî, mîna me li jorin ji pêşîwar kir, bêiktîdarîkî bi vê curê seranserî qim nakin, ev derivandin bi şîphe tê xûyanîkirin, lew ser rîya sazûmaneke "xwekesî" çêbûnê, wê cuntayê, ger ta sinorekî ji be, di enîşkê de bidehfênin, herwiha sext (zor) li ser çakbênin. Lewra, ev parti dizane ku, iktîdar bûn û karbidest anibûn livek ji bi va erkan ve girêdayî ye.



Sazûmana Turgut Özal, ger ji ber taybetiyên pêvajoya jîngar û ger ji ber qerektera rejîmê a tenha, ya ku em kin ser axîfîbûn, bi gelemberî bi navê sazûmaneke "wê bê derbasbûn" tê navdan, û hesibandin. Ev bi têdayîk rast e. Lê, ne mîna cûnta û piştigirtên wê diyari dîkin. Gora wan, gora derdorên berberîya borciwazî û hin dîtî-nên borciwaziyên piçûk, sazûmana Özal bona derbasbûna demokrasî, an jî wê navberê de, xekekê nûnerî dike. Demokrasîya ku ew ser dipeyivin, demokrasîkî çawaye, Özal û partiya wî ji hêla kê tîn ajotin, dema wûsa pir zelal berçavan be, divê ev derbasbûn têdayîkî din, dixwe de dahilbigre. Belê, sazûmana Özal sazûmaneke wê derbasbibe ye. Lê ev derbasbûn gora bawerîya me, domana bingehsazîkirina faşîzmê de, ji ber ku bi giringî hewce bû û bona leyîstokên demokrasîyê ji rexn û lomên hin doran biparêzin, bona nehêlên dubendiyên nav berberîya borciwazî û cûnta behtir diwartir bibin, derbasbûneke faşîzmê a nerm pêwîst bû; û ev derbasbûn bili vê ne tiştek diye. Gora vê bawerîya me, sazûman,

dinavbera hêzan mîna keda lihevhatinekê, a kû gotin li ser nayê kirin, derketiye holê. Kenan Evren û cûnta wî, daku beramberê (muxalîfên) xwe ji sazûmanê dûr bikin, li hundur û derve ji xwêre hêz lihevbidin û bicivênin, û rejîmê rabar bikin, dixwazin ji sazûmanê bi vî awayî berjewendî bigrin û vê yekê plan dîkin, ji hêla din di serî de berberîya borciwazî, lê hemû hêzên din ji, dixwazin ji alozî û nexweşiyên rejîmê pari bigrin û giraniya xwe zêde bikin, bona birdozên xwe hêz ji xwêre bicivênin û xwê rêxistin bikin, lew dixwazin vê navbera tekoşînê de, xurtî bo ramanên xwe pêk bînin.

Gora vê têdayîyê, mirov dikare bêje ku sazûmana Özal, sazûmaneke darbasbûnê ye û ser de ji, sazûmaneke nav hêzan de rewşa mêzîneke ku rola "wekhev" dileyîze ye, (ango şerê serkeftî nûnerî dike ye.)

Eşkere ye ku domana vê derbasbûnê wê ne dirêj be û hîlbijartinên cihî yên pêşîya me de, wê bûyer û rûdanên nû derkevin berpêşa rojê. Em dixwazin dîtina xwe a fireh ser vê yekê gavek din diyar bikin; û nuha mijûliya karên Özal yên binavûdeng, ango behsa politîka wî a aborî û bikaranîna wî yên din bikin.

Li gel rastîyên li jor hatin gotin, sazûmana Özal qebî-neke aborî-rêzanî ye, lewra taybetîya komeke teknoqrât û buroqrâtîbûnê, behtir giranî daxûyan dike. Rastî, bîngeha aborî a ku jê re nûnerî dike, û bi politîka wê a ku dadihîlme, ev sazûman, berpirsiyarê rejîma 12. Êlûnê a misagore û dikarê hişk bû gotin ku, rejîm bivê sazûmanê gihaye têdayîya xwe a rast û xwebîngeh. Dema mirov bikaranîna Turgut Özal, ji dema ev alîkarê serek nûner bû, berbal bûne, wê bê dîtîna ku ev gotina me wûsa ye. Wê demê de borciwazîya yekdesta bihevrexebatdar, bona rêzanîya xwe a aborî jîyanê de misagor bike, xebatên xwe yên pêşemîn birê xistîye, û bona vê yekê kaniyên hewce yên pêşemîn vekiribû. Piştî 12. Êlûnê, hin guhartinên giran di jîyana aborî de hatin danîn, lew ta vê mêjûyê, Tirkîye bi modela îportê dihat nasîn, aborîya wê ser qrêdî û îportê hatibû danîn, îsrafa bazarên hundurî yên aborî bisînorbû, lê pişt vê mêjûyê, îsrafa bazarên hundurî pir dijwar hat kêmkirin û bi modeleke nû guhartin ku xwe ser exporêt dipaland. Bona, ji vê re bikarî-bin sermîyana hewce lihevbiçivênin, rêzanîkî mijandin û talanê a dijwar birêxistin, çîna karkeran û gundiyan dehfandin belengazî û xîzaniyê, hin çînan navber û birêk ji burjuwazî mezin û yekdest (monopol) kişandin îflasê, bêkartî, buhatî û enfilasyon giha taxên bilindtirin. Ji ber talîyên va bikaranînan, ji hev cudabûna çînan civakê de û dubendî xwe lezand, û ev rewş karlêkirina (tesîra) xwe behtir nav çîn û tebeqên borciwazî xwe şanî da. Lê ev çûyîna bilez, ji herkesî pirtir, cûnta bizdehand. Di vê niqêtê de, Turgut Özal ji ser kar anîn xwar, dakû bikarîbin, rexnen ku rêzanîya aborî damizandibû sivik bikin. Bi serekê malîyê, (daratîyê) yê ku nû şûna Özal anibûn ser kar, rêzanîya aborîya 12. Êlûnê, bin daxûyanîyên ferqî, dadomandin. Lê, ji ber ku guhartinên bîngehî pêk nanîbûn, ev ji rê derketina bisînor ji rêzanîya aborî, model anî berbîtehlûkên û têkçûnên giran. Nemaze, serî de parêzkarê modelê IMF (Fonda Daratîya Navnetewan), li hemberê vê rewşê derket û tîrsa xwe diyar kir.

Niha bi talîyên ji hîlbijartinan derketî, wê bi sazûmana Turgut Özal, vê rêzanîyê ji nûhve de û hem ji bi hemû unsûrên xwe ve, deynin bername rojê de, û sazû-

mana Özal jê re haceta nasikirinê bikar bê. Ev gava rêzaniyê, bi navê piyasa serbest a aboriyê tê navdan û wê pêvajoya pêşiya me de ev politika gavên xwe bavêje pratîkê. Di rojên derbasbûn de, Turgut Özal vêna bi şiklê “6 pakêtên xofê” diyar kir, û tedbir, erk û taliyên aborî yên ku di rojên me de birêbikêvin, bi vî awayî pir zelal dani pêşiya çavan. Bi tedbirên zagonî, ku demeke pir kurt de pêkanî, destpêkir ku hemû zoriyên li pêşiya rêzaniya aborî, yeko yeko ji holê rake. Zagona “parastina perê Tirk”, burokrasi û şirûtên wê, ji hêla sazûmana Özal gora rêzaniya xwe, tê guhurandin. Di merhelên tasarruf û exportê de, bona bikaribe gawe bo qapitalizma yekdesta bihevrexebatdar pêşve bibe, diyar kir ku, wê hemû rêyên ku rêdidin wê biceribîne. Ji ber vê yekê, sazûmana nûh, ji alikî bi bikaranînên talankarî û malrûtkirin, bi pikoliyên babetî ser kedkar û xebatkar, mêtin û mijandîne dighîne taxên banî; ji aliyê din, piştî talankariya bankêran, dixwaze tiştê di destê çinên navber maye, ji destê wan bistêne, bona vê yekê azînen xwe yên kevin, bin cilikên nû daku bikaribe bajo, hazîriyan pêk tîne. Rû û kiryarên razandina sermiyanê, pirtir diqulibînin derveyî welat û ji xwe re exportê bingeh digrin; destpêkirine ku piyasa hundurî, bikaranînên bazarên serbest û bi hêsanîyên importê bo monopolên navnetewan pêşkêş bikin.

Ev pêşketin hemû şanî didin ku, ger borciwaziya Tirk car-caran guhartin şanî bide jî, bi bingehî, aboriya teklihevî serpehtiyê a ku ta 12. Êlûn 1980an berdewam kiribû û bikaranînên dewletwanî, bi biryarên aboriyên 24. Çilê yên borciwaziya yekdesta bihevrexebatdar seranserî pejirandin. Politika dewletwanî, bêhtir mafên û berjewendên çinên navber re berdestî dike, ji bona jiyana van çinan bingehên maddî sadir dike, nahêle ku sermiyan lihevkomîcîve û bili xwe, ji bo çinên û tebeqên borciwazî yên din re jî, îmkana metandin û jiyanê nasdike, ji bona vê yekê ev politika berjewendên borciwaziya yekdesta bihevrexebatdar dike xwusarê, ango dubendî diafirîne. Ji ber vê sedemê, baraj, rê hwd., hin avayiyên riknî û bisinor, hin qadên razandinên sermiyanên mezin bili KIT (teşkilatên kargehên dewletê) hwd., hemû cihkarên dewletê bilez diqulibînin sazîyên sivil, an jî wanan di-dehfênin iflasê û sermiyana wanan diherikênin banqan. Tewrê buroqrasi a sazûmana Özal jî vê rêzaniyê derdikeve. Çêtir bê gotin, keda rêzaniya ku ew li hemberê çinên navber, birêve dibe ye.

Di rêzaniya aboriya sazûmana nû de, bikaranînên li Kurdistan wê ciheke girîng bigrin. Dikarê bê gotin ku, bona jîngar kirina wê rêzaniyê wê xebatên xwe bêhtir pal bidin Kurdistanê, lew ger bi kaniyên dewlemendiyê yên sererdin û binerdin, li şênîya hêjmara hêzdar û ger jî, ji ber erdnigariya nêzîkî Rojhilata-Navin ku li vir exporta Tirk zexme, ev rastî derdikeve holê. Bikaranînên aborî li Kurdistanê, mîna berî, wê rojên pêşiya me de jî, wê bi du têdayîyan kûr bibin.

1- Talankirin û malrûtkirina gelê me, ji hêla din, talankirina dewlemendiyên me yên xwerûstî.

Piştî 12. Êlûnê, bikaranînê talankirin, mejandinan yên ser gelê me, bûne karên rojeroj û bikaranînên vê sazûmana nû ev, wê wûsa diwar bibe ku wêca nikaribê bê debarkirin.

Bêkarî, xizanî û belengazî wê her mal û kes bikşîne bin karlêkirina xwe, dikarê bê gotin ku, domandina jîyanê wê pir zehmet bibe. Hêza keda erzan a gelê me a çeleng û jir wê bêhtir bifroşin metropolan û welatên derveyî.

2- Bi destpêkirina keda di zêwiyên me de, dest danîna ser kaniyên me, her çuqas bikaranînên bingehî yên dema niha ne jî, rêzaniyên aborî yên girîngtirin li Kurdistanê, wê bibin “proja Ferat a jêr” û “baraja Atatürk”. Ev projên bi navê “serkeftina duwemîn a Sakarya” tînan, ger bicih bînin, wê rolekê stratejîk ji bo jîngarkirina aboriya Tirk û hedefên nûh hatin danîn re, bileyze. Dinav malên exportê cihên girîng digrên; dexil, heywan û kedên heywanî yên ku maddên xwarinê yên bingehînin, carek din seranserî wê jî Kurdistan û jî destê gelê Kurd, bi buhatîya pir erzan, bistênin û jî xwêre bidest bînin.

Rêzaniya aborî a Turgut Özal, ji hêla din wûsa hatiye avakirin ku, bikaribê pêkanîn û hedefên leşkerî yên cunta bimeşîne, jê re xizmetê bike. Gora vê, sazûman mecbûre ku bi razandina sermiyan û bikaranînên xwe yên exportê, luzumata ordiyê jî tim berbal bîne û wêna bicih bîne. Dikarê bê gotin ku di serê bernameca avakirina hundurî a vê sazûmanê de, sazî û kargehên ordiyê hene. Politika sazûmana Özal a derveyî de jî, wê bikaranînên aborî cihên girîng bigrin. Hemû temaşakarên welatên derveyî yên rêzaniyê di vê gumanê û ditînê de, yekbawerîn. Ev rewş, bi taybetî bo welatên kapitalist yên pêşketî û bi gelemperî jî, ne geloware (acêbe). Lê belê, ji ber ku unsûreke pêwîst ya sistema karbidest re nûnerî dike; rêzaniyên serpehtî ku borciwaziya Tirk ta rojên me dimeşand, bi vê sazûmanî re guhartinên pir girîng sitand. Rêzaniya derveyî a Kemalîzmê, a ku dixwest bona Awrupa Rojava bibe endameke ji dil û lê belê, bona bikaribe xwe palêz bike, ji dubendiyên nav sisteman û politika “serbiseriyê” (dengê) feyde girtin jî, paşçav nekirîye; balam bivê sazûmana nû, ev rêzaniya Kemalîzmê, hatiye ber enîşkên pêşketin û bûyerên pêwîst.

Rêzaniya derveyî a rejîma 12. Êlûnê, gora daxwazên xwe yên vegirtin, êrîş û ax-zeftkirin; û gora qerektera xwe a bihevrexebatdar tê avakirin û sazîkirin. Rêzaniya aboriya nûh û taxên pêşketinên wê yên kapitalîzma yekdesta bihevrexebatdar, xwe ser exporta sermiyan, mal û hêza mirovatî paldide; ev jî bingeha politika derveyî a rejîmê daxûyan dike. Bivê re jî ev bingeh, bona borciwaziya Tirk a yekdesta-bihevrexebatdar, di vê dema nûjen de zixta riknetire, daku daxwazên xwe yên qolonialîst û emperyalist bikaribe bicih bîne. Belê, di rêzaniya derveyî a rejîma 12. Êlûnê, taybetî li Rojhilata Navîn û Afrika Bakûr, têdayîya daxwazên firehkirina ramanên aborî, rêzanî û çîqa biçe leşkerî, daxûyan dikin, ango daxwazên serveavêtin û zeftkirin dadihildigrin. Û cunta faşîsta Tirk bi pêşkarîyên leşkerî yên ku berçav dajo, bi ceribandîyên xwe mîna tevgera êrîşa ser Kurdistanê Başûr, nema hewce dibîne ku xwestinên xwe di vê merhelê de veşêre, û ev rastî ew bixwe datîne pêşiya temaşê.

Bili vê, ev guhustina nûhen di rêzaniya derveyî a rejîmê, bizaveke pêwîst, jibona ku USA bikaribe politika xwe a heremê di jînê de pêk bîne, dileyize. Dikarê bê gotin ku, ev tevgerî bona rêzaniya derveyî û nûh ya Tirk, ta liçkekê jî hêla USA bi rewşa xwestina wê, tê plandan.



Serekê SODEP û DYP bihevve.

Emperyalizma USA gelek baş dizane, ku bi destê Îsrail hwd. bi destê welatên di heremê de birabirin (tecrîr) bûne, politîka xwe a Rojhelata-Navîn, nikare jiyane de bimeşene. Bi taybetî piştî ketina şahê Îran, USA, bona xebata karbidestîya xwe li heremê de, piştî xwe bi bingehî daye Tirkîye. Bona vê yekê, pir bikaranînên girîng pêktêne, daku sazûmana Tirk a bihevrexebatdar xwe li xopanê de, bighijîne helûdorên fireh; USA, Tirkîye di vê rexê de tamakar dike. Lew, ew pir baş dizane ku, rejîma jîngar, ya ku di heremê de hin cihan de xwe vekirîye û firehkirîye; ev cihên heremê, cihên ku bi gelemperî tesîra û rêzaniya USA û emperyalizmê nasin wê bikin, wê jê re roleke pir gewre bide leyistandin. Sazûmana faşîsta Tirk, gora keda rêzanîkî wûsa a sistematîk, di rojên me de, li welatên heremê yên li dijî USA ne, mîna Îran, Sûrî hwd. de, di bin navê têkiliyên bezîrganî, berjewendên aborî yên beşên ku temsîl dike, bicih tene. Perê ji dixebite, daku bikaribe politîka emperyalist li vadan bike berpeşa rojê û jê re bingehan biafirîne.

Ev rêzaniya derveyîya nûh a rejîmê, a ku ji hêla sazûmana Özal bikartê, bi têkiliyên xwe bi emperyalistên Awrûpî re wê wûsa nikaribe bimeşe, lew ev liçek bi guman xwe daxuyan dike. Lewra rêzaniya derveyîya Tirk, bi gelemperî gora berjewendên emperyalistên USA û hêzên bihevrexebatdarên wê, hatiye sazîkirin. Ji ber vê dîtîne, di heremê de dijî USA tekoşîna karbidestîyê dajo EG (teşkilata bihevrexebatdariya aborî a welatên Awrûpa) û bi taybetî mihwera Frensa re, ji ber hin sedemên aborî û rêzanî, béguman car-carnan wê dubendî û kişîşandînek girîng navbera wan de derkeve ronahiyê. Rojên me de, tewra Awrûpa a bi tirs û bédîli li hemberê rejîma Tirkîye, taliya û keda wê dubendiya berjewendên wan e.

Rêzaniya derveyîya serpehtî a dij-komunistî û dij-minê welatên sosyalist, bin vê rejîmê bi domanî xwe behtir dijiwarkir, lê bîlî vê, bona bikaribin armancên xwe yên aborî û rêzanî bicih bînin, û gora teqîqî dorfirehkirina xwe, pêwîst bi va welatan re ji di çarçîwa têkiliyên bezîrganî, wê alaquadariyên xwe ta sinorekê zêde bikin, béguman emê leqayî wê rastîyê ji bibin. Ramanên rêzanî ya vê politîka bi welatên sosyalist re eve ku; daku rejîma faşîsta Tirk bikaribe xwe ji birabirîne biparêze, û alîkariya van welatan bona dij-hêlwesta şoreşgera de-

mokratîk a Tirkîye û Kurdistanê, bidê rawestandî.

Bi kurtî, em dikarin armancên bingehîn a sazûmana Özal wûsa pêşçav bikin. Eşkere ye ku ev rêzanî bi taybetî ji hêla politîka hundurî wê nexweşiyên û aloziyên giran û pêwîst bidamezrîne. Ev, ji ber pir sedeman, béguman wê birêbikeve. Berî her tiştî sazûmana Özal, bi alîkarî û piştgirtina cunta û ordiyê, rêzanîkî aborî bi bikaranînên hovberê daniye holê. Ev, wê hejandinên û aloziyên pêwîst yên aborî û civakî sadir bike û çuqas dem bibhure, ev wê biqulibe peqînên civakî. Bîlî vê, ev politîka zaniya rast û bingeha berjewendên borciwaziya yekdesta bihevrexebatdare, lewma wê tekoşîna li navbera çînen borciwazî jî, bi dijiwari, germ û tûj bike.

Tiştê xûyani dike ewê ku, rejîma faşîsta mêtînger, xwe amade kirîye, daku bikaribe rizikoyên (talûkên) rêzaniya wê biafirîne, rawestîne û singê xwe li ber veke. Lewma, ne tîrsa sextên dijberîya burjuwazî û birên piştgirtên wê yên Awrûpî, ne ji zorîyên dijberîya gel a welatperwer û şoreşgeran, wê sazûmanê ji gavên davêjê navegerîne û daxwazekê wê a wusa ji tune ye.

Bi bingehî, ji ber rastîyên ku kapitalîzma Tirk dike, ev ne rêdare. Serekê cuntayê Kenan Evren pir axafên xwe de, ku ji ber pir sedeman kiri de, wê rastîyê pir caran anî zman û hêzên dijberîya borciwazî va navçên jêr de bizdehîna şiyariyê kir; şaşî û derketînen ji rêya jîngar, xebatên bêhimkirîna rejîma serkar, nemîmkîne tu feyde bidê borciwaziya Tirk, pêre ji talîde ev, wê dijberîya gel zexm û xurt bike û rejîmê ji bin bîne berbîtehlûkan. Avaya divê barê de, ji ber ku qoza xwe a dawî ji birêxistîye, tu rê bo xelaskirîna dewleta borciwaziya Tirk, nemaye. Ev têgihiştîna mejiyê, ger iktidara borciwaziya Tirk xwe bi rastîyên berçavî û bi têdayîyên sadiq dabihîlmîne jî, diyarê ku tu çîn menfeatên xwe, bidilê xwe ji çîn û tebeqên din re fîda nake, ev mîna rojê zelale. Ji ber vê yekê, ev rêzaniya ku mafên borciwazî yên gelemperî berbal nake, û behtir mafên bireke kêmasî, dixwaze ser gîşî pêkbêne û serdest bike, ger çuqas rastîyê daxuyan bike, bila bike, wê bo lihevdanan rê veke û leqayî berrabûnê bibe.

Di Tirkîya nihan de, biryarên talî ku rejîm derxistîye, tê dîtîn ku dijberîya borciwazî çuqas diçe dijiwartir dibê.

Ger, birek ji dijberîya borciwazî ji ber zora rêzanî û leşkerî bête ketibe û bi cunta re hevrexebatdarî derîvandibe jî, bi giranî, mîna li Arjantînê tê dîtîn, wê dijberîyek dijiwartir bibe.

Bi bingehî, borciwaziya liberal û dijberîya borciwaziya piçûk kardike, daku xwe li dora SODEP (Partiya Demokrasiya Civakî) û DYP (Partiya Rêya Rast) ji nûhve de, rêxistin bike û tê dijiwarkirin ku koma Ecevit-Tunç jî, mîna hêzeke nûh, wê xwe tîkîlî vê xebatê bikin. Bona wezîfa eşkere, dakû şoreş bê rawestandî û berbiçeper kirin û bona bi komên monopolên bihevrexebatdar yên USA, bi bingehî lihevhatin pêk bê, ji hêla derdorên emperyalistên Awrûpî ev tevgera dijberîyê tê sazîkirin. Mîna me li jor jî gotî, taybetîyê wê tevgerê a pêwîst eve ku, bi wezîfa bingehî şoreşê bidê rawestan-

dinê. Ji ber vê wezîfa bingeîn, ev tevger, dijberiya çep a borciwaziya piçûk dikşîne pay dûvê rêzaniya xwe, û vê yekê mimkin dike. Îro buhatîki taybetî didin vê yekê. Borciwaziya piçûk a ku nav refên tevgera şoreşgera-demokratîk, bo tekoşîna îktidara demokrasiya gel, hêzeke girînge, ji hêla hin derdorên emperyalîst û dijberiya borciwazî, ser bingeha rawestandîna dijberiya şoreşger, tê rêxistin kirin û bikaranîn, ango vê hêzê ji xwere dihesilênin. Hin "çepên" reformistên borciwaziya piçûk yên Kurdistan û Tirkîyê ku li Awrûpa koçberbûne û xwe bingeh kirine, tê dîtin ku xwe bona dûvikbûneke wûsa, hazir dikin. Ser rikna programeke bahevhatin li hêlekê bihêlin; ev reformistên borciwaziya piçûk, bona xwe, ba dij-



beriya borciwazî, ku ew bixwe xwe meşrû nabîne û ba piştgirtên wê yên navnetewan, bidin derivandin, tevgerêk birêve dibin, daku min a hova ji her alî êrîşî tevgera şoreşger bikin, û ji nuha de ev xebat bikartênin. Herçûqasî, pir zelale ku, ev xebatên wan, divê rastiya jîngar de, tu berjewendi bo "çepê" dûvik nahesilîne, lê wê bo dijberiya borciwazî hêzeke pir zexm lihevbiçivîne, ev pir êşkere ye; xwe bi vê rastîyê girê nadin. Dijberiya borciwazî wê vê hêzê ji bo xwe, di tekoşîna diji cunta de, bikarbêne. Dijberiya borciwazî, ku derdorên emperyalîstên Awrûpî pişt xwe de kişandiye, berî rejîm bi hemû aliyên xwe rabar bike, dixwazê bi rejîmê re lihevhatinek çêke, daku bikaribe, ger bisînor ji be, bona dozên xwe rejîmê bidê xebitandin. Lê belê, min a li jor ji me nivîst, serekê cunta Kenan Evren di axafa xwe a dawî, ya sersela nûh de, carek din diyar kir ku, tucaran wê derevendîya vê yekê nakin.

Nemaze piştra sazûmana Özal bi bîryareke xaponek ku ji ber hilbijartinên cihî, ji meclîsê derbaskir de, şewîr bû ku mêjiya hilbijartinan a ku hatibû danîn, sê meh pêşve anîn û hilbijartin wê 25. Adarê çêbe; ev şanî dide ku her rêya mimkin be, daku bikaribin dijberiyê bihelênin, wê pêk bînin an ji dixebitin daku dijberiyê bêtesir bikin.

Cunta dizanê ku, partiya ANAP, daku bikaribe 5 salên xwe ser sazûmanê gerantêr bike, pir girîngi dide hilbijartinên cihî. Ji ber vê yekê, cunta çeka dijberiya

borciwazî wê neqlê li wan diqulibêne û berî ANAP bê-keysbikeve û berî SODEP û DYP yên ku nûneriya dijberiya borciwazî dikin, xwe komcivîn û bihêz bikin, dixwazê hilbijartinên navberê dawîbike, daku bikaribe taliyên hilbijartinan rikne bike û bi vî awayî liberhevda-nên ser hilbijartinên dembizû bidê rawestandî û xebata sekinandinê bi vê ramanê dilezîne. Teqtiqa hilbijartinên cihî pêşve, anîn ji ber ku firsenda xwe lihevdana partiyên din nahêle, dibe ku cunta rêya serkarmayîna ANAP, di domana wê a normal de, bide. Lê ev hilbijartinên hana, şanî didin ku dijberiya burjuwazî jî, bir rewşa hêzeke pêwîst a rêzaniyê, wê jiyana xwe ser rejîmê, çuqas biçe bêhtir, paldan bide. Kurt bê gotin, ev teqtiq wê dijberiya cunta a jêr û bidest bihelêne û ev rast e. Lê dijberiya burjuwazî rabare bi va azinan bê helandin. Herweha cunta bi taliyên hilbijartinên cihî, dibe ku rêyên hilbijartinên dembizû bide rawestandî û bi vî avaya ketin û qelsbûna xwe a dileze, bona demeke kin, siviktir û nelezitir bike. Belê, ji ber ku dijberiya borciwazî tim leqayî çeperên zehmetiyê dibe, wê berdewam bike ku rejîmê ji derveyê platforma zagonî berbîzorê bîne, ev rewş wê qontrola cunta ser, dijberiya li derveyê zagonî pêşdikeve, kêr û bêhîm bike. Ev tekoşîna ta hilbijartinek din, demek pir dirêj, wê dombike, bixwe re hilweşandina û bêkeysbûna cuntayê wê bîne, lew ev bûyereke zorxwaze.

Tekoşîna navbera çînen borciwazî, ger rejîmê berbihevşandinê bîne, û dijberiya şoreşgera-demokratîk nealternatîfê îtkidarê be, wê taliyek min a li Arjentîn derkeve holê, ango mesele bi vê minakê wê bêhelkirin, divê em bikaribin vê yekê ji bînin pêşîya çavên xwe.

Li hemberê van hemû pêşketinan, êşkereye ku pêşîya hêzên şoreşgerên-demokratîk yên Kurdistan û Tirkîyê pir erkên pêwîst yên dîroki hene.

Helbet wezîfe ne eve ku, min a "çepê" borciwaziya piçûk, ku dixwaze bi hêzên demokratîk jî bide derivandin, dûvik bûyînê. Ev "çep" îro dibe dûvika dijberiya burjuwazî, a ku piştgirtina hin çengên burjuwaziya yekdeste û alikariya emperyalîstên Awrûpî jî digre. Ev ditîna me nayê vê tedayiyê, ku tevgera şoreşger û demokratîk, biqasî rêbar be, ji dubendiyên navbera hêzên borciwazî, berjewendi negre. Li çewta daxûyane ku ev dubendî û şerê di rojên me de tê jîngar, pir derizandinên pêwîst, di sistema karbidestî û pikolîyên hovûtarî a faşîzmê de, vedike. Di vê hêzên şoreşger û demokratîk wê derzê heji kûr bikin, û bêgotin ji wê, bona tekoşîna xwe berjewendan biserkevin.

Bi şêwa bernama xwe a serbixwe û rêxistina xwe bixwe heyî; hêzên şoreşger û demokratîk dikarin bivê dijberiyê rê ser hin kiryarên şirîkî li hember cunta, hin lihevhatin û bihevve tewrinkirin bikin; lew redkirina vê neraste. Lê belê, di bin van şêwan de jî, lihevhatin û têkiliyên çêbin, divê bi şerta dijwarahişk, bona pêşvebirina şoreşê, bê girêdan, lew ev şert zorakiye. Hêzên şoreşger û demokratîk, dema ser rêya hedefên proxrama xwe dimeşin, ger leqayî hin dijberiyên borciwazî ku bi wanre li hemberê rejîma jîngar, dixwazin bimeşin û ev bisînor ji be, bibin, bi şerta ku ew tekoşîna îktidara demokrasiya gel nerawestênin, kijan ku li hemberê borciwazî meşa ser rêya sosyalîzmê armanç dike; dikarin bi wanre, bihevve, bixebitin û hetta dikarin bihevve bimeşin îktidarê. Belê,

(Dûmahîk di rûpelê 18an de ye)

LÎ WAN'Ê ÇI DÎBE?

Roj biroj taybet û rola cuntaya faşist û karbûna wê aşkeretir dibe.

Çûn û hatinên Tirkîyê, gerên Kurdistanê, têkilîyên pašverûkên Rojhelata-Navîn, çûn û hatina heyeta, general û pirsporan hwd. mîna bûbin karên rojê.

Ev yekên bi tu pergala li ser gel baldarî pêknaynin û ev pêkanî bi rastî ji afirandinên demeka pêwîst, karbûna vê demê û hazîrîyên êrişê daxûyanî derdike. Û ev yekan çend taybetên berçav dikevin. Ji ber vê rewşê dibî ku ev çûn û hatin, “serilêdanên welatê cîran” nêne ditin, lewra ev têkilîyên çarenînin.

Ku cunta faşista qolonyalist bi êrişê 25 Gulanê, tevgera Kurdistan a Başûr, bê veşarî hemû taybetên xwe yê nemirovî daxûyanê holê kir û ev taybetê êrişbazîyê aşkeretir bû. Ji bo binxistin û hilweşandina Tekoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê ku cunta qolonyalist hemû destikên xwe bikartîne û dest davêje hemû rêyan. Lewra ev tekoşîn ji dijminê qolonyalist re hêzeka xedare û roj-biroj derbên pêwîst li dijminê qolonyalist dide. Ji bo binxistina tekoşîna serxwebûna Kurdistanê ku mîna hova xwe karê êrişbazîyê dike. Bi hemû tevgerên xwe yê nemirovî, kuştin, êrişbazî û serxwarîyê hwd. amancê dijminê qolonyalist ne guhuriye û ji bo gihîştina vê amanca rûreşî xwe dikemilîne. Nexasim ev amanc ji hêza qolonyalist re roj-biroj pêwîsttir û xedartir dibe. Ger bi vê rewşê bêyî mîzekirinê, bi hemû taybetan ev yek aşkere xûyan dibe ku;

Burjuvazîyê Tirk ji bêmecalî û destika xwe ya dawîyê karbidestîya 12 Êlûnê anî serkar lê, di alî amancên xwe de kêrhatin û amancên xwe pêkneaniye.

Ku binxistina tevgera PKK, Tekoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê amanca yekemîn diîye, di rewşa dijarê êriş, qetlîam û şerê aşkere de ev tekoşîn pêştir ketiye û bi pergala hêza hemberîyê, li dijî cunta qolonyalist rawestiye. Nexasim xebat û karên ji hêlên tixûb ber bi welat ve tê herikandinê û ev xebat cih digre dijminê qolonyalist hovtir û hartir

dibe.

Burjuvazîyê Tirk di alî xebat û kêrhatina aborîyê de binketiye û hemû pêkanî û destikên wî betal mane. Di bin rewşa zerpê de, hemû keda girseyên gel tê pêjrandin, kedxwarin gihîştîye qeysa bilindî, mafên demokratî û aborî ji destê girsên gel hatiye sitendinê hwd. Gel li ber rewşa birçîbûnê ye. Welew di alî aborî de xwe bi derî welat karbike ji, ji taybetên xwe gerineka aborîyê kûrtir dibe, û roj bi roj dikeve vê gerînekê.

Ev herdû nuqtên pêwîst ji ji bo bişkavtina burjuvazîyê Tirk têr dîkin. Ev sazûmana pîrsgirêka tevgera gelê Tirkîyê, Tekoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê û pîrsgirêka aborî ji holê ranekiriye, hêzên hemberî xwe firehtir kiriye. Bi pêkanîyên sê salên xwe ji hêla netewî li welatê cih lê teng bûye. Û gellek hêlan hemberê xwe rawestandiye.

Ji taybetên xwe ye ku ray li hemberîya burjuvatî ji nayne û hewqas jar e. Di demên dawîyê de ku leystika wî ya “demokrasi” û “hilbijartina” bi taybetên xwe derî holê bûye. Burjuvazîyê Tirk bê veşarî derî holê bûye ku bêçek û xwînrijandinê naji û nikare bijî. Ku ji berdevkên berpirsiyarên sermaye yekdest, kesên “AP” û “CHP” li ber van yekan dengê xwe derdixin û ji alî cuntayê ve têne girtinê, ev yek bixwe ji nîşane ku burjuvazîyê Tirk çiqas jar e. Ger ji van kesên hebûna xwe dane oxira hebûn û domandina dewleta Tirk tîrsa wî hewqas be, wê gavê bigotinan tîrsa wî ya gel nayê hesabkirinê. Bingehên vê tîrsê aşkere ye ku tevger û Tekoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê ye. Burjuvazîyê Tirk di vê rewşa pûçî û tengasiya aborîya xwe de, hejeka pûçîk ji nikare hilde û di vê rewşa jar da ye. Lewra domandn û bîrsivanîna pîrsgirêkên wê li ser vê yekê ye. Ji bo vê yekê ye ku hemû politîkên xwe li ser vêderê avadike. Ji ber vê pêwîstîyê ye ku berî ev tevger derba binxistinê lêbide û bigihîje vê hêzê bêagadariya hemû yekan destik û karbûnên xwe di vî alî de bikar tîne.

Lê, mîna me di serî de daxûyan kiriye, ji nûn ve hew dikare vê hêlê ji

xwe re bike hêlajîyanê. Lewra di vî alî de tevgera PKK pêşve diçe û firehtir dibe û ev tevger bi hêza xwe ya gelî, hemû karbûn û destikên dijmin betal dike. Ji alî din ve pêşveçûn rewşa Rojhelata-Navîn ji gihîştine qeyseka ku hedan lê nabe. Ji ber tesîra emperyalîzmê kêr dibe, jarbûna karbidestên pašverû, keysafirandina şerê Îran û Îraqê ji bo pêşvebirina Tekoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê taybetên erîni ji bo karbidestîya Tirk afirandinên xedarin.

Ku Tekoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê ji bo Rojhelata-Navîn navça pêşvexistina ye, ji hatina Rojhelata-Navîn ji hêlên bingehî yek ji Kurdistanê e. Ji van taybetan, pîrsgirêka Kurdistanê ne tenê ji burjuvazîyê Tirk ra ji hêzên emperyalîzmê re ji pîrsgirêkê bingehî ye. Mafên wan di vî alî de dibe yek. Ji bo binxistina vê hêzê hevkarên hev û dun e. Welew ev hêz binnekeve, bivê pîrsgirêkê ve derkirina emperyalîzmê çarenî e. Bi kurte-birî iro emperyalîzm ji politîka xwe li ser bingehê Kurdistanê saz dike. Ji xwe aşkere xûyaye ku di Rojhelata-Navîn de hevkarî û yekoxîya emperyalîzm û dewleta Tirk berbiçav ketiye. Karbûnên wa yê li ser Kurdistanê ji vê aşkere didin xûyakirinê.

Ji ber burjuvazîyê Tirk domandin û hebûna emperyalîzmê bi hebûn û jiyandina xwe ya bê sinor karbûn û êrişbazîyê pêktîne. Di bingehî de, tevgera Kurdistanê û pêşveçûnên Rojhelata-Navîn binbixê, mîna hêzeka “fedai” ji bo mafên NATO derdikeve pêş, helbet di vî alî de, ji bo êrişbazî û mafên xwe rê ji xwe ra vedike. Ku ew amancê xwe yê li ser Mûsil û Kerkûkê di vê rewşa jarbûna sazûmana Îraqê de tîne holê helbet ne bêtaybet e. Di vê valahiyê de keysa pêkanîna amanca dîroki dide berxwe. Ji ber rewşa şerê Îran û Îraqê û hemberîya hêzên pêşverûyên Kurdistan a Başûr ku sazûmana Îraqê li ber ketinê ye Di vê rewşê de cunta faşist gumana tu tiştî nake. Û ji karbidestê Îraqê, ger li Kurdistanê karbidestîyê pêkneyne, hemberê kêrhatin û karbûna vê hêlê dernê, û hêlên xeta petrolê Mûsil û

Kerkûk'ê nikaribe biparêze, wê gavê bêşert û bend ray li tevgerê wî bine û di alî tevgeran de destikan jêre bikar-bîne. Nexasim ev sê mehên bi giranî li ser van pîrsgirêka tê seknandinê. Di şerê Îraq û Îran'ê de, dewleta Tirkîyê ku sefê sisêyaye û bi vî pergali mina xwediyê Kerkûk'ê derî pêş dibe û gefan li Îran'ê dike hwd. Bîşkavtina van li ser van bingeha ye. Di van hev-dîtinan de amanca cuntayê ev e ku di vî alî de bi sazûmana Îraq'ê amanca xwe bide hebandinê.

Ev tevgerên di alî amancê de şî-rikatiya emperyalîzmê ji tede heye, nedûre ku tevgerên êrişbazîyê derî holê bike. Ji xwe ji serî ve cunta faşîst xwe karê wê dike. Avakirina cihgera balafirgehên Amerika, sazîkirina "hêza çeleşq" pêkanîna hêlên stratejîk û cihbûna çeşê Tirkîyê nişana vî yekê ne.

Ku çeşê Tirkîyê ji alî emperya-lîzmê ve tê kemilandinê, û hêza êriş-bazîyê ye. Ji ber rewşa û pêşveçûnê Rojhelata-Navîn hêza emperyalîzmê dema tengasiyê li hêlê diji. Ger amanc û pêkanînen li ser Îran û Libnan-Filîstîn ger ji amancê li ser Sûrî'yê negihîştîye serî. Nexasim pêkanînen wan, hêzên pêşverû -mîna li hêla Libnan'ê- pêşvetir dixê. Pêxwas û berde-vokên wana pejiirine û hew dikarin li pêş pêşveçûnan rawestin. Mîna peznê rojnamên Tirkîyê, ne çeşên Erebnan ne ji Îsrail mafê emperyalîzmê nikarin bisitirîn û kêrî parastina wê nayên. Di vî rewşê de hêza yekemîn çeşê Tirk e. Di vî rewşê de mîna ew tîkî-liya dirokê di navbera emperyalîzm û çînên serdestê Tirkîyê ji nû ve lê di rewşeka neerîni de pêk were.

Dema ber binketina împaratoriya Osmaniya de, nexasim tîkîliya Almanya bi feyde ye ku bê biranînê. Di wê demê de ji ber burjuvazîyê Almanya hêzeka emperyalîst-kapîtalîstekê ber bi nêzbûnî ve pergali digirt, ji bo Asya-Pêş û Rojhelata-Navîn serdestîya xwe avabike, sultanên Osmaniya li ser bingehe sitrandina paşverûkî, ji bo hebûna împaratoriya Osmaniya bidome, bi hemû pergali alîkarîyê domandibû. Wê ji bo gihîştina amanca xwe çarenî dîtîye. Di vî alî de tîkîli tenê ne bi tîkîliyên aborî maye, gihaye wê qeyse ku ji karbidestîya nav dewletê, çeş mîna li gor amancê emperyalîstê burjuvayê Almanya pergali girtibe. Ji serdariyê ta sazûmanên karbidestîyê di serî de Alman û ketibû destê emperyalîstan.


Hêzên emperyalîst tu car ji ber amancên xwe yê bingehe pêşveçûn û pêkhatînen Kurdistan'ê hesan nedîne, lê rayneanîne û bi diwarî xwinê rijandinê.

Di alî binxistina serhildanên sed-saliya 19an rola emperyalîstê Îngilîz û Alman li Kurdistan'ê ku rastîyên ku dirokê derî berçavê me kirîye.

Bi dewlemendiya sererd û binerdi û cihê xwe yê stratejîk û dewlemen-diya dest pê nebûye ji bo sistema emperyalîzmê ku hê-leka pêwîste nexa-sim di vî demê de ji hemû pêşveçûnan dûrhiştine, û di bin nîrê qolonyalîstîya împaratoriya Osmaniyan de rawestandîne û di bin vî rewşa diwar de ji qetliaman ta ne-fiye gellek pêkanî-nên nemirovî li Kurdistan'ê bi cih anîne. Nexasim hêzên emperyalîst ji bo li gor hemû pêşveçûnan di bîh-n-demî de politîkên xwe bikarbinin, û bi çî awayî be ji bo ku Kurdistan'ê di destê xwe de bi-sitirîn, berpirsiya-rên xwe ji şandine bajarên Kurdis-tan'ê. Welew sekna wana binavê tîki-li û sitrandina tîkîliyên aborî be ji, eş-kere ye ev kes ji vî karî pêştir li dû tiştan bûne. Têyî zanî ku ji vana Moltke li hêlên Kurdistan'ê der bi der gerîya ye û xerîteka Kurdistan'ê derbixe gel-lekê xebatan kirîye. Hesabên ewê çewa Kurdistan di bin vî rewşê da bîyî rawestandîne ku ji alî heyet, ref û berpirsiyaran ve ev yek di hate meşan-dîne û tîyî zanîne ku piştî van hesaban gellekî qetliam û êriş pêkhatine. Ku emperyalîsta Almanya împaratoriya Osmaniya daxistibû nav lepên xwe û li hember her pêşveçûn û tevgerên gelê hêlê mîna darê zerp û êrişê bikar-dianî. (Ku burjuvazîyê Tirk li ser bin-gehe tîkîliya Îngilîz û Alman pergali girtîye, ku di vî alî de "pan-Türkîzm" pêwîste were biranînê.)

Di pêvajoyeka guhrandî û rola hêza bi awakî din be ji mîna ev tîkîliya kevn ji nû ve derî holê bibe. Ji dirokê ve ku talanbazî û kevneperestî bûye

taybetê burjuvazîyê Tirk îro di sed-saliya 20an te vî rola xwe ya diwar û nemirovî dileyîze. Ji ber vî zanevîna taybetê ye ku ger di alî êrişbazî û amancariya binxistina Tekoşîna Rizgariya Netewa Kurdistan û êriş-bazîya ser gelên hêlê mirov şaş namî-ne. Dîsa di vî alî de, pêştir USA û hêzên emperyalîst ku Kurdistan'ê de hêz û destikên şerî pêktînin, nişane ku ev karbûn ji wan re tiştêkî çarenî



e.

Ji ber di rêberîya PKK de ewê tevger û tekoşîna serxwebûna Kurdistan rêya hatin û rizgariya netewên Rojhelata-Navîn vebike û hêza emperyalîzm ji hêlê hilde, ji van taybeta ye ku emperyalîzm û cunta faşîst hemû pêkanî û destikên xwe ji bo girtina vî rêyê dixebitînin. Û vî xebateka çarenîni dibînin. Pêwîste ev bîyî kifşîkirin ku ji pîrsgirêka Kurdistan'ê re ne tenê gelên Rojhelata-Navîn û gelê Tirkîyê gelên cihanê ji bi giranî baldarî wê ne.

Ku ev yek bi karbûnên emperyalîzm û ji xeynî çeşê Tirk, pêkanîna "hêza çeleşq", firahkirina balafirgeha Wan'ê û ku vî hêlê dikin cihgera leşkerî hwd, daxûyanê holê dibe. Di vî alî de tewr û êrişên burjuvazîyê Tirk tenê neyê karbidestên sazûmana Tirke yên emperyalîzmê ye ji. Nexa-

sim ew gerên demê dawiyê çi li Wan'ê pêktîyî daxûyanê holê dike. Ev yek tê zanînê ku, pêxwasên Şah, ajanên Îraq hwd. li vê hêlê dicivînin û li Wan hêza ceşî avadikin. Nexasim ji Evren, gera Turkmen, hatina Haig û berpirsiyaren parasvanê tixûbê Alman ku li vê hêlê gera wana ji hev û dû qut nebû. Amanca hêza emperyalîzmê çîye, daxûyanî berçavan dike û ev yek ji nuha ve aşkere dibe. Gellek zelale ku ji vê ne tenê pîlanên bînxistina tekoşîna Kurdistan, zerp û tevgerên ser Sûriyê, Libnan û heta Îran'ê tevger û hêza dij-şoreşgerî bikar tînin. Ku bêtî bîranîne sala berê, piştî hatin û çûna berpirsiyarekê USA şerê Libnan'ê destpêkiribû. Û di dema gera berpirsiyare Amerîkî da, gef û zerpên ser Sûriyê zêdetir bû. Ku di çûn û van hatinan de tam ji di dema tetbîqata "hêza çeleq" de êrişê 25ê Gulanê li ser Kurdistan a Başûr pêkhatibû. Ev yek bi taybetên xwe daxûyanî dikin ku pêkanî û tevgeran karbidestîya Tirk ji hêla NATO bi destê generalan tê kifşkirinê.

Di vê meha bihuri de du serilêdanên pêwîst pêkhatin. Yek ji vana serilêdana berpirsiyare parasvaniya tixûbê Almanya, ku bi peywendîya navbera rêxistinên parasvaniya herdu dewleta gihîştê dawîkî. Di alî tevger û pêkanînen xwe cunta faşîst li kêleka USA vî dostê xwe yê berê herdem dibîne û Almanya bi hemû destikan alîkariya vê sazûmanê dike. Û ew amanca "efsana Rojhelata" di vê demê de ji nûh ve tê holê ku hunermendîya emperyalîstê Almanya tevi vî karî dibe, ku parvekariya gelan pêktîne ev hunermendî dibe bersiva xwestina burjuvaziyê Tirk û di vî alî de hev û du bêmecal nahêlin.

Ku hemû leystik û fenên burjuvaziyê Almanya di tixûbê Almanya-Rojava-Rojhelat de bi hemû hêlên cihanê tê zanînê, dîbi ku burjuvaziyê Almanya vê hunermendî û pêkanînen serhatînen xwe pêşberî burjuvaziyê Tirk bike.

Lê, dîbi ev bêtî kifşkirin ku Kurdistan ne Almanya ye. Ku di nav hemû dijwari û pêkanînen nemirovî, kuştin, xwîn û barûd û têlên pêçayî de gelekê ku ji hebûna van tîla ve hemû dijwariyan daye pêşîya xwe û van tîla nasnekirîye û ji bo hilavêtina van têlên pêçayî tekoşîne dike, bi hemberî rastwestîye.

Bi hemû taybetên civakî, aborî û

cihnîgarî Kurdistan welatekê xwedî taybetên xas e. Lê di vî alî de belkî zanebûna berpirsiyare Almanî kesî xebata têlên pêçayî were ji xwe têtî zanînê ku li hemû hêlên tixûbê Kurdistan'ê gundên stratejîk pêkanîne û gel li qampên dorgirtî bicihdikin û têtîliya wana bi vî awayî dixwazin ji tekoşîne bibirin.

Bellê, hemû taybetên van gera aşkere bûye. Ku 14 Êlûnê balafireka Tirk li Kurdistan a Başûr hate xistinê. Ma hewce ye izah bibê: ew pilotên ku dibê bi paraşûtê xwe avêtine çî dikirina?

Di wê demê de zerp û gefên ser Sûriyê zêdetir bûn, ceşê Tirk xwe li hêlên tixûbî bicih kir, jibona ku tevgera êrişiyê pêkbîne, şerekê navnetewî li ser hêla Libnan'ê sazû, bi gef û zerpan sazûmana Îran'ê xwestin ku paşbixin hwd. Yanî li vê cihgerê pîlanên tevgerê gav bi gav pêkanin.

Hatî û pêkanînen ewê çî derî holê bike? Karbûn û tevgerên emperyalîzmê êriş û gefên wan heta ku ewê here? Ev pîrs di pêkanînen rojevî de her gav bersivên xwe dibînin û ewê zelaltir jiyan bersiva wan bide.

Dewleta Tirk di hêlê de axatîya şer dike. Ev pêkanîna li gor mafê

emperyalîzmê ewê bêtî domandîne. Û ewê ji bo bînxistina Tekoşîna Rizgariya Netewa Kurdistan'ê hê pêştir bikeve û di vî alî de bêtî qeyd û bend piştgirtîya van hêla ewê bibîne û ji bo jiyanê vê sazûmanê ewê xwîn bidîne.

Lê, ev yek bêmecali bixwe ye...! Bi van têtîliyan serkariya serdaren Osmaniya hin dirêj bûbe ji iro ev yek keri tu tîşteki nayin, hêza kêrhatina wan nemaye. Lewra, burjuvaziyê Tirk hêzeka pûç e û reh'a jiyanê lê nema ye, ew hêza wî li piya dihele, hêza ceşî ji xwedî çî taybete ew ji di êrişê Kurdistan a Başûr de aşkere derî holê bûye.

Di vî alî de sistema beş pûçiyê hêza emperyalîzm, ne ji hêza pûç sazûmana karbidestên Tirk dîbi ku ne xwediyê gelekê hêviyan bin. Di serîde welatê Kurdistan û hemû hêlên Rojhelata-Navîn ne sedsalîya 19an de dawika sedsalîya 20an de dijin û rewş guhrandîye. Hatineka ronahî li pêşîya gelan xûyan bûye.

Dawîya sedsalîya 20î ewê bibê destpêkirina dema hatineka ronahî ji gelên Rojhelata-Navîn re pêşveçûnên rewş û demê ji neha ve vê mizgînê didin.

*"Deriyên me ji wan re vekirîne... Hêviya me ew in...
Tenê ew dikarin xwedî li mafê me derkevin... Ew lawê me ne"*

(Destpêk di rûpelê 13an de ye)

rinê. Dema di peyvê de navê wan tê zman, vê dibêjin; "ew mirovên ji bo me nayên jîbirkirin in". Ji zaroyan hetta 70ê salîyan bahsa Mazlum, M. Hayri, Delil, Zeki, Bakî Kahraman, Şûkrî Sever, Kazim Aydın û hwd. dikin. Gel bixwe dibêje ku, me wan ji birnekirîye. Emê ji cuntayê pîrsa xwîna wan bikin.

Di hemû pergala jiyanê, dawet û civînen xwe de kilam û helbestan li ser van hevalan derdixin.

Pîrs: Dema dawiyê, cunta leystîka demokrasî dileyze. "Vegerandina demokrasî" û "hilbijartinê" derî meydanê kirîye. Li hember vê, gel çî dike?

Bersiv: Ji bîni ve baldariya vê yekê tune ye. Min ji gelek pîrsî; haya wan ji "hilbijartin" û "partîyan" nîne. Rewşeka wîlo hebû ku ji mirovîrê, "rewşa hilbijartinê" nîne. Jixwe hemû tîştî karbidestên cunta bi dilê xwe dikin. Ji vê karbidestîyê ji gel têtîli tu tîştî nabe. Ji alî din ve tê zanîn ku "hilbijartin" ne rêy e û rewşa wa bi vê naguhure. Evê domdarê politîka karbidestan bin. Ji ber van taybetan ji ne baldarên "hilbijartinê" ne.

Pîrs: Vê dema tu li Kurdistan'ê mayî rewş û pergala hêza qolonyalîst çewa xu-

yan dibû?

Bersiv: Der û hêlên Kurdistan'ê, çîya û rêyan ji nûh ve kifş dikin, zangerên vê yekê şandîne Kurdistan'ê. Di alê hêza eskeriyê de xwe ji nûh ve bi cih dikin, hêlên "stratejîk" û cihgerên eskeriyê ava dikin.

Dilnexweşî û dijberî di nav ceşê qolonyalîst de heye. Hemberiya cunta heye. Li Çolemêrgê bi "înzibatek"î re peyivim. Ku hînbû ez Kurd im, kêfxweş bû û got; "loo, tu ji Kurdî, ji hevalên xwe yê Kurd ra dibêjim, her tîştî ne wekî têtî xuyakirinê yeeee... Hemberî û dijberî heye... Em bi leşkerên faşîst re xwarin naxîm, car-bi car di nav-bera me de şerr derdikeve."

"...hevalekî ji Agirî hebû... Di navbera wî û leşkerên faşîst de dijberî derket. Faşîsta giliyê wî kir û ew rakirin birin. Jê pê de haya me jê nema. Dawiyê min ji malîyên wî pîrsî, vî hevalî kuştîne. Û wî şandîne welatê wî. Morê li tabûta wî dane ku "nayê vekirîne" û di nivîsa ji malîyê wî re şandîne de ev yek hatiye nivîsandîne: "xwe kuştîye" (!) Peyva me gelekê dirêj bû, dawiyê "serfiraziya şerrvanên Kurdistan'ê" xwest û em ji hev veqetîyan.

8.10.1983

*“Deriyên me ji wan re vekirîne... Hêviya me ew in...
Tenê ew dikarin xwedî li mafê me derkevin... Ew lawê me ne...”*

Karkerê Kurdistan'ê ku li dervayî welat xebatkare. Rojên xwe yê betali ji ber ku li Kurdistan'ê derbas kiriye, axaftin û hevpeyvînê bi vi karkerî ra pêkhatîye ji ber ku rewşa gellek taybetan daxuyan dike, em weşandina vê hevpeyvînê, karekê pêwîst dibînin.

* * *

Pirs: *Nêzî mehekê keysa gera welat bi dest te ket. Di vê demê de; ji bo jiyana gel, debar û pirsgrîrêkên hember dimînin çî têgihîştinê te çêbû?*

Bersiv: Destikên debara gel gellek jarbûne. Birçibûn û belengazî zêde bûye. Bêkarî gihîştîye qeyseka bê hesab. Piraniya gel bêkar û betal e.

Hejmara kesên heywana xwedî dikin, ro-biroj kêm dibe. An jî yên erd dajon, jî alî din ve, hebûna di destê gel de jê tê sitendinê. Gelên belengaz bi van pêkaninan belengaztir bûye. Berê, kesên betal, bêkar, diçûn bajêran û dixebitûn. Kar bîdestê wan diket. Ji ber rawestandina avakirina avahiya jî ev yek ji binî ve jî holê rabûye. Nişaneka berbiçav ev e ku çaygeh tucar vala nabin, hertîm tîjî-ne.

Pirs: *Base, ev rewş çewa tesîr li gel dike?*

Bersiv: Gel bi tevayî hêviya xwe ya cuntayê biriye. Ev hêvî nema ye. Pê dizanin ku cunta ji pirsgrîrêkên wan re nabe bersiv, û bersivan nayne. Di vi alî de ez dikarim vê yekê nişan bidim ku: dema li çaygeha gund rûdiniştîm (ku li çaygehên gundên din jî rûniştîm) bi pirani ev yek tene peyvandin: bi hatina cunta belengazî, birçibûn, betali zêdetir bûye, cunta wan dişêline û pîrsa diji hilweşandina cuntayê ye.

Hin kes di vê rewşê da rêya felatîyê di tiştên din de dibînin. Mesele aliyê barê debara ev kesê malîyê wî li ser milê wî ye dest bi vê rêyê dike. Ku pêşiyê cotkari dikira û bi kêmasî debara xwe dimeşand. Lê ji bêtari, buhabûn hwd. rewşa jîyanê jî binî ve guhurandi ye. Ji av û nan pêştir tu tişt di dest da namîne. Li ber vê rewşê ev gundi hew hedan dike û dikeve kadinê derî li ser xwe digre û agir berdide kadinê. Ku vê yekê gundi dibihîzin,

têne alikariyê u gundi, di rewşeka bêhişî de derdixine derva. Çima te wilo kir? Dema me pîrsan jê kir van bersivan da: “mirin ji jiyana wiha çêtirê”. Disa ez vê bêjim ku ev tenê hikereke. Gellek kes bi cudatî dest davêjin tiştên wiha...

Pirs: *Mîna tê zanîn bi 12 fîlonê ve hêzên şoreşger di xebata welat de bê keys man, û bi girani xwe karê tekoşînê kirin. Di vê dema karbûn û ger bi xebata welat ve gavên şoreşgerî tene avêtinê, mîna agahdariyên te çêbûn, ev yek çiqas li ser gel tesîr dike û gel bi çî awayî li wan pêkanîna dinêre?*

Bersiv: Berî hemû yekan ez dixwazim vê bêjim: dilxwestîna gel bi alî şoreşgeran ve jî berê zêdetir bûye. Jixwe gel jî cuntayê acise. Dema eskerê, erbekê eskerî dibînin dest bi çêran dikin...

Gel jî şoreşgera, nexasim jî PKK bi girani dipeyive. Hemû vê yekê dibêjin: “deriyên me ji wan re vekirîne... Hêviya me ew in... Tenê ew dikarin mafên me biparêzin... Lewra ew lawên me ne...”

Tiştê ku bala min kişand ev bû. Wê jî bêjim: kemilandin û çeleqiya gel min dit. Gellek kesan xebat dikir û hilweşandina cuntayê dianîn zman. Hemû hêl, kes, xwedî lihev dertên, hevgirtina wan dikemile. Hevdû tenê nahêlin. Nexasim, hemî tiştên konevani dipeyivin. Nexasim xort û keçên zane, gund bi gund xebat dikirin. Heta hin jî van kesan min bi xwe dit û rewşa guhrandi ber biçav dikeve.

Pirs: *Di vê rewşê de derheqê hatinê de gel çî difikire?*

Bersiv: Derheqê hatinê de dikarim bêjim ku hemû hêviya gel bi şoreşgeran girêdahiye. Hiş û baldariya gel şoreşger in. Mîna her roj çavrêniya wan bikin.

Ev gotin di peyv û jiyana gel de di girtine: “Em Kurd in. Helbet em ê jî destê van celada xelas bibin”. Dema li Dersim'ê bûm hê jî germiya êrişa Kurdistan'a Başûr di nav gel da hebû û ev yek dihatine gotinê: “Şer li Kurdistan'a Başûr destpê kir. em jî, em biçin şer...” Ji alî di ve di radyo, televîzyon û rojnameyan de derheqê

êrişê de karbidestan daxuyanên xwe diyari dikirin.

Pirs: *Êrişa Kurdistan'a Başûr bi çî hemberîyan di nav gel de tesîr kir?*

Bersiv: Aliyên Kurdistan'a Bakûr jî nêz ve li ser êrişê diwestiyan. Baldariyeka bi hêz hebû. Gel dizane li vê hêlê şervanên PKK û şervanên Kurd'a hene. Di nav gel de dihat peyvandinê ku cunta qolonyalist di-xwaze jî nûn ve qetlîamên wek Zilan, Koçgiri, Dersim, Genç û Hênê pêk bine.

Piştî êriş û tevgera hêza qolonyalist betal û pûç ma, hêvî û dilxwestîna PKK di nav gel bi hêztir bû. Gel di peyivîya ku di nav-bera hêzên sazûmanê û şervanên PKK de şerr derketîye. Û hêza qolonyalist li hêla şerr gellek cendek berdaye û vekîşîya ye. Derheqê vê de, gel vê yekê digot ku: “hêza dijmin bi hêz û refên PKK nikaribîye, û jî bê mecalî vekîşîya ye”. Gel bi vê gellek kêfxweş e. Vê neticê jê derdixistin û digotin ku: “emê karibin Kurdistan'ê jî destê dijmin derbixin”. Dema vê gera xwe da vê yekê jî hin bûm ku, di êrişê de hêza qolonyalist gellek leşkerê Kurd jî aniye. Lê, evana li hember welatîyên xwe çek neteqandine û wan paşve şandine.

Pirs: *Di vê pêvajoyê de, hêza qolonyalist di derheqê şervan û rêberên PKK da biryarên bidarvexistinê sitend. Ev yek bi çî awayî tesîr li ser gel dikir?*

Bersiv: Êrişbazi û zerpa qolonyalista û berxwedanên girtiyên şerê serxwebûnê, hertîm di nav gel de tê peyvandinê. Li hember biryar û zerpên girtixanên gel radiweste û dijberiyeka fireh afirîye. Ev yek digotin ku; li hember kuştina lawên xwe, bêdeng namînin. Li girtixanên Eleziz û Diyarbekir hevditin qedexe bû. Lewra dihat gotinê ku li van hêla tevgera birçibûnê heye.

Pirs: *Ji bo şehidên girtixanan, çiyana û şervanên PKK re çî tewr di nav gel da hebû. Vê yekê bi çewayî di-ditin?*

Bersiv: Hevalên şehid nayên jibirkî-
(Dûmahik di rûpelê 12an de ye)

“Ez, Dilxwazekî PKK, Bi Şoreşgerê Wusa re Serbilind im”

Dema ez dibin çav de mam, rasti hingavtinên dij mirovî li ser min û yên cem min kirin. Û ez bixwe van tiştan jîyam. Dema min birin Ruha'yê, xofa di dilêmin de bû, ano min hêdî-hêdî pirsra çî li wê derê têkirin kir. Lê, tenê min ji yekî bersiv sitand. Ya rast ji rûçikê wan kufşbû çî li wir dibe. Lew li dest, ling û rûyê wan babet şûna hingavtanan, têrî têgihiştina wê dikir.

... Piştî çendakê, navêmin hate xwendin. Çavên min girtin, min rakirin û birin deverê din. Çavêmin hewqas hijd girêdabûn, min nikaribû bêhna xwe bidim-bistînim. Neşasbim 4-5 kes li dora min hebûn, berî ku dest bi pirsra bikin, min got “çavê min hebki sist bikin, nikarim bêhna xwe bidim-bistînim”. Gotin “bîla be”, lê girêkê hê zêdetir jidandin. Ji min re gotin, “haydê lawo! binêrê hun tev di destê me de ne, ger tu bersiva pirsê me nedî, emê te bikujin, binêre hevalên te tev peyivin, me çend kesên ne peyivin kuşt, ji peyvê pêştir tu çara te tune.” Pirsra ewil “tu endamê PKK yi” bû. Qaseki sekinim, min bersiv neda. Hingê di nav xwe de gotin “serok, em xwe bidin naskirin” û nêzî seetekê min dibin lêdanê de hiştin. Piştî av bi sermin dakirin û min tazi kirin. Dîsa min li ser piştê dirêjkirin û bi pihîna li ser û zikê min xistin. Pênc kesa bihevê, ji niv seetekê zêdetir bi wî awayî li min dan. Piştî yekî got “wan qayîşa binin...” Bi min re qirîya “haydê, seh rûnê!”. Ne rûniştin, xwelibitandina min ji bêmkan bû. Dema nihêrtin ez nikarim xwe bilibitînim, du kesan min rakirin, yê din ji dest bi lêdana bi pihîna û kulman kirin. Piştî yekî bi min girt, yê din ji herdu destên min biheve hijd girêda, jê pêve deng ji min dervediket. Ji destê min ve, min bi kêran (ezmanê xani) ve girêdan, qederê 3-4 seeta daleqandî mam. Dema ez daleqandî bûm, neşasbim qet kesek li dora min nemabû. Lê dengê yeke ku di bin hingavtinên giran de, dikete guhemîn. Pirekê çêr dikir û digot “gere zaniyîm kekê min likure ji nabêjim, wun nikarin min bidin peyvandin, ne ji we, ne ji yê wê we û piştigirtêkê we cunta xofa nakim”.

Wekî din digot “ez dilxwazê PKK me”.


Bawerbin hingê mêraniyeka wusa kete dilê min ku, min xwe ji ev fikra “ya rasti ji sedemê mêtînger hewqas bi ser me ve tîn, ji tirsra van berxwedan û ji tirsra serkeftina me ye” negirt.

Piştî derbasî oda min bûn, bi çêr û pêçariya “kêm be ji te me naskirîye” gotin. 5-10 deqan bi halê daleqandî li min dan. Lê piştî yekî got “serok vêgavê hewqas bese”. Li ser wê min ji wê odê rakirin, dîsa birin oda xilbe ya din. Leşkera li wê derê paçikê ber çavêmin vekirin. Lê ez li cihê xwe ketim û nikaribûm xwe bilibitînim. Hemû kesên li wir di bin çavan de li min dinihêrtin. Lew wê eşê wan ji dikişand; paşî li ser daxwaza leşkera min kişandin enişka diwar. Kesek hêdî nêzî min bû û bi dengêkî nizm got “rêya rizgariyê hew di vê rêya tekoşîna me ya bi mafê de derheqê tişteki de nepeyvandine, we-

kidin neqebûlkirina tişteki din e. Ew ji tirsra PKK van hingavtinên dij mirovî dikin”. Û gotina xwe hêdî berdewam kir, got “ger em bersiva erîni nedîn wan, ewê tirsra wan roj bi roj zêde bibe û ewê hingavtinê hê zêdetir bikin. Rêya tekoşîna ye, ji vê pêde tu rê tunin”. Ev gotin ji min re bûn kaniya mêraniyek mezin. Ez, yekî dilxwazê PKK, bi şoreşgerê wusa re serbilind im...

Êdî bûbû êvar, hê avê nedidane me, piştî şivê anîn. Xwarin têra

zarokekî ji nedikir. Min nekaribû xwarinê bixwum. Lew ne xwarin xwarin, min nikaribû erçena xwe ji bilibitînim. Ji ber wê min got ez xwarinê nikarim bixwum. Wana gotin “ger tu nikaribî xwarinê bixwi, emê tişteki dinê ji te re binin.” Qaseki



derbasbû, pîsiyê mirovekî li ser kaxezeke anîn dirêjî min kirin û gotin “ha ji te re bixwe.” Dema min nexwar, yek li qoqlika min siwar bû, bi zorê bi min da xwarin.

Bi gir, hêrs, êşa hingavtinên dij mirovî min xwest ez bê dengderxistin wê şevê derbas bikim. Lê razan li kure. Di nav eş û sancûyan de vir de wirde min xwe diqeliband, avşorkê ji weke nav û dilê min dianî xwar. Şev seranser, bi nalîna şoreşgera ji ber hingavtinên biroj tîn kirin, derbas bû.

Lew lédana li wan dihat kirin, ji ya li min dihat kirin gellekî zêdetir bû. Ez, ku dilxwazê PKK me, ev lédan li min dihat kirin; ne zehmet bû li ser lédana li endamên PKK dihat kirin, bê fikrandin...

Wê şevê heya sibehê ez di fikra sibê çî binin serê me, em ê leqayî çîbin de mam. Ez nikaribûm ne rûnim, ne ji xwe bilibitînim. Laşê min bûbû weke text. Em li ser erdeka cemidî û hişk bûn. Werhasil şefeqê lêda. Neşaşbim seet dor 7a bû. Gazi du şoreşgeran kirin, çavên wan girêdan û birin. Di nav re 5-10 deqe derbasbûbû, dengê kûlm û pihîna hat. Neşaşbim ev ode pir nêzikî me bû. Yek ji ê bîribûn berxwedida û digot: *"her tiştî min kir, vî hevalî naznakim, ez piştigirtê PKK me."* Yê din liber lédankara digeriya û digot *"ez vî mirovî nazdikim, ewî navdiminda, ewî min kir şoreşger, minê mala xwe bibira Stenbolê, lê ewî min tirsand û nehişt."* Bi vî awayî tiştê zanibû, êşkere kir. Lê li gel hemû alikariya bi dijminre ev kes ji hingavtinê ne filitî. Bi serde ji lédankaran zêdetir lédan lê kirin, û digotin *"bêje hê gellek tiştan zanî, tevî bêje."* Li gel vî mirovî hemû tiştî êşkere kir ji, lédan kêr nedibû. Li ser vî yekê pikolî li ser şoreşgera zêde kirin û digotin *"haydê binêrin hevalê te çawa hertiştî êşkere kir, veşartina te feyde nake, zû bipeyve."* Hevalê berxwedan, timî diberxwedida û di serde ji digot, *"dirok wê cezayê we bide we."*

Piştî 5-6 kesên, navê min hate xwendin, çavê min girêdan, min birin. Vê neqla dûwemîn ji bi sedan pirsan pirsîn, digotin *"ne hewceye tu qesmeriya biki, bersiv bide."* Gava bersivê erinî negirtin, dişa min xistin bin lédanê. Paşî min tazi kirin. Serê qebloki bi guhê min ve yê din bi min ve girêdan û elektrîkê berdan canê min. Tesira vî hingavtinê da ser min, ji mal zêdetir manewî bû. Ji dêlva van hingavtinên cankuj, min dixwest fişkekê berdin mejiyê min, min bikujim. Bêdilê xwe qirîn ji min derket. Nemabû bêha min biçikiyana. Gava vî yekê ditin, elektrîkê qut kirin. Lê piştî 5-6 deqa dişa dest pê kirin. Ev 15-20 neqla bicih hat. Pîr ti bûbûm. Dema min av xwest, li min veşeriyar û gotin, *"tu bipeyve, emê te di avê de bihêlin, hetta tu bixwazi emê avê bi te bidin vexwarin."* Wê gavê çun, mida fikrandinê ji min re hiştin. Lê min di dilê xwe de helbestên berxwedanî got,

min bersiv neda, li ser vî weke gurê har, dişa êriş anin min. Piştî bi awayê kaşkirinê min birin odeke din. Di wî hali de min xistin hundur. Hundi, tije av bû; avê diavite erçena min, û pîr teng bû. Ji lédana li min kiribûn, nava min dişewitî, ji hal ketibûm. Wê qasê min xwest wê ava pis vexwum. Lê ji pişbûn û xwê ya tê de min nekaribû vexwum. Xureka wûsa ketibû canê min, weke agir girtibe min. Birinê min êşeka pîr xedar didanmin, jan ji dilê min diçû, canê min pîr dixwuriya. Ji ber vî min ji heta ji min hat xwurand, nexasim piştî min hinekî xwurand, herdu milên min dibê min de ketin. Neşaş bim nêzi 3 seeta di wir de mam.

.....
Ku dişa ji min bersiva erinî nesitandin, hinekidin li min dan, piştî min birin mezelê ku şoreşger tede ne. Piştî lédankar çun, leşkera çavên min vekir in. Du kesa min hêdika birin teniştê diwar. Hogirek nêzi min bû, got *"tu li wanê hertiştî êşkere dikin nenêre, ji xwe ewa dev ji tekoşinê berdabû."* Ya rastî serê mirov bi van peyvê şoreşgera bilindtir dibû.

Paşî mirovekî kal anîne cem me. Hevalekî ji zilamê kal pîrskir *"apo ma sîcê te çîye? Zilamê kal bersiva vî pîrsa ku bi dengê nîzm hate kirin wiha da; "min qederê 60 donimî pembû çand. Di kêleka pembû, ji hêla din ve 2 kes derbasbûne, ji min re dibêjin: bêje ma ew kes kî bûn, nevê wan bêje."* Min nedibû ku derbasbûne; derbasbûn ji ezê ji ku navê wan zanibim. Navê kesê di ser erd de derbas dibe nikarim bipîrsim. Lê gotin *"na, na tu wan kesa nsadiki, tê bêji."* Wekî din ji digotin *"em bêjin tu navê kesekî nizanî, navê şoreşgerên dinê ye tu zanibî bêje, ger tu van ji nizanibî; bêje danûsitandina şoreşgera bi kî re heye, diçin malên kî, kî di derheqê şoreşgeran de bi erinî dipêyve, miheqeq tê zanibî..."*

Büyerekê qet jibîr nakim. Wan rojan zarokekî 11 salî anibûn. Di koma 4a de dixwend. 4 seeta li wî zarokî dan, lê zarok timî diberxwedida. Gava bersiva erinî ji devê zarok negirtin, anin ba me. Piştî zarok anin, ji seetekê zêde girîya. Dest, ling û devûrû lê werimibûn, xwînê di dev û poz de diavêt. Paşî dev ji girî berda. Zarok niv-tazi bû, cileke pak lê tunebû. Îşlikekî qetiyayî û şalekî pînekirî lûbû, ling tazibû. Weke di nav avê de be dirihilî. Hêdî hêdî min xwe

rast kir û min dest jêre kir (weke bêjim were vir). Min pîrsî *"ma sîcê te çîye"*. Qasekî xweş ma, bersiv neda. Paşî got *"ji te re çîye!"*. Ew li zaroka jî çavsoyî û hingavtinan dikan....

...Hingavtinên li me dikirin, ne weke bê tehamûlkirin bûn. Lê baweriya min ya bi vî yekê hertim li cih bû: *"şoreş zehmete, lê wezîfeka bi qîymet e, ji bo jiyandê berxwedan hewceye."* Hinker ji bo vî min bi çavên xwe ditin. Serê sibehê gellek hevalan birin, lê venegeandin. *"Me wan kûst, hêdî hêdî dor wê were we ji"* digotin. Ji dêlva yên birî, hinek şoreşgerên din anin. Wan ji cihê din anibûn cem me. Hingavtinên li me kiribûn, li wan ji hatibû kirin. Ji xeynî hinek xwesipara, berxwedan didomiya. Li vir gelek bûyerê eşê dixistin dilê mirov ji hebûn. Herwek hin kesên berê refên pêş yê PKK de cih girtibûn, alikariya bi dijmin re dikirin. Bi vî rewşê jî, dibûn sedemê zêdekirin tehba ser şoreşgeran. Zîrardana wan bi vî jî nediqediya. Ew bûn sedemê girtina gellek welatparêzan...

... Şoreşgerekî ku ji min bêtir lédan lê kiribûn, anin cem min. Sê rojan li cem me ma, dirêjkiribû, qet xwe nedilbitand. Emeliyata wî teqiyabû; hewcebû biçê nexweşxanê. Lê wî nedibirin. Piştî çend rojan ji mir. Ji me, îmze ji bo ku di birçibûna mirinê de mirîye sitandin. Herçuqas laşê wî bi birin bû, kufşbû ku ji ber emeliyata xwe miribû jî, dişa bi îmzesitandinê, dixwestin bûyerê sergirti bihêlin. Ne insan, heywan ji nikaribûn di bin van hingavtinan de debar bikin. Di bin van hingavtinên giran de, gellek şoreşger hatin kuştin, min bi çavê xwe dit...

Paşî min ji navendê (merkez) birin tugayê. Li tugayê rojekê seranser ez di bin hingavtinê de mam. Lê roja din me hingavtinên girantir li wê derê dît. Gellek şoreşger li wê derê bûn. Ya rastî cihê girtiye şoreşger li Ruhayê (Urfa) nemabû. Lê dişa ji girtin û hingavtinan kêr nedikirin... Hingavtinên li pireka dikirin, ji hingavtinên li zilama dikirin ne kêmtir bûn, hê zêdetir ji bûn. Kalekî li cem me wiha digot: *"min û bûka min bihev re anin û gotin 'ger tu cihê kurê xwe nebêji, emê li ber çavê te destbavêjin bûka te.' Ji gotina xwe kêr neman, 4-5 kesî li ber çavên min*

PROVAQASYONA CUNTA FAŞÎSTA TÏRK A NÛH: KKTC

– Komara Tirk a Bakûra Kibrisê–

BÛYERA, ji demekî dirêje pir gef û got ser dihat kirin, ha va telali bû ha wê xûyan bibe û bi vê bayê bûbû domandina mijûlbûnê, di rojên derbasbûn de li Kibrisê jîngar bû. Cunta faşist a Tirk, provaqasyona xwe a ji mēj amade kiribû bikaranî û bi navê “Komara Tirk a Bakûra Kibrisê” leyistokek ku derivandina wê neyi raxist. Bili daxwestina gelê Kibrisê, hati leyistandina ev rûdan, ji bo mafên cunta faşist a Tirk û emperyalizmê re pêkhat.

Bili berî nuhan ji leyistokek wusa dihat hevbendî ji, hatiye dereng xistin û rojgerana nû de lihevanin. Di vê pirsgrê de mafên cunta faşist a Tirk û pêşewar de USA, mafên hemû emperyalistan, xwe yekbar lihevtênin. Lewma karanina provaqasyonê de tu tirs û çeper neditin.

rawestine, rê nede pêşketinên din. Bûyera ne rast dîtina van biran ji, lewra ye. Balam cunta faşist ev provaqasyon, bo hîmtir û hêztirbûna xwe bileyîzine û bikarbêne, birêvekir.

Serî de USA, hemû emperyalist vê leyistokê derivandine. Temaşê de, ser dabin du-sê tewrên sexte û rexne li ser daxûyaniya KKTC kiribin ji, azinên bikartênin nikarê vê biryarê rawestine û ev leyistokên emperyalistan baş xûyanî dîke. Bûyereke bi vî awayî, berjewendên emperyalistan gelek bar û kiryaran de fireh û hatigihîştî dîke.

Bi vê şewê, bo êrişên xwe li ser Rojhelata-Navin, Rojhelata-Behrasipî xwestin xela leşkerî bidest bînin.



Herweha ne bêsaxloşên û bêagahên vê domandinê; lê ji serî de ew bixwe navde bûn û doman damezrandin.

Hilbijartina 6. Mijdarê de bi rewşa rûçik berbierdê ketî. hatîy cunta faşist, dixwest dawiyên bûyer pêkanîbûn rawestine. Lewra serî li her babet rê û çaran dîda. Eşkere ye ku, dawîya ji hilbijartinan derkete holê, dinav girsê gel de wê behtir rêya mijûlbûnê çakbaniya. Rewşeke wusa ji, wê bibe sedem, daku cunta faşist nekaribe bernama li pêşîya xwe bikar bîne. Nexasim cunta faşist daxwaz dikir, mijûlbûna dawîya hilbijartinan li hundurê welata biseknine û rê nedê ku dijbera civakî hilm li ser sazûmana Özal bimeşîne. Bili bikaribe bernama xwe seranserê bajo serî da provaqasyoneke wusa û xwest pêşketinên li dij bûn, gora mafên xwe bizivrine.

Piştî dawîya hilbijartinan agah bû pêde, yekderpêkanîna sazîkî halo, ev daxwaz berbiçav dîke. Nemaze, vê barê de hin birên burjuwa muxalif, biryareke bi vî awayî ji ber demwext ne rast dîtî. Ev şanî dîde ku, cunta bi leyistokek wusa li hundur, xwest rexne û lomên van biran bo mijûliyên û beravêtinên dawîyan hilbijartinan

Bihevnaîniya dinav berên Yewnasistan û NATO (Pakta Bakûra Atlantik), neberjewendiya NATO bika tê xwestin ji vê cihgehê; û ji ber Kibris mîna berê ne heremeke ku jê emperyalîzm bikaribe berjewendî hilbigre hwd. Ji ber şîrûtên rojgeran, Kibris emperyalîzm nerihet dikir. Nexasim, emperyalîzma USA, Kibris a bi vê babetê pêwîst bû, bê guhurandin. Nexwe ev cihgeh berdewama nerihetkirina emperyalîzmê wê bajotiba. Bi kîjan daxwazan êrişa Kubayê dikira, ger tehlûka mîna Kubayê nebe ji, bikaranînen dijbehin dixwazê li vir ji birêbixe. Ji ber nedikarin seranserîya Kibrisê bidest bixin, li bakûr karanînek wusa zakirin.

Bi vê bingehe sazûmana derxistin berçavî, daxwaza emperyalîzmê ye ku di vê heremê de, hêlên alozî û êrişbazi bê îfade kirin; û ev ne tişteke din e. Ji vê hêlê, mîna dixwazin wê maf bikşênin û ji vir êrişan sazibikin. Weke ku ketî weşanan ji, di serî de USA, hemû emperyalistan, çawa wê ev der ji xwere bikarbênin, hinkereke vekirî ye.

Ji hêla din, armanê û ramana paş-dehfandina huku-

meta Yewnanîstan ji, xwestine. Ûsteke "erê" gotina emperyalîstan ji ev e. Halo dixwazin, hukumeta Papandreou bidehfênin enîşkê û bidin erdê. Gerek, bihev-nekirîyên ku hukumeta Yewnan dinav NATO û AET zadike, gerek ji ditina gelê Yewnan vê barê de emperyalîzm pir dijwar bêqeys dike. Bona bikaribin ev hejineki bê mecal bikin, ev hecat serrêxistin, û ev provaqasyon damezrandin.

Ji ber van hemû sedeman, herçuqasî dixwazin ev bûyer bê zanin û têkiliya cunta faşîst a Tirk, USA û emperyalîstên din şanî bidin ji, ne wusa bûna vê diyar e. Şexsem, ev provaqasyon ji hêla van hemûwan bi şîrkati hatiye amadekirin û domandin. Herçuqasî emperyalîstan ser vê bîrê rexne kirin ji, di vê korşerê de alikarî û piştgirtina provaqasyonê dikin, û ev rastî berçavî ye.

Li ser van, ji ber rûdan û pêşderketîyên hêvîdar, navça Îran û Îraqê, ji bûyera Kîbrîsê hin hînkêrên ku mirov derxîne hene. Dijbehê leyîstoka ser Kîbrîsê hatî berpêşîn, dikarê li vê heremê de ji. bê leyîstandin. Sazûmana Tirk, ji serborê dixwaze Kerkuk û Ezerbeycan (a bin karbîdestiya Îranê ye) bike bin serdestiya xwe. Dema pêşiya me de, min li Kîbrîsê çêkirin, heye li van deran ji ev pêşî bixin. Herweha bin navê "rizgarkirina" nijada xwe ê Tirk, ser Kerkuk û Ezerbeycanê dozê wusa tevgerin bike û merhelan de "çêbû-xelasbû"yan, zadar bikin. Serpêhtiya dîroki û rewşa îroj bo vê yekê pir lihev-têtin. Çawa dîrokê de bi zorê, "çêbû-xelasbû"yan pêşketiye, dixwazê îroj ji bi van rêyan û azinan, xwe hatî-gihîştî bike. Lewma kijan heremê de ûst û şîrût çetir pijiyabin, van merhelan de rûyê xwe ê gemar û vereşîne daxûyan dike, û ji vê qet xwe nade paş.

Rewşa ku îroj herba dinavberê Îran û Îraqê diyar kiriye, ji ber ku li dijî cuntaya faşîst xusaran derdixîne û li hember nexweşîyan didarîstine, dewleta Tirk heye xwe têkilî van cihgehan bike û êrişan bajo. Hînkereke min li Kîbrîsê, jê re îspateke ku cunta li van deran ji rûdanan pêk bîne. Ji xwe tê zanin, hazîrî û amadeyên ser vê barê, ji mêj de hene.


Li hundur û derve êrişbaziya xwe di vê taxê de bilind û zêdekirê cunta faşîst, ji ber xwehebûn û qerekerê xwe a harûhov û neyari li hemberê gel, pêşiya alema gîştî ya dinyayê a pêşveçûyî birabirin bûye û bêkeys ketiye. Bivê babetê, "çêbû-xelasbû" ya Kîbrîsa Bakûr û dîrokê de saziya dewleteki bi vî rengî kêmbê ditin de, daxûyani û diyar kirin, ji 3 salan virde ye, pikoliya bikarhat, lêdan, hingavtin û ji ber qirkirinan bi bareke girîng jê hêla alema gîştî hatiye rewşa pişangi û tenê mayîne cunta faşîst, ji vir û pêde leztir û zûtir wê rabirin (tecrît) bibe.

Ev pêşketin, wê bersekîniya û xweragirtina alema gîştîya cihanê hember cunta faşîst gelectir têdayî bike. domandîna hilmkartir bi xwe re bîne. Xaponekên cunta min li "hîlbijartinan û vegerîna demokrasiyê" hwd. nikare rê bide ku berrabûnê alema gîştî bide rawestandî. Li gel dij wê, bi van pêşketinan re, sextekariya leyîstokên vegerînan demokrasi û rûçikê cunta a bîngê çetir der-

dikeve berçavî; ev dibe sedema rexne û xweragirtina alema gîştî ku behtir mezintir dibe. Di nav rewşa jîngar û heyînî, ragirtin wê li hemberê cunta bi hilm bidome.

Lewra, li ber rewşa ku karbîdestên çînên Tirk îroj têda dijin, dîroka wan de talankarî, vebîrîn, qirkirin û miratkari hêj di mêjiyê gelan de, bi hînkêr û bûyerên jîngar dagirtiye, û nehatiye jîbîrkirin. Ango gelên gêtî, bika hebûna wan a rojgeranî dîroka çînên serdestên Tirk ji pir baş û ji nêzik nasdikin.

Di dîroka nêzik de, zeftkirina Hatayê çawa hat pêka-



Gelê Kîbrîs beyana Komara Tirk a Bakûra Kîbrîs protesto dike.

nin, zorbazî û zînat çawa hat birêxistin qenc tê zanin.

Herweha hovîtiya li Kurdistanê bikarhat û çawa tê-xwestin li ser gel vebîrîyên û qirkirînan gîrs-komî bê pêkanîn, hêj bi jîngartirîn mêjiyan da cih dagere. Çînên serdestên Tirk, serkevtina xwe ser Kurdistanê, tenê dikarin bi zor û zînatê bêsinor bajon, bona vê yekê ji gel ji qirkirinan derbas kirine. Ji Palû-Genç-Hênê, Dersimê, Agirî, Zilan; bîyî pîrek-mêr-zarok ji hev cuda bikin vebîrîyên komî pêkanîn, Kurdistan heta quncikê xwe a veşartî zef û vegirtin û kirin bin serdestiya xwe.

Îroj ji bin mêtîngerîya faşîst, her babet karîninên hov û xedar tê ajotin, ji nas bigrin heta yên nenas dest davêjin her tiştê gel û bikarîninên xwe bendexane û zindanan de, bi hingavtin û kuştinan, hovberîya xwe digihîjin taqa bilindtirin. Gelên cihanê van hemûyan baş nasdikin û rê ji van re vekirê yarmetîya mêtîngerîyê ji, vêca bi şewa xwe a eşkeretir, dibinin.

Avayê ji ber van gişan, min serpehtiya xwe rojê wê yên îroyîn ji bi zilma dij-şoreşgerîya har, hatî avakirina cunta faşîst, pêş nezera alema gîştî, domana raberî, pişanga û biraberîna (tecrît) wê behtir bileze û protestoyên şewirtir û diwartir wê bialife.

Cunta faşîsta Tirk, bona civakeke Tirk bi 100.000an dewleteke derîvandina wê neyîn li ser cihanê, dema dipalîne, gelê Kurd ê 15 milyonan, bin serdestiya xwe digre. Bi azînan ku mirov di qurna nuhan de nikare bibîne, bi destgirtina dîlîti, gel bin nîrê xwe digre û dixwaze gelê Kurd bi zor û zîlmê li paşîya jina hemdemi û hûjen bigre, jina wê biyaniyê pêşve çûyîne bike. Bêşerm û fîhêtî, derewa

li diji pikolîyên li ser civaka Tirkên Kibrisê derdikeve û belavdike, lê belê li Kurdistanê gelek divebirêne, dixwaza hebûna wî ji dirokê rake. Bi buhatîya çî bibe bila bibe, bona bighîje vê armanca xwe, ku li pêşîya xwe daniye, ser dide hemû rêyan û her babet dinî, harbûn û nemirovatîyê pêk tîne. Pir raste ku ev leyistok, li ser vê rûçîka wanê dirokî ye. Serpehtîya dewleta Tirk, seranser bi talankarî, pikolî û qirkirinan, bi bûyerên ji gelan xwîn dadiwerîşand û bi hînkaran her babet hovîtîyan dagirti ye.

Vegirtina Kibrisê, liqekî ji politîka M. Kemal e ku di dema buhûrî de dihat pêkanîn, îrojî xwe ji nûhve de dihilmine. Bi vê bûyer û serpehtîyê, cunta faşîsta Tirk çak şanî da ku "Ataturk" vaneke baş e. Tiştê cunta faşîst nuha dikê, divê ji Kemalîzmê ne cuda bê dîtîn. Ew ji ber daxwaza Kemalîzmê xwe didin ser van rê û rêçikan. Çawa serborê de, Kemalîzm; di Kurdistanê de vebîr pêşdar kirîye, Hatay wergirtiye, dijminahîkî har li diji karker û gundiyan birêxistiye; cunta faşîst jî, li gor rengê ji Kemalîzmê girtiye bi eynî babet û tewran xwe ditewgirîne, pêşveçûyên dijbehîn pêşkêşî dike. Ev avayîya ku cunta faşîst tê ketîye, ji ber van sedema divê ji Kemalîzmê newe qut û cuda kirin. Ne tiştêkî din bilî rûçîka Ataturkvaniya rojgeranî ye. Bi bûyera Kibrisa Bakûr pêre, behtir xwedîyê serborîya xwe derdikeve û daxwaz dike wêna ji îrojê pêde pêwîsttir jîngar bike. Lewma zanistîya û têgihîştîya dirokê ji nûhve zadar dike û derdixe rojê. Mîna çawa dixwaze xwedîyê Kemalîzmê derkeve, îspat bike, gavên ku Ataturk avêtibû şopîna dike, bi hemû xwexweyîya xwe, mîna vî xwe ditevgirîne, dikurijîne û dilerizîne û dixwaze erîşbazîyê bike. Kar û xebata wan a îro, tene ser vê rêyê ye.

Balam di rojên em tede ne, ne rêdare politîka sextê ku cunta kedxwara faşîst bikartêne biçe serî û jêhatî bibe. Hevaleke wê di Arjantîn de pêk hatî ev zînat û zorbazîya koregirek, dawîya afirande holê berçav e. Mîna tê biran cunta Arjantîn jî, di sala derbasbûyî de bona danîna xwe bişidîne, daku hêrsa gîrsê gel ê zêde dibû nequlibe hemberîya şoreşgerî û balên wan bikşêne ser pêşketinekedin û şovenîzmê kûrtir bike û wana rawestîne, Falkland wedigre, li di dawî de pêşveçûnek çewta vê rewşê zadike û berza sazîyê li hundur û derve anibû qonaxa têkçûnê. Îro cunta faşîst jî, ser dayî jî vê leyistokê û ji ber koregireke li her hêl û merhelan da bikaranî, wê nikaribe pir bihesîle, ê sazî bê taxa berrabûna, ji ber van bikaranîna, li hundur û derve kijan behtir tûji dibin, ber û pêş. Cunta ger ji ber pêkanînê gihan merhelekî, ji ber şîyarîya giştîya gel ku li hundur û derve li diji vê politîkê qewre dibe û ji ber xweragirtinê sadir dibin, wê jêhatî nabe. Bi dem bihurandîne, ger gavên hatin avêtin pak û hêja bîn dîtîn jî, ger dimeşe daxûyan dike jî, rastî ev hebûna tevgerê ku paşî diçe ye. Heta rojên îro, çinên serdestên Tirk karîne bi politîkeke wusa jiyana xwe bidomînin, û berdewam bikin. Lê belê, ji vir û pêde, ev hacete jîngariya wan a bingeşîna yeke wê ev rê ji wan re pêk nayne.

Ji nuha pêde, cunta kedxwara faşîst nikare politîka xwe a korûgirek di hundur de bajo û li ser vê jî hêj behtir ev li derve jî bimeşîne, rêjê re nemaye. Cunta faşîst, vêca nikare bi zîlm û zînat xwe a çargavî xwe jiyandar bike.

Tellalkirina KKTC, keda nayê serrast û helbûna pîrsgirêka kûr a cunta faşîst a Tirk e. Ev gîrgîrek, ji aborîta rêzanîyê li her alîyan xwe pêşdar dike. Hatî girtin û aloziya xwe her barê de, daku paş xwe bihêle, ger ser dabe vê bûyerê jî, wê nikaribe çeleki û çelengîyê li ser rêya berjewenda xwe bisadirîne. Lew, li hundur û derve, bûyerên derketin berçavan, rê nadine vî tiştî. Herweha ji bona xwe piçekî rihet bike, cunta faşîst ku ser daye vê bûyer û serpehtîyê, wê jêre pîrsgirêkên giran derxêne, û ser wê barbike.

Ger cunta faşîst wê ji bin pîrsgirêkên hewqas dijwar û giran bikaribe derkeve, rêya helkirinê peyda bike; an ne? Wê bikaribe heta kijan taxê vê bibe serî? Em bawerîn, şansê wê di vê barê de tune ye.

Ev bûyer, ji ber ku keda pergela mezin a cunta faşîst a pêwîst e, dikare serê cunta jî bixwe an rê hilweşandina wê re veke. Ev dikare bê bendrawestandin. Di vê barê de sert û şîrût, ji binî nehatî gihîştine.

GELO SAZÛMANA ÖZAL MAL JÎ . . .

(Destpêk di ripelê 5an de ye)

hêzên şoreşger û demokratîk, ser bingeha vê fahmkirin û têgihîştinê hazîrîn ku bi dijberîya borciwazî re, bihevrebêbistên.

Başê! "Çepê" borciwazîya piçûk a Tîrkîye û Kurdistanê, bi kijan şertan bi tevgeran borciwazî re rê distêne, çima birdozên xwe eşkere nakin. Bilî vê zelalîyê, çawa dikarin hewqas bêberpîrsîyar piştî xwe biqulbênin şoreşê, û dikarin bi rûreşî êrişê hêzên şoreşger bikin?

Diyare ku ev hêzên hana, ser rêya nav ketinê de bi bingeha firotina şoreşê dixwazin çermên xwe xelas bikin û tiştêk din ji danafikirin.

Hêzên şoreşger û demokratîk nacarin ku li hemberê vê tehlûkê şîyar bin û xebata dijwar bo birabirîn (tecrit) û pişangekirina (teşhir) wan bajon.

Li hemberê vê "tevgera rawestandina şoreşê" a ku rastûrast ji aliyê sosyal-demokrasiya Awrûpî derketiye holê, divê hêzên şoreşger û demokratîk yên Kurdistan û Tîrkîye, ji alîkî rêxistinên xwe yên hundurî seranser avabikin, ji aliyê din jî, bi teqîqên rêxistinî û tekoşinê yên ku iktidarê erk dikin, ji hemû tengasî, alozî û derzên rejîmên, ji xwere berjewendî sadir bikin daku bikaribin li hemberê iktidarê gav bi gav bibin hêzên alternatîf.

Tevgerên şoreşger û demokratîk yên Kurdistan û Tîrkîye, wê ne pey dîvîka borciwazî û ne ji pay armanca demokrasiya borciwazî wê biçin lê pir ronîye ku ser bingeha rêxistinî xwe a serbixwe û ser bingeha tekoşin û livbazîyên xwe bixwe, bi sazîkirina ittîfak û hevberdîyên xwe yên bingeşî û bi piştixweve kişandina hemû hêzên muxalîfên din, bona iktîdara demokratîk a gel wê tekoşin bajon û şerbikin, û bimeşin karbidestîyê.

Gora vê dîtîne, ser bawerîyên û dîtînen EYBDF (Eniya Yekîtiya Berxwedani-Dij Faşîzmê) û ERNK (Eniya Rizgarîya Netewa Kurdistan) divê erkên hewceyên pratîk bîn pêşvebirin û firehkirin. Ev hîlbijartînek herî-rastî serbixwe ye. Rojên me de divên hêzên şoreşger û demokratîk mîna me nuha li jor gotî, vê rastîyê ji xwe re bijêrin û bingeş bigrin lewra tu rê din tunin.

BERÎ CIVÎNA CÎVATA AWRÛPÎ DÎTÎNA GELEMPERÎ



30ê meha Çile hat. Vê rojê de civîna parlamentarên meclîsa Awrûpî destpêkir. Berî civînê, berhevdan û mijûlin li Tirkiye û Awrûpa zêde bibûn.

Mîna tê bir û hiş, civata Awrûpa civîna xwe a Êlûn 1983an de, bîrîyara ku parlamentarên Tirk civînê de cih negrin derxistibû, lê şewra bingeîn hiştibû mējuya 30ê Çilê, dixwestin taliya "hîlbijartinan" bişopînin. Piştî dawîya hîlbijartinê ku ji hêla hêzên Awrûpî ji nêz dihat şopandin, bîlî tu guhurandin sazûmana Tirkî de pêşneketibû, hêlwestên Awrûpî xwe şûna "dijwariya" pêşî dajotin, bi rêwşekî "nerm" nêzi Tirkiye kirin. Herwaha, gora salox, agahî û berhevdanên gihan alema giştî, bo vê civînê bîlî baweriyên ser civînê sê ditînen din xwe aşkere dikin. Yekemin; divê Tirkiye civînê de cih bigrê, duwemîn; bila miha Gûlanê pêşdari bibe, sêwemîn; ji bîni civînê de cih û şûn negre. Ev rûdan karlekîrî û hilma xwe dide derdorên borçîwaziya Tirk ji. Kesên du ditîna ji xwêre rast digrin, dixwazin pêşdari bibin, hêlwestên din li benda civîna Gûlanê rawestandin pêşneyar dikin, lew şûn girtina li civînê bixûsar dibînin.

Ev pîrsgîrekên li Awrûpa hêzan mijûl dikin, rojenî li Tirkiyê ji tîn hurkolanîn. Têdayiya rewşê û çî çekîrin tî xwestin, ji hêla gel berçavî tî pîrskirin. Bîmaf herkes "vergerîna demokrasi" û li benda wê mayîn bî tîda

diderivêne, rastiyên rojgeran bi hemû tazîtiyên xwe diyarin, lewma avakîrên 12ê Êlûnê hemû qedemên sazûmanê bin destê xwe de digrin, herwaha bin vî rewşê hêj peyva "demokrasi" pêşewar kirin, gir û hêrsa gel mezintir dike. Eşkere ye ku, gelên Tirkiye û Kurdistanê, hêzên demokratîk û şoreşger bi maf ev lome dikin. Û hêzên demokratîk li Awrûpa ji ev xurttir dikin. Di demeke mafên mirovan yê bingeîn tî perçiqandin, dadîngahan de her roj bi sedan demokrat û şoreşger tî kuştin, mafên karkeran tî mijandin de, behsa "demokrasiyê" kirin, tenê dikare taliyên bizdehîn derxêne û rewşekî xaponek e.

Mîna ji bo hêzên demokratîk û şoreşger yê Tirkiye û Kurdistanê, bona hêzên demokratîk yê Awrûpa jî, behsa û berhevdana, ger parlamentarên Tirk dicivînê de bî derivandin, an ne, ger parlamento wana nasbîke an ne, nikarê bibe bûyera bingeîn. Lew, berî hertiştî, dixwestina demokrasiyê li Tirkiyê; di 12ê Êlûnê bi derbekî leşkerî jordest bûye û 6ê Mijdarê de hesabên xwe veşartinê bi hîlbijartinan kirê û hêj leyistok misoger dikê diktatoriya faşista devbixwin, tenê bi xwestina tekoşîna wana hilweşandin bicîh dikare bî. Ev zorhewce ye ku bî derivandin û piştgirtin. Ger ji demokrasiyê, bi cilên sivil yê serxwe de kirine, hovberî û

vebîriyê didomîne, sazûmanê leşkerî neyî tîgîhiştin, ger derivandina mafên çîna karkera û gîrsên xebatkar bî bîrdozin û ger îroj bin hovberiyê de ye mafên gelê Kurdistan bîxwazin bî parastin, tîstê bî kirin eve ku; an piştgirtina van gelên li hemberê cuntaya faşîst bo demokrasi, serxwebûn û tekoşîna wan bo mafên mirovatî divê bî derivandin, an jî divê xwedî şîrîkî gunahbarên sazûmana devbixwin, jî serî de derivandin bî ditin. Vê barê de derketî pêşçavan, tercîh û bijartînek wûsa bêaxaf hewce ye.

Li Tirkiye tevgera şoreşger û demokratîk, Kurdistanê tevgera rizgariya netewî bîlî her babet êrîşan nekariye bî hilweşandin. Bîlî bi her ûştî talan û mijandinê aloziya kapitalîzma yekdest kûrtir bûye, hemberê pêşketinê dijwar di heremê de burjuwaziya Tirk tengasiyê de ye û dubendiya nav çînen burjuwa çuqas diçe behtir serav dikeve. Ev rewş dirêjahîya aloziya emperyalîstên USA û Awrûpî ye, ne rewşeke ger mirov bî mirov hember demokrasi be an ne. Balam bi tekoşîna dinavbera monopolan, dixwazin sazûmana burjuwa, çetir bî gotin. Dewleta mêtîngera Tirk, bi jîngarî dirêj kin, atîya wê biparêzin. Ango ev dubendî taliyên nikarin bî serrastkirin. Dorhêlên

(Dûmahik di rûpelê 38an de ye)

George Habbaş:

“Ketina Arafat, Ne Hilweşandina Şoreşa Filistîn e!”

“Piştî serekê komîta birêvebirê PLO, Yasser Arafat, mējûya 24.12.83an de seri li Qahîre da, pêşajoyê PLFP (Eniya Rizgariya Gelê Filistîn) George Habbaş civînek li pêşîya weşîn û rojnameyan sazî kir. Di vê civînê de, ev serdan bi rengê: ‘ev ger hilweşandina tevgera şoreşa Filistîn ramangar dike’ daxûyan kir. Û Yasser Arafat bi navê ‘Sedat ê Filistîn’ da navdan. Diyar kir ku, ji vê keliyê pêde, Arafat nikarê berpirsiyariya PLO û gelê Filistîn bike. Bang li hemû hêzên Filistîn kir, daku li hemberê pêkanînên Arafat tewrê xwe eşkere bikin û berxwedanê bilind bikin.

Ev tewrê Habbaş, îro hilweşandina planên emperyalist û paşverû yên li Rojhelata Navîn, armanc dike; bi baweriya ev tewra wî, bo pêşketin û bûyerên talî di qada Kurdistan de bo xebatên tevgera şoreşger, wê çirûskên ronahiyê bide, dixwazîn birek ji nivîsta civîna wî a pêşîya rojnameyan kirî, mîna xwe berçavê alema giştî ya şoreşger û welatperwer, pêşkêş bikin, lew ev ji me re ji amadekarîkî hewce ye.


Heval George Habbaş, di civîna pêşîya rojname û weşanan de:

Sekreterê gelemperîya PLFP heval George Habbaş, mējûya 24.12.1983an roja şemiyê, di qarargaha kovara El-Hedef li pêşîya rojnamen û muxabîrên ajansan yên li Şamê, ku hêjmareka bilind li vir bû, civînek pêkanî.

George HABBAŞ- Ji roja şoreşa Filistîn derketî ta niha, ji xwe re azîneki berxwedana nûjen pêk aniye, daku dubendiya nav siyonîzm û Ereban de bo mafên gelê me û netewa me bîn bikaranîn. Dijmînên gelê Filistîn dixebitin, daku berxwedanê hilweşênin. Bona vê yekê pir babet plan pêşve birin û dibin.

Emperyalîzm, siyonîzm û dorên paşverû, serê 18 salane dixwazîn şoreşa me, a ku kesbûna gelê me û yekitiya wê afirandiye, qels û bêhîm bikin. Her weha êrişên leşkerî û rêzani birêve birine. Lê, hemû mijûlî û xebatên wan bi fîasko dawî pêhat. Balam şoreşa me, bi hindakirên giran û kovanan, êş û xwînê ser rêya xwe de, berdewam kir. Ev rewş di dirokên şoreşan de, kêmkirî bû.

Siyonîzm û sazûmana USA, daku PLO têkçûn bikin (ji holê rakin), hemû çekên xwe mîna yên leşkerî, rêzani û



George HABBAŞ

weşanî serrêve xistin û wana bi hovîtkî mezin bikaranîn.

Lê berxwedana leheng û keleş a gelên Filistîn û Libnanê û şervanên wan yên hogir û dilsoz, ev êrişên hovberî pûçkirin. Şanî kirin ku stratejiya şoreşê (stratejiya şerê geli), li hember zexma teknolojîk a dijmin, raste û bilî vê rêyê, tu hîlbijartinek din bo rizgariyê tune ye. Ev rastî bi tekoşînên xwe îspat kirin.

Lê mixabîn, derdorên birên emperyalist û siyonist, bi hevalbendiya û bihevrexebatdariya paşverûtiya Ereban, yek keli şerê xwe a bêmaf narawestandin. Dema taxa leşkerî de binkeftin girtin, êrişên xwe yên rêzani herweha domandin. Pişt vegirtina Beyrûdê, Amerika bo atîya erdên zeftbûyî, xebatek ajot, daku hevpeyvîn bi paşverûkên Ereban re bikaribe bike, xwest wana bixşîne hevpeyvînê. Sazûmana USA, bawer dikir ku, PLO pir bêkeys ketiye û nikarê li hemberê planên wan derkeve. Ji ber vê dîtina şaş û bêbingeh, nederivand ku PLO, berpirsiyar û nûnerê gelê Filistîne û plana Reagan pêşneyarê van hêzan kir.

Berî civîna 16. a Meclisa Netewa Filistîn –CNF–, pir îşaret hebûn ku sereketiya birêvebirê PLO, amade ye bo vê planê rûnê ser masê. Bilî me ev didit, bona em bikaribin yekitiya rêxistinê û xeta netewî biparêzin, me

xwe bi serpehetiyên demokratîk girêda. Û me xwest di sinorên dadî yên rêxistinê de, tekoşinê bajon, Ev bijartî-neke rast bû. Di civinên 16. yên CNF de, piştî berhevdanên westayîn û pêwîst, me karî bernameke (program) kêmasî a netewî derxênin. Ev bona bingehekîrîna atîya xeta rêzanî a rêxistinê û yekîtiya wê pir tişteki baş û biha bû.

Dema nav refên Fetih de tengasi, alozî û nexweşî pêşçav bûn, me xwest yekîtiyê biparêzin. Bêlez û biaram, me xwest van nexweşiyên ser rikna yekîtiyê û pêşketinê helbikin. Her babet xebatên behra me bûn, me bicîh anîn. Em li hemberê çek bidestgirtinê derketin. Lew me dizanî ger çek bîn bikaranîn wê şoreş bêhîm, bêkeys bikeve, wê ji birdozên xwe dûr bikeve û perçebûn û belavbûnê bidamezrîne.

Taku bingeha welatperwerî hebe û xwe bajo, bawerîki me a dijwar heye ku, em dikarin dubendiyên nav refên şoreşa Filistin, bi azinên demokratîk ji holê rakin. Zagona zanistî a ku dubendiyên nav refên şoreşê de dadîgeh û pîrsewar dike, zagona yekbûnî û dubendiyê ye.

dabû. Yasser Arafat bi vê hevpeyvinê, eşkere kir ku şewra derivandina plana USA a xwesiparî û nokerî dixwe de barkirîye, dide.

Ev gav, berdana xeta netewî a bi tehlûke bû. Bi vê: Yasser Arafat, bêberpirsiyariya xwe bo mafên gelê Filistin diyar dikir. (Mafên gelê Filistin; ser erdên xwe yên netewî, çarenûsa xwe bixwe bibjêre. sazûmana xwe a serbixwe sazî bike hwd.)

Ev gav, bi rewşekî eşkere û zelal li dijî biryarên CNF û gelê Filistin hat avêtin. Ev ûşt, Yasser Arafat, dani hemberê gelê me ê şoreşger û wî ji binaka netewî, ser rêkî şaş, dûr xist. Lewma, vêca em Yasser Arafat serekê PLO û birêvebirê komîta wê, naderivênin. Em nema dikarin wî serok bibînin. Bona parastina xeta netewî a rêxistinê, bona parastina yekîtiyê û refên netewî, emê Yasser Arafat bi azinên demokratîk ji serekîtiyê dûr bikin. Îro, di-yarkirina van mercên xwar, ez pêwîst dibînim;

1- Zehmetî û alozî çuqas tekoşina me balifîne, bila be, bawerîya me bo doza me a dadî û mafên me yên dadî, nikarê bê hejandin.



Bes ev rewş, bi taybetiya xwe ji gavên Arafat ku avêtiye, dûr digre.

Hevpeyvîna nav Yasser Arafat û karbidestên Camp-David di sêrata Kubbe de çêbû, têdayîya nêzîkbûneke rêzanîya bi tehlûke ye. Lew, gelê me pir salên dirêj li hemberê vê rabûbû. Bedelê wê bixwîn û ronakrewanan

2- Bona berdewamkirina tekoşina çekdari, emê tevgera xwe a hişk, bawerî û birdoza xwe a bi him bidomînin.


3- Yekîtiya refên Filistin, li hemberê dijmin û planên wan, çeka pêwîsttirîne. Daku bingeha netewî de yekîtiyê parastin, emê bi hemû kiryar û berpirsiyariya xwe,

bixebitin.

4- Baweriya me, û ditina me a hişk ser bingeha welat-perweriya rast bo yekitiya netewî, xwe palandi ye. Ev tewra me, birayên me yên nav refên Fetih de; an dibe şasiyê, an jî, ji ber doza me a dadi leqayî her babet êrişan dibe, rêzên xwe li hemberî van êrişan zexm dikin. Em girîng dibinin ku, bangeke wusa ji bo van birayên me hewce ye.

PÎRS- Hûn Arafat iro çawa dibinin?

George HABBAŞ- Mîna ditina zagonî, Yasser Arafat hêj serekê Birêvebirê Komîta PLO ye. Lê, ji vê keliyê pêde, nikare berpirsiyariya daxwazên gelê me bike. Nikare ramanên gelê me bibe seri. Ez bawer nakim, ku ji vir û pêde serekê Birêvebirê Komîtê bimîne. Arafat, li pêş çavên gelê me Sedat ê Filistinî ye. Bawerîki me hişk pê heye ku, tewrê gelê me li hemberê Sedat damezrandibû, wê hemberê Arafat ji bidamize. Arafat bi ditina gelê me sembolek bû. Lew ewî daxwazên gel berpirsiyar dikir. Gava pişt li daxwazên netewî a Filistinî bizivirne, gelê Filistin û gelê Ereb ji wê pişt a xwe li wî bizivrin.



George HABBAŞ

PÎRS- Ger Arafat bê dîrxistin, wê kî xebatên rêxistinê bajo?

George HABBAŞ- Pirsgrêka wûsa bo rêxistinê, wê pirsgrêkeke kin-dem be. Nuha, divê endamên birêvebirê komîtên cihî di vê pirsê de gavên xwe bavêjin, bona xebatên rêxistinê nav xwe de dan û sitandinê bikin. Bili vê serekê di me heye, yê ku ne ji hêla Birêvebirê Komîtê, lê ji hêla CNF hatiye hilbijartin. Bona halkirina pirsgrêkê, dagirtina valayîki wusa, divê serekê CNF Halit Fahhum dest bi xebatê bike. Lê bili hemûwan, divê em van kêmasiyên zagonî ji kêmasiyên xebatên şoreşgerî dîrbikin, ji hev cûda bibinin. Ez dizanim ku, ji hêla kêmasiyên û aloziyên zagonî û hin pergala din de, pirsgrêkê gelekin, bi vê re ez nikarim tişteki din bêjim.

Lê, bo domandina şoreşê tu pirsgrêkê tunene. Çekên me, wên tim û tim li hemberê emperyalîzmê û siyonîzmê agir bigrin. Bi taybetî, di vê pêvajoyê de, li gel tekoşîna

rêzani û xebatên girsên gel, di vê di şerê me de, tekoşîna çekdari ji, li hemberê emperyalîzmê, zêdetir bibe.

PÎRS- Ger piştigirt û muxalîf behtir bin û xwe bizivirên Camp-David, wê gavê, Yasser Arafat wê bikaribe bi dadi nûneriya Filistin bike?

George HABBAŞ- Berî her tiştî ez dixwazim bêjim ku, ev pirs, pirsêke gellek nazik û tenike. Ger bê barbal kirin ku emê li hemberê vê xebatê serpê rabin, bersiv ev e; gelê me bo parastina doza xwe wê rabe ser piyan. Lew gelê me bi dirêjahîya 18 salan hewqas kovan û xusar ne ji bo ku şoreşa me bi bingeha Camp-David dawî bibe, da. Ne ji, bona vê yekê şoreşgerî kir. Hûn dizanin, talikirina şoreşê ser bingeha Camp-David tê kîjan tedayî yê? Ango, ne jibo şoreşa Filistin, ne ji bo mafê gelê Filistin, daku vegeerê welatê xwe û çarenûsa xwe bi destê xwe bibijêre ye!

Ger em pêşbendî rewşekî wusa bibin, emê "çeka gel" bizavînin. Emê, gel bo domandina şoreşê, zana û hişyar bikin. Ez nikarim bawer bikim ku, gelê me wê li hemberê Sedatê Filistinî bédeng bimîne û bi hemû hêza xwe li hember wî şernake.

Nenêrin gotinên Ferîç û Şavva, heval! Em tewrê gelê xwe yê li erdê zefbûyî de baş dizanin. Dijminê siyonist, daku doza netewî a gelê me bike ser rêyên şaş pir xebat kir. Yekitiyên Gundan, hinkerên eşkerene (Yekitiya Gundan: Bona planên otonomî bîn bikaranîn, Îsraîl bi destê Filistinîyên noke û sîxur du rengên rêxistinî avakirin. Ev rêxistinê hana, divê bû, bibin alter-natîfê PLO).

Hatina Arafat wê ji hatina serekê "Yekitiya Gundan" Mustafa Dûdin ne çetir be. (Mustafa Dûdin: Serekê "Yekitiyên Gundan" yên ku Îsraîl saz kiribû, bû. Dema ewî ev karê xwe dimeşand. Filistinîya pêşî wî teşîr kirin, dawî sala 1981 an de kuştin. Ev bixwe bihevrexebatdar û nokereki Îsraîl bû.)

Ev pirs a te, ji min re dibê sedem daku ez bang li her jin, her mîr, zarok û ciwanên Filistinî bikim. Daku tewrê xwe li hemberê gavên tehlûke diyar bikin. Her sendiqe û yekitî, her welatperwer û kesê Filistinî girîng li hemberê vê rewşê, tewrê xwe berûpêş bike. Kin bê gotin, divê herkes bersiva vê pirsê bide: "Tu hevalê Sedatê Filistinî, an tu dixwazê şoreşê bê domandin?"

Gelê me wê herkesî, li hemberê van gavên bi tehlûke, bi tewrê xwe berdadingeh bike.

Tu kes nikare bêje, ev gav, gavekî hesane, an xwerû ye. Em ji demek wûsa derbes dibin: "Hebûn an nehebûn!". Pirsêşkere ye ku, bo em hebûna xwe biparêzin, emê bi her hîm, hêz û sextên xwe bixebitin.

PÎRS- Piştî Arafat ji Trîpolî hat derxistin, imkanên destê wî de çibûn? Kuderê ve diçe?

George HABBAŞ- Ez bawerim, gora ditina teorîk, destê wî de pirsê babetê bijartin hebûn. Camp-David ne çara yekemîn bû. Hinker; dikarî rast biçe Tûnis. Li vir, dikarî bangê bo birêvebirê komîtê re bike, daku dan û sitandin ser şîrûtên rojgeran yên şoreşa Filistinî bikarbînin. Di rewşekî wusa de, em bi navê PLFP biçûwan civînin. Bo serkeftinê, bi hemû hîma xwe, emê bixebitîyan. Meyê

piştgiirtiya Arafat, ne ji bona kesbûna wî, lê ji bona serekê birêvebirê komîtê ye, bikira. Bijartîna welatperwer ev bû, lê Arafat ji xwe re "bijartinek" din derivand.

PÎRS- *Tewrê we li ser alikariya Misrê û Urdunê bo Arafat çîye? Em dixwazin binin biran, ku Sûrî wî (Arafat) teydi nake?*

George HABBAŞ- Ez bawerim bersiv pir zelale. Husnî Mubarek û Mîr Huseyîn alikarî didin Arafat. Li hember vê rabûna Sûrî pir xwerûst te. Sûrî ji ber xeta xwe a rêzanî, pêwiste li hember vê şewê derkeve. Misir û Urdun piştgiirtiya Arafat dikin. Ji ber ku dixwazin, Arafat plana Reagan biderivîne. Sûrî li hemberê gaveke rêzanîya wusa ye. USA, enîya Erebb (PLO û Urdun) bona vê yekê berkar dike. Hazîrîkî wusa bo Îsraîl hiştiya paş. Ger enîya Ereb bê refê, wê li benda guhurandina sazûmana Îsraîl bisekne. Hinker: mina Partîya Karkerên Îsraîl bêne karbidestiyê.

Lê, ez tim û tim vê pîrsê ji xwe re dikim: çima Arafat ji dawîya serekên Ereban yê berî nuha têgihiştinî nagre! Lew, ger Amerika bi planê xwe nekaribe biçe serî, eşkere ye ku wê bêje; "kusurê nemînin, Îsraîl naderivîne, em nikarin behtir sixte ser wan bînin".

PÎRS- *Hûn bawer dikin ku, hêj rêya tevgera leşkerî bo Filistinîyan heye?*

George HABBAŞ- Erê, ger hûn bi pîrsa xwe, bê alikariya enîkî Ereban bo şoreşa Filistin, tenê bi bingeha şoreşa Filistin, destpêkirina bizav û livbazên rizgariyê, armancê dikin, divê ez bêjim; ev pir zehmete.

Ger hûn pîrsa tekoşîna leşkerî dikin, vê gavê tiştê ez bêjim eve; şervanên Filistin, divê li Filistin û Libnanê bi komên piçûk xwe sazî bikin. Bi van koma derb li hêzên Îsraîl bidin. Nexasim, ev tişt nuha hê jî dibe.

Tekoşîna çekdari a Filistin, li gel bindestiya mafên netewî yê Filistin, wê bidome û bilind bibe. Ketina Arafat ne hilweşandina şoreşa Filistinê. Tekoşin û berxwedana çekdari a Filistin wê seranser bîji.

PÎRS- *Serdana Arafat li Qahîre ji we re bû surprîz? Hûnê çawa, li hemberê vê serdanê rabin?*

George HABBAŞ- Bi taybetî berî şoreşê Beyrût valakir, me pir analiz ser "rasta" Filistin kir. Analîz eşkere şanî didan ku "rast" hêdî hêdî ber bi Amerika ve diçe. Demê berî nihan de, rasta Filistin lihevda û hevpeyvîn behtir ser bingehe kongrên navnetewan, ku USA û yekitiya Sovyet ji amade bûn, dîderivand. Lê piştî valakirina Beyrûtê, hat dîtin ku rastbîrast bi USA re danûsîtandin dike. Me ev karûbar pir zelal dît. Ji ber vê yekê rewşa jin dike, bo PLFP nebû surprîz. Lê ger hûn vê pîrsê ji min dikin; we birdikir ku ev jî rê derketin, wê meha 12an de pêk bê? Ez dixwazim bêjim; Na!

Emê çawa li hemberê jî vê rê derketinê rabin? Ez dixwazim vê pîrsê wusa bersiv bikin; Berî hertiştî hêzên Filistin, divên li ser vê gavê baweriyên xwe eşkere bikin. Têdayîya wî gavi çîye? Hinker; em dikarin bêjin, ev gav berdewama Camp-David e, an jî Yasser Arafat dixwaze

şoreşa Filistin bikşîne Camp-David; mafê me heye em vê yekê bêjin? Ger wusa be, divê em ser tiştên bikaribin bihevrebikin, lihevda nek çak bikin. Me bi navê PLFP, bendên pîrsê yê yekemîn û duwemîn bersiv da. Ev gav taliya dûrkirina Arafat ji PLO daxuyan dike. Lew Arafat, vêca nûneriya xeta rêzanî a PLO nake.

Tiştên ji vir û pêde bînin bersiv dan ev in; çî bikin? Çawa emê bighijîne vir? Gora bawerîya me, divê şer bi Yasser Arafat re, bê sinor kirin. Lew Navenda Komîta Fetih jî, diyar kir ku, berpîrsiyarê vê serdanê tenê Arafat e. Em naxwazin şer pêş bikeve, em bi Fetih re bihevrebikin. Şerê me bi kesbûna Arafat û kesên wî, bi gavên wî avêtinê qebûl dikirin re ye.

Di navê Filistin de, divê berî her tiştî, ser vê xetê lihevda nek pêk bê. Ji vir û pêde, ser vê dîtinê, bi me re yekîtiya lewa dikên, sendîqa hêz û kom divên xwe lihevbiçîvînin. Pêşî divê Yasser Arafat ji serekîtiya rêxistinê bê dûrxistin, dawî divê enîkî fireh bê sazîkirin, lew dema vê karê hatiye.

Dema şerê Beyrûtê em bihevrebûn, min dît ku Arafat ji li ser -nav me serekên Filistinê de, girêdanên tekoşinê yê rast hene. Lê, ji doza netewî ez tu caran bidestî nadim. Gava jî rê derketinê hebe, ezê hemû him û hêza xwe birêbixim. Ger, em baş bizanibin, emê çawa gelê Filistin bajon, emê bikaribin van jî rê derketinan ji bîkeys bikin. Navenda Komîta Fetih, gavên Arafat nederivand. Ev rewş şanî me dide ku, ev bawerîya me pir raste.

PÎRS- *Me berî çend kêlikan, sehkir ku we ditinek bi Haddam re (wezîrê derveyî yê Sûrî) pêkanî. Dikarin derheqê vê hevpeyvînê me ronî bikin, ser çê hûn peyvîn?*

George HABBAŞ- Me ser sê pîrsgirêkan danûsîtandin kir.

1- Emperyalîzm êrîşî Sûrî, şoreşa Filistin û tevgera welatperwer a Libnanê dike. Me, bo dij êrîşan, bo lihember rabûnê, baweriyên xwe diyar kir. Bona şîrûtên bîngeh û alikariya li hemberhev sekinin.

2- Pîrsgirêka Filistin bû; em bawerîn divê ittîfaqa me bi Sûrî re zexm be. Ji ber vê yekê bona pîrsgirêka Filistin û rêya helkirina wê, danûsîtandin pêwîst e.

3- Ser hebûna me li Sûrî bû; bona vê yekê pir pîrsgirêkan pratîk yê ku timdori bînin hûrkolandin û danûsîtandin hene.

★ ★ ★

QONAXA DAWÎYA XWESÎPARÎYÊ !

ROJHELATA NAVÎN di van salên dawî de dû vegirtinên mezin, jîngar kir. Hezîran 1982an de sîyonîstên Îsrail êrişî Libnanê, Gulan 1983an de cunta faşîsta Tirk êrişî Kurdistanê Başûr kirin. Îsraila sîyonîst, bi alîkariya emperyalîzma USA û bi piştgirtî paşverûkatiya xweyîcîh ev vegirtin pêşve xist. Dixwest, tevgera berxwedana Filistin û sereketiya wê PLO li Libnanê tune bike. Û pêre girêdayî, hêzên din yê şoreşger ku li vir cih girtibûn, biperçiqêne; û Libnan biqulibêne cîheki serxwe bo emperyalîzmê, daku ji vir sext li ser bike û bidestxistinê pêkbêne Sûrî ji hêla emperyalîzma USA plan bûyî, bi şîrîkatî û hevrexebatdariya Seddam û Evren hati ajotî, bi destê cunta faşîsta Tirk pêk hati tevgera êrişê ser Kurdistanê Başûr, xwede armanca hilweşandina Tevgera Rizgariya Netewa Kurdistan a bilind dibe û hêza pêşenga wê PKK, hildigirt, daku sazûmana Seddam a alozî û tengasiyê de ye xilas bikin û navçê de bi bingeha weşandina tevgera şoreşger, jîna paşverûtiya xweyîcîh dirêjtir bikin. Vegirtina tevgera yekemîn ji armancên dixwest hin gav pêşve bir, lê ya duwemîn bi fîyasqo dawî pêhat.

Ev tevgerên vegirtinan li heremê dubendî, beramberî û şerên heyîn, behtir diwar kirin, hilmên xwe nav refên tevgerên rizgariyên netewî de peyda kirin. Ger zelaltir bê gotin, ev tevgerên vegirtinan di heremên pêk hatin de, ji pêşî de jîn dikirên hin hêz û xetên rêzani eşkeretir kirin, dubendî û şerên di nav wan de heyîn gelek diwartir pêşçav bûn, ji bona wan bingeheên taybetî derketin ronahiyê. Pêwist, pêşketinên dawî nav refa tevgera rizgariya netewa Filistin, ji bo wê rewşê re, minaka daxûyane.

Piştî PLO, Libnan berda, ev dubendî, çuqas biçe diwartir bû û qulibî şereke çekdar. Bi derxistina Yaser Arafat ji Tripolî giha taxekî pêşewar. Têdayiya vê tevgera bixwin, ku ji hêla alema giştî jî, ji nêzik dihat şopîn û nav refên koma mezintirîn ya PLO, nav refên El Fetih derketî, çibû? Ev tekoşîn, gelo tenê nav refê yek rêxistinê jî ber baweriya ditina dû biran, dubendîkî bê bingehe diani zman? An jî, ev lihevda ji bo pakkirina pergala û pirs-girêka netewa Filistin, dû baweriyên jî hevdûr bûn; dubendiyên lihev nayîn bûn, an jî taliyên van dubendiyan bûn? Bona mirov bikaribe, bersivên rast bo van pirsan bide, girînge mirov serek bide dirokê, taybetî ser bide, piştî ku PLO Beyrût berda, nav refên vê rêxistinê, daku mirov çêtir bikaribe çav li pêşketin û bûyeran bigerîne. Ev hewce ye.

Dawîya dorvegirtina 75 roj domkiri de, Beyrût berdayê PLO, 14 Sebata 1983an civîneke xwe a pêwîst ku hefteki dom kir, pêkanî. Bi vê dixwest, tewra tevgera Filistin a ji vir û pêde pêşkêş bike û hatin û atiya tevgerê diyar bike. Civîn bin sereketiya Civîna Netewa Filistin (CNF) pêkhat. Hêzên emperyalîst, sîyonîst û paşverûkên xweyîcîh dest bi propoxendên mina: "Berxwedana Filistin û PLO belav bûn", "PLO carek din nikare xwe lihevbievîne" kirin. Nexasim civîna CNF'ê de, nav dû biran tekoşîneke çetin xwe daxûyan kir.


Ji ber êrişên Îsrail ser Libnanê û derbên li PLO hatin xistin bizdehî û tîrsa giran girtê û wan bo "rastîya" xwe şanî kirê, birê reformîstê xwesîpar; berî nuha ser tevgera netewa Filistin bikaranî dihat xwestin, planê Reagan, bi diwarî parast, û Konfederasyona Urdun-Filistin bo helkirina pîrs-girêkê, pêşewar kir. Eşkere ye, Konfederasyona Urdun-Filistin komplok ji rê ye ku, şoreşa Filistin dawî bibe û nav lepên hêzên emperyalîst de, bibe leyistokwarek. Bili her azîne û serdayînên birên reformîstên xwesîpar û alîkariya paşverûkatiya Ereban bo wan re, hêzên berxwedanê muxalefeteke diwar birêvebirin û tali de, ev pêşneyar hat redkirin. Bîrara domkirina şerê çekdarî bo Filistîneke serbixwe hat dayîn. Ev şewîr taliya vegirtina Libnanê bo PLO, gavekî hati avêtina pîr pêwîst dihat derivandin. Nemaza, bili ev bîrîyar derketibû pêş, USA û paşverûkatiya Ereban, dev ji planên xwe ser tune kirin û xwe bidestxistina tevgera rizgariya Filistin, bernedan. Bi destê bikaranîkarên xwe nav refên PLO, dixwestin pêşketina şoreşa Filistin ser bingehe şerê çekdarî bo Filistîneke serbixwe bidin rawestandî. Şûna vê rêzaniyê, girêdanên diplomatîk pêşneyar dikiran. Lewma ev hêzên noker, destpêkirin ku, nav refên PLO de bibin muxalefeteke serhişk. Berpîrsiyarê birên xwesîpar, bona vê yekê dest bi axafên bi sazûmanên paşverûkên heremê kir, ango ditinên diplomatîk birêxist. Birên berxwedanê, dest bi çareyên zexmkirina şoreşa Filistin ser bingeheên himdar kirin. Serde jî, xwe kirin nav xebateke berûçav, daku yekitiya PLO bê parastin. Bona vê ser rikên eniya rêzani êrişk ser xwesîparan destpêkandin. Di vê navberê de tewrên berpîrsiyarên herdu hêzan berûpêştir bû, şerê dubendiya nav wan de behtir xwe germ û kûr kir. Ev rewş nedikare bê rawestîn, lew hewce bû.

Ev pêşketinên nav refên tevgera rizgariya netewa Filistin afirîn, ne nedihatî bendrawestandî. Pîr zelal berçave ku rûdan û bûyerên zabûn, ji taybetiyên çîna berpîrsiyariya û rêberiya tevgerê û jiber ev çîn, li hemberê êrişên emperyalîzmê ket nava tengasiyan, diyar bûn. Lew kaniya bêçaretîya vê sereketiye xwe daxûyan kirin. Dirokê û rojên me de, bi gelemperî li Rojhelata Navin, taybetî nav refên tevgera rizgariya netewa Filistin, wusa an hola tewrek leyistê burjuvaziya-pîçûk, dema êrişên emperyalîzmê zêde dibin, dikeve nav alozî tengasî, kêmasî û bêçaretîyan de. Herweha ev çîn xwe de seranser xwesîparî hildigre, bila mirov şaş neke. Rewşên wusa de ev çîn, xwe behtir û eşkere, çibûna xwe re berçav, zanadare dike. Berî ev bûyer nav refên PLO derketibûn û gihiştibûn wê, evên jêrîn nivistibû: "heta 1980an li hember êrişên Îsrail pêşajotiya berxwedanê dikê hêz, reformîste û bi taybetîya şoreşgerî hêzêke burjuvaziya pîçûk e, ku muxalefetiye dajo. Mirov yarmetiya burjuvaziya pîçûk a xwesîpar û ta dawî nikare berxwedan bajo berçav bêne, dema emperyalîzm dest bi êrişên xwe bike, wê meyla xwesîparî bilez pêşbikeve û

dawiya vêde wê binkeftin û derbên giran pêkbên. Bona mirov vê ji niha de bibîne, ne girînge mirov sêrbaz be." (Rojhelata Navin ber enîşka şereke heremîye? Rûpel 29). Mîna me hemûwan ji nêzik şopand, pêşketin seranser mîna bawerîya me derket û gotinên me serrast kir.

Hêzên emperyalist yê ku bi navê "hêzên aşiti" li Libnanê cihbûne, ji alikî êrişên xwe diji hêzên pêşveçûyî-şoreşger yê Libnan û Filistinê, û diji sazûmana Sûri zêde dikin, ji aliyê din meyla reformîst a burjûvaziya-pîçûk nav rêzên PLO, gavên xwe yê ser rêya ixanet û bêbextiyê lezin dike. Li hemberê van bûyeran meyla berxwedanê nav rêzên Tevgera Netewa Filistin ji tewra xwe zelaltir dike. Ji hêlêkî di nav komên berpirsiyarên birên xwesipar, avayîkî singê xwe de berxwedanê dozê dike, dipijiqe, ji hêla din: di nav refên PLO ji duh û îro berxwedan dihilmandên koman, li hemberê xwesipariyê bi taybetî ser bîngeha rêzanî tewreke êşkere dahildan dikin. Kin bê gotin, nav refên tevgera netewa Filistin dî hêlwest êşkere bûne. Dubendiyên nav wanan dijwar bûne, sinor xwe zeel daxûyan kirine û taliya wan da, lihevixistinên çekdari afirîne. Balam di nav refên PLO çuqas diçe sinorên xwe êşkere dikên, birên berxwedanê û xwesipariyê, tekoşinên xwe bi girêdanên xwe yê derveyî û îtîfaqên xwe re, bihevî, bi azinanî didin. Hêza xwesipar, girêdana xwe bi emperyalîzmê, paşverûkatîya xweyicîh û taybetî bi monarşiyên Ereban re zexm dike. Bi alikariya ji vanan digre, dixwaze xwe ser tevgera netewa Filistin serdest ke; hêza berxwedanê jî, bi sistema sosyalîst, hêzên şoreşger û pêşveçûyî yê heremê re, nav alikarî û piştgirtinê ye; dixwaze vê serdestiya xwesiparan bişkêne. Ji xwe, ev tekoşina nav refên PLO de bilind bû, birek ji dirêjahiya şerê navbera hêzên emperyalist û hêzên sosyalîst ku di heremê de bo serdestiyê dajon, ne, yê ku xwe nav tevgera netewa Filistin xwe şani dide ye. Pêvajoya rojgeranî xopanê de, çuqas şerê dinavberê herdû eniyan xwe bilezîne, hewqas jî di nav refên tevgerên rizgariyê netewî yê heremê de, şer wê derkevin û têgihîştî bibin. Herweha gora çewta vî rewşî, çuqas heremê de, navbera hêzên nav tevgerên netewî birên xwesipar û berxwedanê xwe ji hev cuda bikin, hewqas jî ser Rojhelata Navin tekoşinê dimeşênin navberê hêzên emperyalist û sosyalîst, wê dubendî xwe diwartir bike. Dikare bê gotin, gelemperî nav tevgerên rizgariyê netewî yê heremê, taybetî nav refên tevgera netewa Filistin, ev bûyerên talî, nikarin bisinorê xwe yê teng de bî berdestkirin, û mirov nikare ramanên van pêşketinan û rûdanan tenê bi şerên çekdari girêbide, tişteki wusa pir şase. Ev daxûyaniyên talî di nav refên tevgera netewa Filistin, û heremê, pêwîst bi vegirtina Libnanê derketên pêşketinên rêzanî, girêdana xwe a rast, di nav refên PLO yê birên berxwedan û xwesipariyê yê ku têkili û hevberdiyên wan yê derveyî sazîne heye. Ev şerên bi rewşekî xwinrijandin hatin ajotin, ne sedemîn, Taliyên derketinên û daxûyaniyên gelemperî ne. Bi vegirtina Libnanê ji aliyê Îsrail, emperyalîzm û paşverûkatîya xweyicîh rabû serpê. Ji hêlêkê xwest tevgera netewa Filistin qir bike, ji hêla din xwest hêzên heyîn û hêj serpêne, bîdest bînin. Tiştê çekirin dihat xwestin, ev bû ku, tekoşina netewa Filistin a ku bi zora leşkerî dawî pê nedihat, di plana rêzanî dawî pêbinin. Lewra emperia-

lîzm û paşverûkatîya xweyicîh her babet alikarî bo hêzên xwesiparî diparastin, pêşkêş kirin. Her babet alikariyên wari û giyanî dan wan. Xwedî li xwesiparan derketin. Ev hêzên xwedî li berpirsiyarên birên xwesipar derdikevin, ji kesbûna wan a êşkere, mirov dikare baş bibîne, çî leyistokên malkambax û bizdehîn tî berûpêş kirin, çî dixwazin bi PLO bikin.



Herdû destebirak gihîştin hev... (Arafat û Qral Huseyin)

Hemû hêzên paşverû yê cihanê û sazûmanên heremê yê monarşîst û faşîst, dema ajotiya şer, êşkere hêza xwesipar re alikarî pêkanin û heta ji wan dihat qêrin kirin ku ev hêz tenê "berpirsiyarî dadî" a PLO ye. Pir hesan tê zanin ku ev ne bîsedem e. Ev lerza û recfa hêza xwesipar û hêzên piştgirtên wê yê derveyî, daxûyan dikir ku, berxwedan di nav refên tekoşina rizgariya Filistin de, çuqas diçe zexm û bilind dibe. Hêzên berxwedanê, dixwestin tevgera berxwedana Filistin ser rîknên rastûpak pêşbixin. Xebatên xwe bo girêdan û îtîfaqên derveyî dadimezrandin û pêre ji livbaz û bizavên xwe zêde dikiran. Lê, hêza xwesipar û bêbext, bilî her babet alikariyên paşverûkên heremê û cihanê, dawîya şerên çekdari yê pir-dirêj bûyin de, ji navça Libnanê, ji ra hat qutkirin û avêtin. Piştî ji Libnanê derketin, pir zelal berçav bû ku ev hêz ji kîjan hêzên paşverû û birên dij-şoreşgerî xwe xwedî dikin. Sazûmana Misrê, ku gêtîya tevgera netewa Ereban, mîna xençer di singê de be, xwe diyar kirîye, bilî ev hêz ji hêla Ereben paşverû û birên radiqal birabirin bûye, tîne me ye, berpirsiyarê xwesipariyê berî her gavê girêdan bi vê sazûmanê re pêk anî. Ji tişteki wusa netirsîya. Mîna tê biran, sazûmana Misrê, dema Enver Sedat de, ji ber lihevhatina Camp-David bi Îsrail re, ket nav herîya bêbextiyê û ev sazûman ji hêla "Enîya Red'ê" a paşverûyên Ereban, dijmîn hat nasîn û telalî kirin. Sazûmana Misrê a noker çepereke pir gewre, li pêşiya bizav pêşketinên tevgerên pêşveçûyî-şoreşger a netewa Ereba ne. Ev sazûmana Misrê a hundurî, di heremê de yek noker û lingê emperyalîzma USA a bi him e. Bi sazûmana Misrê re, girêdan çakkirin, wê naskirin, bi gelemberî li dij tevgera netewa Ereban, bi taybetî li dij tekoşina rizgariya Filistin, sûç û gunahbariya pir mezin e.

Kaniya derketina bûyereke wusa ji dilê reformîzma burjûvaziya pîçûke. Mîna me berî nuha ji got, birê xwesipar a burjûvaziya pîçûk nikare li hemberê êrişên zêde

bibin de, berxwe dide. Qonaxa dawî a ew deynê, bêbextî û îxanete. Balam ev rewş bingeha baş û zexm ji bo pêşketina Tevergera Netewa Filistin dadimezrine. Birên xwesipar ku ta niha wusa an halo dikarin xwe veşêrin, îro tazi li berçave, û ew bixwe xwe dane dest. Pêşketinên bi bingeh, yên ji vir û pêde girêdayê gavên pîvayî yên hêzên berxwedanê ne. Hêzên berxwedanê, divên ji pratîka diroka şoreşa Filistin hîndarî û ceribanin bistênin. Li ser vê rastî rêxistinên xwe sazî bikin, û stratejiya şerê gel bi babeteke rast bilind bikin. Bona vî şerî, divên girêdan û ittifaqên bingehî, demdirêj û bê alozi bi derve û hundurî bikarbenin. Dema mirov ji navça Libnanê qise dike, di serî de hêzên netewî yên berxwedana Filistin, hêzên pêşverû û radiqal yên alema Erebî, divên li hemberê êrişên çekdari û yên din, yên emperyalîzmê rolên xwe û tevgerên xwe baş bileyzin. Ger vê bikin, û pêre gavên pêşvetir bavêjin, wê bikaribin dijarîya xwe biparêzin û wîkari-bîn ta sinorekê pîvayî ji be, emperyalîzmê rawestênin.

Li Rojhelata Navîn, herçemek din, ku tede ditinên berxwedan û xwesipariyê bi tekoşinên xwe şerek bêaman dajon, Kurdistanê. Îro Kurdistan ji heremê ji nêzik dihilmin. Ji ber vê yekê, pêşketinên baş an nebaş nav refên Tevergera Rizgarîya Kurdistan, qulibandina statûqoya heremê bo xusarên emperyalîzmê, endamekî pîr pêwîst e. Ji ber zanîna vê rastîyê, di serî de emperyalîzm, hêzên paşverûkên xopanê, ji diroka derbasbûyî vir de, xwe dihelîfênin, daku li navça Kurdistanê hêza berxwedanê neafîre, bi hezaran qomplo birêdixin. Ji hêlekê vegirtinên seravetînen leşkerî, rêzanî û aborî têgihîştî û berûpêş dikin, daku bikaribin Kurdistan bikin mêtîngeha xwe a serpê, navçên berxwedanê bidin erdê, ji hêla din taliya wan de xwesiparî serdest bikin. Tim bi vana dijmîn pîr qonaxên hewce bidestê xwe aniyê ji. Balam îro, bi taybetî li Kurdistanê Bakûra-Rojava bin pêşenga PKK hatigihîştî û bingeh bûyî tevergera berxwedanê û hilma vê tevgerê ser beşên din yên Kurdistanê û ser hêzên netewî li van beşan emperyalîzm ditirsê. Emperyalîzm û paşverûkên heremê bi zor û sextê birê, dixin bikartênin pêre, nav refên TRNK (Tevergera Rizgarîya Netewa Kurdistan) xwesipariyê xwedî dikin û dixwazin vîna serdest bikin. Lewma di nav refên Tevergera Netewa Kurdistan, bi taybetî demên talî de pêkhatina pêşketinan pîr bal kişanddar in.

Meha Gulan 1983an de, tevergera vegirtina ser Kurdistan-Başûr demeke wûsa de birêket ku hêzên Kurd yên vê beşê li hemberhev şerê çekdari dimeşandin: şerên hundurî bilind bibûn û pêre ji wê gavê berpirsiyarê xeta berxwedanê PKK, merhelê de hilma xwe ser hêzên netewî li van beşan pêkdiani. Di rewşeke wûsa de, pêkanîna vê êrişa vegirtinê, nikare ji xwe bê derivandin. ango ji peyva dem û mêtîya hati hilbijartî nabe lihevraştati-nek bê qîm kirin. Emperyalîzm, paşverûkatîya heremê û diktatoriye Seddam-Evren, ev êriş pêkanin, daku tevergera ji ber lihevixistinên heyîn li vir bêkeys ketibûn tune-bike. Ji hêla din dixwestin tahlûka mezin bo hatina wan, TRNK û di nav refên wê hêza berxwedanê biperçiqênin. Bi derbên giran bêhim bikin û li hember xeta berxwedanê, daxwaza himkirina xeta xwesipariyê dilê xwede vedîştartin. Ji ber ku ger nav refên Tevergera Netewa Kurd de birên berxwedanê xwe serdest bikin, wê diktator, emperyalîzm û paşverûkên xweyicîh leqayî potensiyeleke pîr mezin a şoreşger bibin û vîna baş ji dinasin.

Gulan 1983an de li Kurdistanê Başûr pêkhatî tevergera vegirtinê bi fîasko dawî pêhat. Derbe girtina xeta berxwedanê li alîkî, ger nav refên Tevergera Netewa Kurd ger ji nav refên hêzên pêşveçûyî û şoreşgerên heremê behtir bihim bû. Liser vê, emperyalîzm û paşverûtiya xweyicîh, dixwazin neha xeta xwesiparî serdest bikin û bona vê yekê xebatên xwe dilezînin. Gelemperî gîşa ya Kurdistan de, taybetî li her kêrîyê, jin dikên hêzên xwesiparên burjuvên-pîçûk re, hin hêzên tarî alîkarî didin, wan dikşênin nav baweriyên paşverû. Burjuva-pîçûk a xwesipar a Kurdistanê Başûra-Rojava bi pêwîstî xwe li ser sosyal-demokrasiya Avrûpa, dihilme. Ji hêlekê êrişên xwe li hemberê xeta berxwedanê zêdetir dikin, ji hêladî, pêre pêre "Kurdistanê otonom" dixwazin pêk bînin, kîjan her birdoz ser vê daxwazê rûş û bextreşe. Mîna vê li Kurdistanê Başûr jî, birek ji burjuvaziya-pîçûk a xwesipar bi paşverûtiya heremê û bi taybetî diktatoriya Seddam re hati girêdayî, di nav karên dijar bo "Kurdistanê otonom" dixebitin. Xwiya ye, ev pêşketinên hana, bi gelemperî nav refên TRNK de, bi taybetî li her beşên Kurdistanê zexmbûn û dijarbûna xeta berxwedanê tene zman. Ji aliyê din şanî dike ku dijmîn û neyar nav tirs û xofa dijar dene. Hêzên neyar, hêzên xwesipar dikşênin nav livbazên wûsa, daku bibin çeperek li pêşîya xêza berxwedanê, bikaribin serdestiya xeta berxwedanê ser tevergera şoreşa Kurdistan biseknênin. Balam ev, şanî me dide ku nav refên TRNK de, hêzên berxwedanê timdorî pêşdikevin, him distênin û hatigihîştî dibin. Daxûyane mîna li hemû tevgerên rizgarîyên netewî, TRNK de ji pêşketin, bi bingeha dubendî û şerên van herdu xetan wê sadir bibe, û girînge bibe jî. Berxwedan û xwesiparî bihev re bi şer û tekoşîna di-hev pêşdikevin û xwe bingeh dikin, daku bîlez xwe serkeftin bikin. A talî tayîn bike, eve ku kîjan hêz amadekariya xwe çetir bi plan û gavên pîvandi avêtibe ye. Lê, em dixwazin vîna salox bidin; îro gelemperî li Kurdistanê, taybetî Kurdistanê Bakûra-Rojava şert û şirûtên, ûşt û rewşên hundurî û derveyî bo pêşxistina berxwedanê hatigihîştinê. Tevergera berxwedanê, bi gavên pîvandi bîn avêtin, bi girêdanî û ittifaqên, ango hevalbendîyên sazîbike de, paşî taliyan bikaribe ji xwe re biafirîne, ser vê rîknê, dikare hêlwesta xwesiparî pîr hêsan pişange (teşîr) û birabirîn (tecrî) bike. Nemaze, taxa em tede ne, bi kîjan rûçîkî xwesiparî xwe sipartibe, bira be, xwe dide dest, nikare xwe ji vê rewşê rizgar bike. Ta rojên em tede ne, xwesiparî, ger li heremê, ger ji li Kurdistanê bilî afetên giran û malkambax neafîrandiye. Îro reformistî û xwesiparî ji hêla gelan pîr baş tê nasîn. Servê jî, îro gelê Kurdistan bi tewra xwe îspat dike ku, hevalbendê berxwedan û hêza berxwedanê ye.

Kin gotina talî; emperyalîzma USA, bi destê paşverûkatîya heremê, li hemberê gelên Rojhelata Navîn êrişên bi plan û pêşewar, yên ku zêde dibin, pêk tene. Bi vê re girêdayî di nav refên tevgerên rizgarîyên netewan yên heremê de hêzên berxwedan û xwesipariyê, li di-hev tekoşin diwartir dikin. Emperyalîzma, bi piştigirtin û alîkarîya paşverûkatîya heremê, dixwazê ji hêlekê tekoşinên gelan bi xwînrijandin bifetsîne. Ji hêla din, di nav refên tevgerên netewî, heremê de, xeta berxwedanî a ku nikarê bixeniqene, li hemberê ditîna berxwedanê, ditîna xwesiparî derdixêncê pêş, alîkarî dide wan û wan xwedî

(Dûmahîk di rûpelê 38an de ye)

Nama Partizaneki

ŞERÊ NAVBERA ÎRAN Û ÎRAQ Û TEWRA TÎRKÎYÊ



Şerê şevgera didome...

ÊLÛN 1980an de, bi êrişê Îraqê ya ser Îranê ev şer destpêkir û ji ber mafên çinên karbidestên herdu welatan û emperyalîzmê –sinora pêkanîna daxwazên wan de ma– û heyani rojên em tede, didome. Ev şer, hilma mafên çinên karbidestên herdu welatan û berdewama politîka emperyalîzmê a heremê ye.

Emperyalîzm, dema aloziya xwe a sêwemîn de, Rojhelata Navîn de, li hin babet cihên şer de, hin hêz li hem-ber hev germkiriye û şer xwe daxû-yani kirine; ev şerê hana ji rast bi rast keda vê rêzaniyê ye.

Ji va navçên şer yek ji, şerê navbera Îran û Îraqê ye, ku behtiri sê salane didome. Ev şer ji hêla burjuvaziya Îraqê hat destpêkirin, ji ber ku 1975an pêde yekdestî kemilîbû û çin xwe ji hev cuda dikiran, daku daxwazên emperyalîzmê li Îran û delava Basra yê bicîh bîn. Lê taliyên derketin, ev daxwaz bicîh neani û di vê gavêde hêza şer derxistibû, kete nav alozeke bêçarewar.

Ev şerê bi zixtkirina emperyalîzmê ji hêla paşverûtiya Îraqê destpêkiribû, di xwede pir alî armanc vedişêre. Ev rastî, şerê gelek dirêjbû de xwe eşkere

diyartir kir. Em dikarin van armancan kurt wusa binivîsin;

1- 1975an Îran, alîkari bo tekoşîna Kurdistanê Başûr dikir. Bona ev alîkari bê birin, Îraq birek ji erdê xwe dabû Îranê. Bi vî şerê, Îraq dixwest ev erd carekî din ji Îranê bistêne.

2- Ev erd delava Basrayê dizivirine. Îraq dixwest, bi rêya vê erdê, serdestiya xwe ser delavê (korfez) him bike.

3- Îraq dixwest, karbidestiya Îranê ku hêj xwe bingeş nekiribû, nav şereka wusa bixşîne û melîsî bike, dakû piştgirtên şah yê paşverû herweha sazûman bikin bin destê xwe.

4- Îraq dixwest, bala alema giştî hundur û derve bixşîne ser vî şerê, daku dijberiya şoreşgera demokratîk a Îraq û dijberiya Kurdistan a netewî, hêsantir bîn perçiqandin û têkçûn.

Mîna tê têgihiştin, şer vanan hemûyan berçav dikir û ji ber mafên şirîki yê burjuvaziya Îraqê û emperyalîzmê destpêkir.

Sazûmana Îraqê Êlûn 1980an de yekderbê êrişî Xuzîstanê kir. Li vir kaniyên petrolê yê pêwîst hene. Bi vî teqtiqa yekderpê êrişê, Îraq kari ji ber hima xwe a teknik, serkeftin bidest

bêne. Di serî de Îraq, bajarên Abadan, Hûremşehr, Ahwaz û Dezful zefîkir. Bi vî diramand, serdestiya Îranê li ser delava Basrayê bixşîne û kaniyên petrolê yê stratejîk bidest bêne. Pêre ji aboriya Îranê dahilweşîne. Ev navçe xeta bingeşa êrişê bû. Xeta duwemîn a êrişê, navça ji Mihran ta Qesr a Şerîn bû. Ev xeta duwemîn teqtiqî bû, dihat xwestin, ger êrişekê Îranê li ser bajarê Bexdadê pêk bibe, bête rawestandin. Navça bingeş a êrişê, xeta ji Dezful ta delava Basrayê bû.

Îraq serdestiya xwe di şer de, ji ber imkanên teknik, nêzîkî salek û niv domand. Piştî Îran bi sê êrişên bingeşin, destpêka 1982an ta nivê salê, hêzên Îraqê ji erdê xwe derxist û gihîşt te taxa serbiserî. Tali Îran însîatîf kire dest xwe, û demekî pir kin de, dest bi êrişên dijwar kir. Îran şer domand. Sedemên bingeşin yê çima Îran êrişên xwe di vî xetê de, pêkdiani evbûn; li vir gelê şîî diji. Îran dixwest alîkariya wanan bistêne û girêdana Îraqê bi delava Basrayê bibere. Ser delavê qontrola xwe pêk bêne û bajarên bi navûdengê şîiyan, mîna Necef û Kerbela Bidest bixe.

Lê ev plan, ji ber navçe avûherî bû,

çekên teknîkî kêmbûn û teqtiqên zana çap nebûn, negihîste ramanê. Bili şereke dijwar, westdar û pejrandinbar dihat meşandin, ev daxwaz pêk nehat.

Dema Îran zehmetiyên şer di vê navçê de dit, şer kişand hêj bakûrtir, navbera Mendellî û Zarbatîyê. Ev navça şer, ji sinorên Îranê yê nêziktirên bajarên Bexdayê bû. Ji ber vê yekê, Îraq hêzên xwe yê pêwîst û girîng li vir kire kozên şer de. Xeteke parêstinê a zexm li hemberê Îranê li vir sazî kir. Îran, bi yarmendiya bilind û baweriyê û bi gelek bûna şênîya xwe, ev şer dajot. Lê, ji ber paşvetiya teqtiqî, nekarî xeta parêstina hêzên Îraqê belav bike.

Dema Îran li vir ji taliyên raman dikir, bidest nekarî bêne, êrişên xwe kişand hêj bakûrtir. Ango kişand ser erdên Kurdistan. Di vê navça şer a sêwemîn de, tehditkirina Bexdayê ne pir hesan bû. Ji ber ku ev enîşk, ji sinorên heyîn a dûrtir ji Bexdayê bû. Nemaze hin birdozên tîn zanîn, yê rêzanî û leşkerî hebûn. Ji ber vana Îran êrişên xwe kişandibû Kurdistanê. Ev armanc kin evîn:

1- Dema bi êrişên xwe li ser Îraq serneket, xwest ji pêwîstiya rêase û erdçiya Kurdistanê berjewendi (feyde) bigre û vi şerî taxa hêdî hêdî pejrandinê ne de, bidomîne.

2- Dixwest êrişên xwe ji ser Hacı Umran berdewam bike, lew kaniyên petrolê yê dewlemend li vir hene. Bajarên petrolê yê Kurdistanê Başûr mîna Mûsil û Kerkûk, ku pir bi bingehî di aboriya Îraqê de cih digrin, zefbike, dakû aboriya Îraqê bikeve nav rewşeke xedar.

3- Dixwest li erd û çiyayên Kurdistanê ku rê nadin de, serdestiya teknîkî a Îraqê ta sinorekî teng ji be, bê bingeh û bê kar bike.

4- Hêzeke mîna PDK-Îraq ku girînge û navçê de xweyî cihe, bikşêne nav şer û sazûmana Îraqê ji hundur bireilêne, û tehdît bike.

5- Dixwest navça Hacı Umran bin destê xwe bike, daku girêdana hêzên Qasimlo –ku bi Saddam re pêkanibû–, bi Bexdayê re bibre û bi pêvajoyê bizav û livbazên li Kurdistanê Rojhelat bi dijarî zêde bike.

6- Li Hacı Umranê Kurdên Soranî xweyicihin. Hêzên Telebanî li vir xwe rêxistin kirine. Îran dixwest hêzên PDK-Îraq û Telebanî li hemberhev bo şerekê zixt bike, daku herdu

hêz ji bîr melisandin û bê him bikevim. Bi vê rêyê dijberiya netewî a Kurdistanê Başûr, bike nav bêcaretiyên kûr.

Sedemên girîng yê ji ber çê şer kişandin Kurdistanê, bi bingehî evên jorin bûn.

Şerê ji hêla Îraqê destpêkiribû, Îraq anî enîşka hilweşandinê. Û li hember vê, Îran ev şer ji xwere derence bikartêne, dakû sazûmana xwe hundurî de çetir serdest û xwedî bingeh bike. Îraq nekarî ev şer ji xwere, bo tîkçûna dijberiya hundurî, bike hacet û birê bixe. Di vê niqte de tu serkeftin bicîh nehat. Aloze û weşa aborî û civakî a ku tê jingar, dijberên civakî hêj him û zexmtir kirîye.

Sazûmana Îranê, ku navça şer de inîstîf dest xwe de girtiye, pir çareyên girîng li vê navçê de, pêkanî. Karî bala alema giştî bikşêne şer û hêzên xwe rêxistî kiribûn yê girîng, mîna Mucahidên Gel, TUDEH û Fedaiyên Gel, ji bin bêhim û bêkeys kir. Ev taliyên bo dijberiya Îranê derketin, sedemên wan berî her tiştî, xeletî û kêmasiya van hêza ne. Lê sazûman baş zanî, wê çawa ji xeletî û kêmasiya

de digre. Ji hêlekê êrişên xwe li hemberê Îraqê taxa teqtiq de digre, ji hêla dî li benda zexmbûna hêza Hizbil Dawa ku ji dijberiya Îraqê û şîî ne, dimîne, wana re alikarî sadir dike. Hizbil Dawa, bir rewşa xwe a rojgeran, bo sazûman bidest bixe, bê teknîk û bêhîme.

Şer behtirî sê salane dom dike. Niv milyon mirov ta niha hatin kuştin. Nêzîkî milyonek mirov birîndar ketin. Û sazûmana Îran baş, ji vê şerê, bo doza xwe taliyan derdixe. Îran taliybûna şer naxwaze. Ger şer dawî bibê, wê Îran li hemberê dijberiya hundurî re, rû bi rû bê. Ev rewş, wê jêre pir zehmetiyên girîng, ji şerê hemberê Îraqê damezrine.

Sazûmana Îraq ku bi zixtkirina emperyalîzmê êrişî Îran kir, dawî kete rewşa xwe parêstinê û giha enîşka hilweşandinê. Aborî bi taxekî bilind pejiyîye û nikare vîca şer xwedî bike. Artêşê (ordî) wê ji aliyê moral ve pir ketiye, û hatiye ber rewşa weşandinê. Dijberî nehat perçiqandin, û behtir hêlwestî zexm bû, ji ber girêdana paşverû, Îraq navnetewan pêşîya alema giştîya cihanê ji birabirîn (teşhîr) bû.



van hêzan berjewendi bikşêne. Îran ev şer, bo perçiqandina dijberiyê, bi rewşa derencekî, bo xwe pêkanî.

Îro, Îran ev şer di taxa pejrandinê

ye. Sazûmana faşîsta Tirk, behtir ji hewce, tîkiliya xwe bi vi şerî re pêk tîne. Benda pêsketinan amade ye.

(Dûmahik di rûpelê 33an de ye)

DÎROKA GELÊ ME BÎ BÎNGEH, KANÎYA ÇANDA WÊ DEWLEMEND E

Birayê hêja, bi vê namê nivîseka nûh pêşkêşî we dikim. Mina tê zanîn derheq gelê Kurda de mina rûreşê Lord Curzon kesê bêhim dibên ku "ev gel bê dirok e. Û bê wêje ye". Zevftkarê burjuvayê Tirk mina dara jiyanê dest davên van gotina û xwe bi van gotina digrin. Gelê me, ji hev sar û dûr dikin. Û mina Tirkên çiya didin nişandan û hêllên gel li ser vê yekê dixapinin.

Mina wun ji pê dizanin ji rabûna netewan re hebûna çand û dirokê şertên çarenin. Yekitiya dirok û çand û zman, netewbûna gel bikar tinin. Em li dewletsaziya Yunanistan mēzekin. Ev welat berî miladi hebûn domandiye û bi Îskender ta Hindistanê giraniya xwe nişan daye. Lê, piştî vê demê ketiye zevfta Romaya, Bizans û Osmanîya. 2000 salan zêdetir jêrdest maye. Û di nav vê demê de dewletsaziya pêk neani ye. Dirok û çanda Yunaniya kevn, bi destpêkirina tevgera Ronasîyê derketiye meydanê û bi rêberiya şairê Îngiliz LORD BYRON li welatên biyane xebatên fireh destpê dikin pê de gelê Yunan hişyar dibî û bellê piştî 2000 salan şûnde sala 1825 digihîjin azadiya xwe. Mina xûyane, hebûnê çand û dirokê di tevgera rizgariyê de cihên pêwist digrin, ji bo vê yekê: ev nimûnêki ye.

Ku ji min û we ra ji vaji tē, nimûna Îsraîla faşist li pêş me radiweste. Berî 3 hezar salan, dema Îsa peyxember da hebûnek siyasi domandine şûnda dewletsaziya wana rabûye û hilweşiyane. Li hêllên cihanê bela bûne, piştî pêkanîna Hitler jî, di sa wan çand û hebûnên xwe yê dirokî derxistine. Pêşî nav xwe de hevkarî pêkanine. Û dawiyê, sinema, tiyatro, wêje û sinetê bedew mina destikan bikar anîne û bi zaneyî dirok û çanda xwe bere-bere bi cihanê dane hebandin û bi alikariya emperyalîstan dewletsaziye pêkanîne. Ev bûyer çiqas vaji be, lê disan jî nimûnêki ye.

Ji ber van yekan li hember ew ên ku dibên "gelê Kurd bê wêje ye û diroka wê tune ye" em ê çima xwedî li dirok û çanda xwe dernên. Ku em xwedî dernekevin ew ê ki lê xwedî

derkeve? Ma qey em li benda derketina şairêkê Îngiliz rawestî; ta wê gavê em ê bê deng bin? Helbet bersiv van van pirsan "na" yeka qirase ye.

Îro li Tirkîyê, hêzên zevftkar ji girtin û kuştina birayên me û ji pêkanînen îşkencê natirsîn! Ji bidarvexistina birayên me natirsîn! Ji qirkirina girtixanan natirsîn! Lê, a tirs dide dilê wan; tevgera gelê Kurd, hînbûn û zanîna çandî û diroka Kurd e.

Hêzên zevftkar û faşist dikarin bi hemû rengên zerp û îşkencê pêkanînen nemirovî li ser birayên me pêk binin. Lê, vê zerp û îşkencê li dirok û çanda gel nikarin bikin. Çima? Lewra goşt û hestiyên çand û dirokê tune ye. Ji sedemê vê yekê tirs dikeve dilê wan û har dibin.

Ku hoyên demê diwartirin û gellek xebatên tevgerê nayên pêkanînen, wê gavê ev dibe rêyeka çarenin; derkirina rûreşî û nemirovîya faşîzmê. Pêkanîna hizkirin û hevkarî û yekitiya girseyên Kurd, gelê xwe li ser çand û diroka Kurdan ronahi bikin û fêr bikin. Ji sedemê, me qîma xwe li gellek tunebûnan anî ye, piştî xwe daye diwarîyan di nav vê rewşê de em ê vî şerê birûmet bi dominîna û ev jî me ra rêyeka çarenine. Wê gavê em çima kêrê li çiyên xedar naxin?

Di derhola vê berpirsiyariyê de min vê nivîsê, nivîsandiye û pêşkêşî we dikim. Helbet wê ev nivîs jî yên ku dibêjin "Kurd bê dirok û bê wêje ne" bibe bersivêki. Ji xeynê van yekan, xebatên ser çand û diroka Kurdan vejandinên vî alî ew ê neerîniya nav tevgerên Kurdan rabike.

Mina tê zanîn kemalistan bi berdevkiya Afet İnan diparêzin ku: koka Etî û Summeran Tirk e. (Ku tu eserên wê nehatine wergerandin û qala helezonê lê çê nebûye) Ji bo ku Atatürk koka Tırka bigihîne Anadolê, li ser vê bide zanîn gellek xebatan kirî ye. Navdanîna kitê Sumerbank û Etîbank jî vê yekê ye.

Ta sala 1980 jî bo Kurdê KASSÎT û GUTÎ yan pejrandin çênebûn. Lê, rojnama "cumhuriyetê" di çend nivîsên xwe de sala 1980yî

KASSÎTA jî digihande koka Tırka. Li gohra wana ku Kurd "Tirkê çiya ne" wê gavê KASSÎT û GUTÎ jî diîti ku koka wan Tirk be. Ku em xwedî lê dernên tevgerên pejrandinê nasîn û naqedin. Destavetîna me ronakbîr û kedkarên Kurdan ew ê vê tevgera pejrandinê rawestîne.

Diroknevîskarên biyane, hebûna gelê Kurdan digihînin Vegera Dehhezaran. Yanî digihînin berî miladi salên 500î. Lê, ku li kitabên van nivîskarên bê mēzekirin kevniya nivîsa wan eşkere xûyan dibe. Ku gelê Kurd û împaratoriya Hitît hemdemîn ta sala 1907 an derheq împaratoriya Hitîtan di tişt nedihate zanînê. Dema ewilî kolona Hitî'î di vê dirokê de destpê bû. Nivîsên û nexşên li ser danezanan hatine ditînê ancax sala 1917 an de xwendina wan pêkhat. Van danezanên bê emsal diroka Kurdan jî ronahikirin û derxistin ber rojê. Ji sedemê van yekan nivîsa pêşkêş dikim pêkanînen arkeolojiyê nîveka diduyê sed-sala bistan dide berxwe.

Niha jî di radyoya Tirkî de "dîtina eseran" tê weşandin. Lê yên kîjan netewan e daxûyan nakin; diniximînin. Ma gelo jî bo çî? Van danezanên dirokî jî ber ew wê zanistî pêşbixin û bibîne hêzek jî rizgariya netewî re. Dema van rastîya derbikevin meydanê, ew ê efsana "Tirkê çiya" jî bipelişe. Lohmanê daxûyan nakin.

DÎ DÎROKÊ DE CÎYÊ GELÊ KURD

HEBÛNA GUTÎ ya digihîje qurna salên kevin. Hetta niha qralê GUTÎ-yan yê ewilî Emnatûn ê (Annatom). Berî miladi salê 3100 an de jî ye. Yanî 5082 sal berî me. Piştî vê dirokê gellek serdarên ku hatine, diroka berî xwe ya gelê Kurd anîne zman.

ÎMPARATORÎYA GÛTÎ-KURD

DEMA BERÎ MÎLLADÎ serdarê Lagaş ADADNARÎ, di 2400î de ser-

darê UR "OUR" KMÎLSÎN ji gelê KARDA, axa Kurdan, serdarê HÎT-TÎT SEUBÎLKUBUE (Souppilouloum 1.) ji di salê B.M. 1370 de ji hêla KARDAKA û ji civatên KURTÎE, û KURTÎan bahs dikin.

Mîna TUGULTÎ ÎNOR serdarê Asûr ji GUTÎyan re "KURTÎ" digota. Disa serdarê Asûra ku di sala B.M. 19. de jiyaye; ADALNÎRARÎ ji, bi refên siwariyên çeşên KUSÎ, û GUTÎ yan re şerr kiriye.

Ev serdar di danezanên xwe da ji GUTÎyan re "KURTÎ" dibêje.

Ev bi danezanên aşkere ye ku; dewletên KHALDÎ, ARARATÎ, SUBARÎ, NAYRÎ, MÎTANÎ, MÛSKÎ û dewletên KASSÎT (KÛSÎ)yan ji GUTÎyan tîn, reha wan digihîje GUTÎyan. Ku derheqê vê de danezanên berbiçav hene.

Ev danezan ji SALMANASAR li maye. Ku salmanasar 1 B.M. 1280-1261 de li welatê ASÛR serdari kirîye. Anî piştî serdarên GUTÎ EMNATÛM tam 1829 sal paşiyê li welatê xwe serdari pêkaniye.

Di vê danezana serdarê ASÛR de ev yek tîn gotin: *«gelê Gûti mîna stêrkek şewq vedida. Û ew ne tenê bi piraniya xwe, bi ezm, zerp û diwariyên xwe ji dihatin zanîn. Diwariya wana li hemberî min ji domiya.»*

Bi vî awayî ji; piştî hilweşandina serdariya Gûtiyan hezar salî, serdarê ASÛR SALMANASARê 1., şaxên dewleta GUTÎya, û yên ku gihiştine dewya wî "ZARÛYÊN GUTÎ" dibîne û sedsal di navê de derbas bûyibe ji, ew disa "GUTÎYAN" ûne zman.

Disa ev serdar piştî cengên xwe van yekan dinivisîne.

«...ji tixûbê ARARAT heta pût'ên TÛRÊ di nav vî welatî de xwîna GUTÎ heriki...» Li van derên gotinê nuha ji gelê Kurd diji.

Di dirokê de cara yekemîn welatê Babil; GUTÎyan têxistiye destê xwe. Lê, serkariya Gûti, hilweşiya. Welew serkariya Gûti hilweşiyabe ji, ji dewletên Kurda, şaxa serkariya Gûtiyan bi serdariya Kurd-Kassîta (Kûsi) dema geşî bi dewleta ta 725a li Babilê domandine. Ala Kurdîti ji dewletên Kurdan; SUBARÎ, MÎTTANÎ, KHALDÎ, MÛSKÎ, NAYRÎ ta giha-ye împaratoriya Med'a.

Bi danezanên zelale û tu şik jê nayê ku Gûti pêşiyên Kurda ne.

Dirokzanê û nivîskarên li ser diroka Asya û Mezrabota dixebitin vê rastiyê bi gelêk danezanên tînine zman. Profesore Universita Pensilvanya SPEIZER di pirtûka xwe "Koka Mezrabota" da daxuyan dike ku Kurd û Gûti û Hûrûbî yên Zaxros'ê ji kokenê ne. (B. Nikitin: cild 1 R.91.)

Disa diroknivîsarên Osmaniya AHMED REFÎK dipirtûka xwe "Tarîxî Ûmûmî" de, EMÎN ZEKÎ, di "Diroka Kurd" de bi gelêk kifş-kirinan vê yekê didine nîşandanê. Ji van yekan pêştir dirokzanê binav MJCERSON pêşkêş dike ku; piştî serkariya NAYRÎYAN (ku ji Gûtiya ne) ew ji bi "KURTÎ" navdar bûne. Disa Dr.KONTÎNON vê yekê kifş dike ku; B.M. 4 hezar salla de civatên ZAXROS û li Mezrabota bi cih bûne; bi Gûti û Kusî (Kassît) navdar bûne. Û bi eslê xwe ji Arî ne. Civata Kurdên îro ji van hatiye. (Mijûy ebedî. Kurdî-cild 2.)

Di pirtûka (Diroka Kurd û Kurdistan) de nivîsiye ku Gûti û Karda pêşiyên Kurda ne. Rojhelatzane Dr. Rays ji xwediyê vê ditinê ye. (Îhsan Nûrî:R.173.)

Hebûn û kevnariya diroka Kurda; rast-birast ne beji, karbidestên Tirkan ji ray lê tînin. Ji bo vê du danezanên pêwist di destê me de hene. Ji vana yek; "ÎSLAM ANSÎKLOPEDÎSÎ" ye. Di rûpelê wê yê 1089an de ev nivîsandine: *«... Berî milladi bi 2000an li ser kevîrên SUMMERA, navê welatê KAR-DA-KA hatiye nexşandinê. Ev welat li başûra gola Wanê, li cem gelê SÛ dima. (Revue D'assyriologie-Thureau Danguin)*

Danezana duduya pêwiste. Lewra di dema angaştina ronakbirên Kurda de, li dadigehê hatiye zman.

Bi vî awayî ji êşkere dibe B.M. sala 1071 de ji Melezgirtê derî Anadolê bûne; di nav-bera Tirk û Kurdan de ji al netewî û pêşiyên ve tîkili nîne.

Sawciyê dadgeha leşkerî-Komitanîya Sêêrt, Diyarbekir, Sawcî Said Dabak di rûniştina 23.10.1971î de hebûna Kurdan ji 6000 salî ve daxuyan dike *"di dema SASANÎyan de xûyadike ku qewmek bi navê 'KURTE' heyê. Dema berî milladi 3000-4000î de pêşiyên URa, KURa û KURDa ji berê ve bi ARÎ û SASANÎyan re jiya ne. Û tu şik derheqê vê de tune ye..."*

Li ber vê ev gotina pêşiyên bê

hemd tê bîra mirov; *«Rûvî berê nedîçû qulê, Rabû; hejîk ji bi teriya xwe va girê da»*

Em mana gotina "GUTÎ" ji weşana Hoybûn "Civata Welatên Kurdan" hindibin ku mana wê "Şervane".

Bellê ji pêvajoya dirokê ve qewmek ji çiyayên bilind, ber bi SURÎyê ve bi cih bûye. Navên wana "GUTÎ", "CUTU" bû û şervanbûn. Ew qewmin ji berê ve li nav hêlên "SÛS" û Kafkasyayê bi cih bûne. Li rojhelata Îran'ê, hêlên çiyayê Anadolê cihgirtine. Demek bi dewleta ELAM û SUMMERan re şer kirine.

Ji serdarên Gûtiyan; LOSÎRAP, ŞERLEK, ÎKŞMÛŞ, ANRÎ, DAPZÎR û TIRÎKAN yên bi nav û pêwistin. Di Şehnamê de ji ŞERLEK ra SÎYAMEK, ji ÎKŞMÛŞ ra MÛŞENG tê gotinê.

Em ji kitaba Îhsan Nûrî hindibin ku; piştî zeftgirtina welatê Babilê serkariya Gûtiyan 125 sal, 40 roj bi serdariya 14 serdarên Gûtiyan hatiye domandinê.

B. Nikitin dinivisîne ku; dawîya serdariya SARGONA, GUTÎyan aniye. Û ev dewlet heta B.M. 2496a serkarî domandiye.

Serdar OTON (Ku ew ji Gûti ye) serdarê Gûtiya, TRÎKAN bindixe. Gelê Gûti piştî vî binketî belavbû. Di nav vî hilweşandinê de Gûti yên Betlisê navê KAR-DA-KA sitendin. Yên hêla çiyayê Baxtiyar û derdorên hêlê serbixwe man.

ÎMPARATORÎYA KÛSÎ-KASSÎT

DÎ DÎROKÊ DE ji vî împaratoriye re Cemşid ji hatiye gotinê.

Tê zanînê ku li Rojhelatê tore ye, navên serdarên bilind li welatan dibe. Şehname; Kassît û Kûsiyan Kinaya, û ji milletê Cemşid dihesibîne. Piştî hilweşandina serkariya Gûti, gelê Gûti vî dewletê avadike. Û serkariya wana siyasi hetta B.M. 1896 û 1176a didome. Lê, diroknivîskarên roava, diroka binxistinê B.M. 1160î didine nîşandanê. (Maurice Meuleau, Le Monde Antique Paris 1976, R:160)

Mîna tê zanînê împaratoriya Kassît û welatê Hittitan hemdem bûn. Ku ta sedsaliya 20. derheqê Hittitan de tu tişt nedihate zanînê. Ji xeynî çend gotinên pêşberî Îsa bûne, danezanên

derheqê Hittîtan de zanebûna alema beşerî bi kolanên 1907an derî holê bûye. Xwendina danezanên kolanîne ancak sala 1917an pêkhat. Piştî bişkavtina Elîfbaya Hittîta ne ku derheqê welatê Kassîtan bi firehî em gihîştine zanebûnê. Berî vê yekê ku diroknivîskaran hebûna Kurdan ji "Herikandina Deh Hezaran" destpê dikirin. Ji kêmezanebûnê û taybetî ji ber diroka Hittîta nedihate zanînê.

Di dema Kassîtan de; pêşveçûn û hemdemîya Kurda gellek kêrî hemdemîya alema beşerî hatiye. Bi sine'at, çand, wêje, destik, pût û wêneyî bi dewleta Mittanî ve tesîr li hemdemên xwe; li Hittîtan, Asûr û di dema serkariya Firaûnan de li Misirê kirine.

Di vê dema ku tîkiliyên çandî û bezirganî pêşveçûne, di nav-bera van dewletan de, dan û sitendine, guherandin berçav dive ku danezanên ji kevnara Misir ku li muza Paris'in gellek zangêr xwediyê ve ditinene ku; perek ji vana ji danezanên Mezrabota û yên Asya pêşin.

Ji hêla di ve, li Kurdistan'a Başûr hêla Hatna de di kolandinan de gellek danezanên bi rûmet derdkevin û li muza Bexdayê diminin. Ev danezan di salê 1951 û 54an de, tîxistîne muzeyê.

Disa, pûta qewartinê, danezana dema dewleta Kassîta, ku gellek navdare; bi navê "Pûta pêşkêşiyê" li Paris'ê di muza Lauvrê cihî xuya û bi nişan digre. Di vê danezanê de serdar Melîşîpak II, keça xwe pêşkêşî Mania Fanrica dike. Danezana serdarê Kassîta serdar Karaindash di B.M. XVI de daye çekirinê, ziyareta daye oxira xu da nuha li muza Berlin'ê dimîne.

Ji xeynî dewlemendiya vi alî, mîna hemdemiyên xwe di alî siyasî de jî; welatê Kussî bi nişan e. Di navbera dewlet û serdarê demê de tîkiliyên avakirinê, berpirsiyarên serdara li welatan hene, çûn û hatinên berpirsiyarên hêla tî domandinê, serdar ji hev re nameyan dişinin hwd. Nexasim van tîkiliyan di navbera welatê Firaûnan û împaratoriya Kassîtan de gellek pêşkêti ye. Di nav wan de bendên aşitî û lihev-hatinê tîne karanîn û ji hev re hevkarin.

Di alî bîngeh avakirina dad û nav dewletê împaratoriya Kussî-Kassîta danezaneka pêwîst e. (Ji bo zanebûna firehî li Le Monde, Antique-Maurice,

Meauleau, R:161î mîzeke).

Di alî karbidestîya dewletî de pergalên berkari û berpirsiyari saz bûye. Di hêlên ziyaretan de piştî civin û torên olî xebatên wêje, çandî û sinet jî pêşkêş dibin. Ku xelkê Kurd ve tora xwe ta rojên me domandîye.

ZEFTGIRTÎNA BABÎL

PÊŞVEÇÛNA ALÎ SÎYASÎ, karbidestî, çandî û civakî de împaratoriya Kussî-Kassîta, ne pêşveçûneka lihev-hatî ye. Lewra, mîna pêşiyên xwe, Kassîtan jî B.M. 1530î de Babil'ê zeftgirtine. Hebûn û mîrata Babil'ê jî karbidestên Kurdan re maye. Mîna tî zanînê pêşî li van welatan monarşî serdest bû. Ku di vi alî de Hammurabî, bi serdarî hebûna li hemdemîya Babil'ê nexşandîye. Ev serdar, Asûr'a, Eshounna û serdarê Mariyan bindixe. Û di sala B.M. 1695an de tîxûbên welatê xwe firehtir dike.

Ger di dema Hamf rabbî (B.M. 1729-1686) ger jî di dema selefê wî (B.M. 1686-1648)an de di nav sazûmanê de berkari û berpirsiyari hatibû avakirin û ev yek berbiçav xuya dibû. Karbidestîyeke bihêz hatibû avakirinê. Fermanên dewletê, serkarên hêla hwd. bi nivîsî dihatin pêşkêş kirinê. Serdarê welat, li ser fermanan bihûr4bijarî disekin. Jiyana politîkî û Aborî biyekdestî dihatê domandinê. Nişana dada Hammurabî bi nav û deng e. Di diroka mirovî de, cara yekemîn damezrandina bendên dadî bûye karê wî. Dema mirov li ser van bendan naweste êşkere xuyane ku serdarên van dera mîna bav û gellek mîzin tîne hesibandînê. Hêza xwe jî hunda ra distinin. Ev bend ve taybetê zelaltir dike;

«Bi hay û hizkirina xûdayan ez Hammurabî; dadî li welat bijînim, û ji bo neerîni û xwînrij û qisatan rabikim, ji bo keda jaran jî alî xwedîhêzan nêyi xwarîne, mîna rojê li ser gelê xwe min şewq veda. Şîvanê xûdayê MARDOUK, ku wî berpirsiyari dayê, ji bo dinyayê rohnahî bikim; min tucaran gelê bin xwe ji çavan dûrmexistîye. Bêkêr nebûme û si ya mîna xêrxwaz li ser hemû şehîdên welat vegirt. Min mirovên welatên AKAD û SUMMERan jî daxiste himbêza xwe. Wan jî di nav aşitî de jîyand. Kamîlbûyîna min wan jî parêst.

Ji bo dewlemend, jaran neeciqîn, ji bo mafên sitûxwar û sêwî û jînebiyan bikeve dest, min bibendên dadî li welat karbidestîneka pak damezrand. Ji bo kifşkirina bendan min li vê derê gotinên xwe ve birûmet nivîsand. Bi serdarî, serbilindî û xwedî dadî ez wan li ber hebûna xwe pêşkêş dikim.»

(Qanûnên Hammurabî)

Dema Kassîtan Babil'ê tevi welatê xwe kirin, ji xeynî pêşveçûyîniya xwe bûne xwediyê dewlemendiya mîratê Babil'ê jî. Lê, dema ku Hammurabî, ji welatê Gûtîyan xiste bindestê xwe, bû xwediyê ve dewlemendiya mezin. Ev ditin jî alî zangêrana jî tîyî kifşkirin.

Ji ber kurt-nivîsê, em pêwîst nabînin ku bi firehî li ser afirandinên dewleta Kassîta rawestin. Lê, em ve kifşkirina xuyane, pêwîst dibînin ku pêşkêşî xwendevanên hêja bikin. Ku; alema beşerî, cara yekemîn di dema Gûtî û Hournîtiyan de hespê destîkeka suariyê bikar anî ye. Ev gavekî pêş e. Di alî şer, ger, çûn û hatinê de hwd. ev gavekî gellek pêwîst e. Disa li gor texmîna me, cara yekemîn disa kerpiç jî alî Kassîtan ve bikar hatiye. Îro 3500 sal derbas bûye jî, ev destîk di nav gelên Asya-Pêş li hêla gurolîtî bikar tî.

Disa li Babil'ê dema Kassîtan de cara yekemîn di alî destîkên pîvanê, dirêjî û giranî de, Kassîtan danezanên pêwîst afirandine. Û li gor Maurice Meuleau jî, ji bo astronomî xebat û danezanên pêwîst bi vi geli pêkhatine (Le Monde Antique. Maurice Meuleau R:201).

Di alî hekîmîyê, kifşkirina tedawiya nexweşîna de, pêşveçûneka berbiçav di dema Kassîtan li gîştî Mezrabota pêkhatîye. Ji alî hunerên desta ve li mal û kargehan jî xweliyê cêr, tas hwd. çêdikirin. Ji ber zêr, ziv jî B.M. sedsaliya bîsta ve jî alî Gûtî û Summeran dihatê zanînê jê gellek afirandinên bi rûmet çêdikin, li hêla gundîtî gellek destîkan jî dara bikardînin û jî bo ajotîna erdê dixebitan-din.

Ji hêla di jî ber ku dizîni li Babil'ê nîn bû, jî hêla Kapadokya (derdorên Newşehîr û Qeyserî) dianîn. Hebûna zift û qîrê hê jî wê dema ku Mûsil û Kerkuk bindestê dewleta Mittaniyan de bû, dihatê zanînê. Lê, alema beşerî jî dema Kassîtan ve ve dewlemendiya kêrî xwe tîne.

Ku serdarê Asûra Toukoulî ve

yekê dibêje: «*Li haqa Mitta li cem dewlemendiya Bitume min çadir vegirt. (Ku ji vê dewlemendiya binê erdê re Bitume tê gotin.) Li wê derê dengê xwûdayan di nav zinaran da dihata.*»

Ji alî Maurice Meuleau tê kifşkirin ku di jiyana civatî de bi gellek rengan ev dewlemendi hatiye xebitandinê û ji alî Kurdan ev dewlemendi ji welatên din re hatiye şandinê. Cara yekemîn bi 28 xirawî zif, torekê difroşin, piştê toneka wî derdixin 160 xirawî ziv.

Taybeteke pêwistiya dewleta Kassît ji ev e ku di alî sin'et û mimarî de gellek hunermend afirandiye. Ziyaretên Babil'ê, seraf û bexçe, bûrç û qale, xan û eywanên kêf û xweşiyê, rê û pîrrên bi nav û deng hemû li ser pişt û hunerên hunermendên Kurdan avabûne. Di nav de sedsalan derbasbûyî be ji em dibinin ku ev taybet di dema Medan de ji hatiye domandinê.

Nexasim dema Meda de û piştê re ji hunermendên Kurdan ku li Anadolê danezanên pêwîst avakirine, yên Pers, Roma û Yunaniyan de ji vê hunera xwe bi giranî domandine.

Me li jorê dit ku pêwistiya hunera avakirinê li cem Kurdan çiqas pêwîste û di dema xwe da tîkiliyên dewletî bi ciranên xwe ra şewq girê didin, ji bo vê yekê ji ev nameya serdarê Kassîtan serdar Kadashman ji serdarê Misir Amendphis re rêkiriye pêwîste.

«*Ger tu birayê min bi (bi mana hevaliyê) tu çewa dinivisîni ku ez tu tişt nadim te? Dema min xwest bi qîza tera bizewicim te ji min re got ku 'tu car keça serdarê Misir negihaye kesekî di.' Çima wiha dibêji? Tu serdari û li gor xwe bi teverî. Ger tu keça xwe bîdî min, ew ê kî hember biryarê te derbikeve? Bersiva te ji min re gotin. Ez ji birayê xwe ra disa dibêjim. Keçên tê yê kemilî û jinên delal hene. Wê gavê, yek ji van yina mîna keçeke xwe ji min re bişîne. Kî dikare bêje ku ne keça serdar e?*

Min xwestina zêr ji nivîsandibû. Zêra bi lez bişîne ji min re. Di vê dema havînê de bigihîne min. Bi vî awayî qesra van avayê min dest pêkiriye biqedînim. Ger di vê demê da tu zêra bigihîni min, wê gavê ez ê keça xwe bidme te. Tu tenê dixwazi qton zêr bidîmin, ku ez ray lê nayim. Û ez keça xwe nadme te.»

(Nameyên El-Amarna, H: 4)

Bi nameyê kevnaya qelen ji me bi bîr anî.

HİLWEŞANDÎNA KASSÎTAN

WELATÊ KASSÎT dema xwe ya geş û dewlemendî di navbera B.M. sedsaliya 15 û 12an de derbas kiriye.

Dewleta Mitani (di zmanên biyanan de Mittani tê gotin) ji hêla şervanên serkar ve karbidestiyê di domandin. Û welatên Asûran ji ji xwe ra kirin paytext û li hêlên bakûra Îraq û Sûriyê, li hêlên Rûha, Mareş û Mêrdîn'ê serdestiya xwe didominin. Hittit ji li Anadolê bihêz bûn. Bi vî awayî di vê pêvajoya dirokê de, li Babil'ê Kassît, Başûra Anadolê Mitani û li Anadolê qeraxên bahrê hêla Sûriyê di navbera Hittîtan de demek aştî û xuya tê jiyand.

B.M. di salên 1380î de bi êrişên Hittîtan û ji nûjeniya Asûran dewleta Mitaniyan hilweşiya.

Salên dilxweşi û aşitiyê li dawiyê man. Di nav-bera Hittîta û Misiriyan de şerên dem-dirêj destpêkirin. Di van şerên demdirêj de kî serket, dawiya şer ji alî herdu hêlan ve çî afirandiye bersiva vê yekê ne hêsan e. Lê, baş tê zanin ku, piştî hilweşandina dewleta Mitani, 100 salan de li Rojhelata-Nêz çar dewletên bi hêz hebûne. Asûr, Hittit, Misir û dewleta Kassîtan. Ta B.M. sedsaliya 13an di nav van dewletan de rewşeka wek-hevî pêkhatiye. Lê, piştî van salan ev çar dewlet demeka dijwar dijîn. Bi serkariya Assour-Oubalit (B.M. 1356-1320) êrişê welatên cîrana dikin. Êrişên zefîkariyê li van hêlan domandin. Ev serdar welatê Kassîtan zefîgirt û Babil'ê xiste destê xwe. Bajêr hilweşand. Û pûtê Mardask bire welatê xwe. Lê, ji alî gellê xwe va ku ji serkariyê hate hildanê û ku hate kuştinê, gelê Kurd ji vê keysê feyde sitend. Di vê rewşê de wan welatê Asûran zefîgirtin. Lê, şerrên hemberiyê dewleta û welatê Kassîtan gelleki jar kir.

Dawiyê Kassîtan di B.M. sala 1171î de bi êrişên Asûran hilweşiyan. Dawika jiyana siyasetî bi van êrişan pêk hat; û pelişin. Ji ber vê rewşê dewletên Kurdan, yên nû derketin rûkê dirokê. Dewletên Mannai, Nayri, Khalde, Muşki, Ararati, Nemrûdî û dewleta Meda ta berî miladî sedsaliya pêncan hebûn û ala Kurdan domandine. Bûyera Dehaq ji B.M. 612an hember Asûr serhildana gelê Kurd û avakirina dewletiyê dide xuyandane. Di

salê B.M. 612an ji alî Kurda ve dewleta Asûr hildiweşe, û di dirokê de ji vê demê ve hebûnêka siyasetî nedaye nîşandane. Hebûna Kurda di alî siyasetî de demeke dirêj domiya, ta bi serkarê Pers'a (B.M. 534). Sîrûs zefîgirtina Anadolê ev yek ji ji holê rabûye.

DANEZANÊN NÎŞANA KU KASSÎT KURD'ÎN

ROJHELATZANE Ojen Pitar daxuyan dike ku bi demê ve Gûtiyan dewletên nû avakirine û navê Kassît (Kusi), Lolo, Mamaî, Mitani, Kardûş, Khaldi, Kardû, Mad (Med) sitendine.

Rojhelatzane Alman Mersfeld ji dibêje ku: «*navê behra Hazarê di zmanê Awrûpayan de Kespîn e. Bahra Hazar'ê navê xwe ji civatekê distîne. Ev civat B.M. li başûr û Rojhelata bahrê disekinîyan û navê civatê Kusî, Kasû, Kessesî ye. Gotina Kasû, gotina piraniya Kasp, Kespîn e.*»

Berpirsiyarê danezanên kevnare Anderk'ê Irani van yekan dibêje ku: «*xwedîya danezanên li Loristanê derketine, nayê zanînê ku kingê jiyane. Lê li hêlên Hazarê derên çiyayî sekinine. Dawiyê bi êrişên qewmên êrişbaz bi çûna Loristanê qewmê Kassîtan bi nêzkahî xwediyê 4 hezar sal kevnî dirokî yê ne. Vê qewmê Babil'ê zefîgirt û nêzi 700 salî li vê karbidestî domandine. Dawiyê disa vegehiyane çiya. Hespan xwedî kirin û firotine Asûran. Ji gellek destikan, bi hunerên xwe danezanên xuyare afirandine. Îro ev danezanên me ditîne, ji dewlemendî û hunermendiya wan ji me ra mane.*

Disa diroknivîsarê Osmani Ahmed Refîk di «*Tarîxa Umûmî*» yê de dibêje ku Kassît pêşiyên Kurdê îro ne. Di irannane û dewra Eskariyan de ev yek di cildê II.yan de tê kifşkirinê.

«*Berî miladî salên 1800 de, Kasûyên li Babil'ê dewlet sazîkirin û felsefê û dadi de pêşketine, Kassû an ji Kassît beguman pêşiyên Kurda ne.*»

Welew di nav de nêzi pênc hezar sal derbas bûbe ji îro gelê Kurd li ser vî axê jiyana xwe didomîne.

B.M. bi 1500 salan de ku demekê gelê Mitani li Rûha, Malatya, Mêr-

din, Mareş û li hêla Kerkukê impatori avakiribû, li Bakûra Îraqê, Kurdên Kûsî-Kassitan, li hêlên Agirî û Qersê, Kurdên Araratî, li Mûşê, Bedlisê, Erzincanê û hêla Wanê KAR-DA-KA an ji li Wan, Hekkari, Sêert, Suleymaniya, û roava Îranê bi Medan tevî hev, bi hevra hebûna xwe ya netewî, wêje û sin'et û çanda xwe ta sedsaliya bistan anîne.

Ev kifşkirina dirokê ye ku li ser eynî axî gelê Kurd hebûna xwe hundanekirîye û derxistîye holê. Xeyn vê jî ev hêl jî destpêka dirokê ve jî alî tu hêzî ve nehatiye zeftkirin. Welew jî demên kevnare ve ev hêl di bin gellek êrişan de mabe, bi rêz êrişên Persa, Grekan, Romayan û dawiyê êrişên Ereban û Moxol, Selçûk û Tirkan dibe jî jî pêkanînen hovberî hwd. mîna Rojhelatane nivîsandine gelê Kurd xwe kişandiye hêlên çiya û hebûna xwe domandiye.

Hêzên zeftkar cihgera Kurdan mîna rêçekê jî xwe ra dine. Mîna Alexandre (Îskender) dema diçe Hindistanê, Sîrûs, dema Sûriyê û Anadolê zeft digre, Romai hember Rojhelat dema bend avadikin hwd. hertim erdê Kurdan biranîne. Lê, ji ber şervanî û berxwedana gelê Kurd tu carî binxistin û tune kirina Kurdan pêkneanîne.

Di sa di id û rojên kêfxweşîyan, edet, çand, destar û destikan de, çirok û sin'et de gellek tiştên dişuhubîn taybetên Kassitan mirov dikare liber çav bibîne.

Lewra li nav Kurdan Kassitan xudayekê bi navê (Huza), (Hoza) heye. Îro "Huda" û "Hode" bi mana Xuda di nav Kurda de tîzanîn. Li cem Kassitan xudayê avê EA ye. Di Kurmancî da av mana wê gotinê ye. Di sa Kassit jî xuda ya hîvê re (sin), (zîn) dibêjin, ku ev di wêjeya gelî de hebûna xwe domandiye û Ehmedê Xanê di Mem û Zîn de Zînê dike sembola.

Di vî alî de gellek mîsal hene. Ku taybetên destana Mem û Zîn mirov bine bira xwe wê besbe. Ji ber kurtîvîsê li vêderê em li ser taybetên destana Mem û Zîn naseknin.

Ji dirokê çiqas bê pêjrandin, bê guhartin jî, dinya kevnare delîlê rastîyê ye.

Dr. Cemşid Bender

ŞERÊ NAVBERA ÎRAN Û ÎRAQ Û TEWRA TÎRKÎYE . . .

(Destpêk di rûpelê 27an de ye)

Sazûmana Tirk, ji serî ta niha ev şer jî nêzik dişopîne, dema şer xwe kişand Kurdistanê, ji wanê din behtir bizdeha û ket tayê. Boriya petrolê, ku jî Kerkukê ser rêya Zaxo de dirêjê Yumurtalik, ger jî bo Îraqê, ger jî bo Tirkîyê, pir girînge. Îraq ser vê rêye, firotina petrola xwe pêktêne. Ji firotina derveyî a rojîn, 2/3 li ser vê rêyê pêktê. Ango rojê 600.000 varil tê firotinê derveyî welat. Tirkîye jî petrola derveyî a girîng ser vê rêye dikre. Ji ber vê yekê herdu sazûman, nikarin biderivênin ku boriya petrolê bikeve nav tehlûkan. Bili vê serdestên Tirk, jî dirokê virde, Mûsil û Kerkuk kaniya xwarina xwe dibinin. Dema şirûtên baş derkevin holê, wê êrişî vir bike. Bona vê yekê di kozêde amade rawestahiye.

Îro şerê navbera herdu welatan, nêzikê Mûsil û Kerkukê didome. Herweha Tirkîye Îran tehdît kir û bala alema giştî kişand ser bajarên Mûsil û Kerkukê, û ser boriya petrolê ku wê navçe de dirêjahî diherike.

Pir îşaretên ku sazûmana Tirkê faşîst alikarî dide sazûmana Îraqê faşîst, berçav hene. Pir kes ketina firoka şer a Tirkîye di nêzikî Zaxo li Kurdistanê Başûr, îspat şanî dike. Gora baweriya hin hêzan, ev firok hin kozên Îranê bombardûman kir û dema jî ser erdên Îraqê vedigeriya Tirkîye, jî hêla firokên Îranê hate xistin. Piştî ketina firokê, Îraq 6 helikopter şiyand cihê bûyerê, daku pilotan rizgar bike, lê jî ber firok li erdê bin kontrola PDK-Îraq ketibû, jî mecbûrî ev helikopter jî hatin vî cihî û pêşmergan dido jî wanan jî dan erdê.

Serê sala 1983an Tirkîye û Îran lihevthaneke aborî imze kirbûn. Gora wê wê salê de Tirkîye wê buhaya milyonek dolar war bifrota Îranê. Lê nivê salê de, Îran ev lihevdan yekalî pêşkiland. Tewra xwe li hemberê Tirkîye daxûyanî kir. Ev pêşketin şanî dikin ku, Tirkîye li hemberê Îranê alikarî dide Îraqê.

Lê belê bili vê, sazûmana Tirkîye

xwe dihelifîne daku jî şerê navbera Îran û Îraqê, bi bingehi bo pejrandinên xwe yên aborî û rêzanî, derbasbûn pêkbîne, berjewendî bidamezrine. Pêwîst, sazûmana Tirk a nûh, vê pîrsê de daxwazên xwe eşkere diyar dike. Ji hêlekê politîka aborî a ser firotina derveyî welat didahilmîne, jî hêla din pêşketinên li Kurdistan, sazûmana Tirk bi diwarî dibizdihîne. Şerê xwe kişandi vê heremê, Tirkîye jî riknî direilîne. Ji ber vê sedemê serêkê sazûmana nûh Turgut Özal "bo serkeftina bédengiya hundurî" şerê navbera Îran û Îraqê pir girîng dibîne. Bala alema giştî kişande vir û eşkere kir ku ev şer girîngtir jî şerê Libnanê, dişopîne; behtir têkilî hewce diyar dike.

Hersê sazûman, jî kevnare virde kiryarî, Kurdistan birabirînin û tenha bihêlin. Tevgera tune kirina dijberiya netewî bihevve dimeşênin. Li ser bingehe lihevhatinên veşartî, iro welatê me qulibandine navça şerekê. Bi vê dixwazin zanistîya netewî a gelê me jar bikin, tekoşerî bifelişênin, û hebûna pêşveçûyî û şoreşger dahilweşînin.

Ev rewş şanî dike ku welatê me ketîye demeke nûjen. Ger bi zanistîya şoreşger bê nêzikîn, ev dema nûjen, jî ber şerên navberên dijminan wê bibe gavek, bo gav avêtinên pêşeyî. Lê belê ger, hêzên Kurd bibin dûvekên rêzaniyên dijmin, wê rewşekî bi tehlûke, behtir jî yên heyî, biafire. Çêtir bê gotin, wê binkeftinê giran û kovani bidamizin.

Lewra bi va pêşketinan, iro dirok, behtir jî her demî erkên birdozî derdixe pêşîya me. Bona gelê me û tekoşîna rizgariya netewa me, jî vê demê zexm xwe derbas bike, pir xebatên girîng divê pêkbên.

Em partizanên Kurdistan, bi zanîyarî û berpirsiyariya şoreşger, jî alikarî di nav şerê germ de, karê bicihanîna tekoşîna xwe dikin, jî aliyê din, emê jî vir û pêde, pêşketinên girîng, bi nivîsin xwe bighijînin gelê xwe. Û gelê xwe bi nivîsên babet babet, agahdarî pêşketinan û saloxan bikin.

TÎYATRO -3-

(Destpêk di hejmara derbasbûyî de ye)

Tegmen – Çend salan de, li kuderê çêbû û di kîjan salî de mir?

Apê Eli – Wî, ev ji ku derket lawo, ev çidibê. Secera kê dipirse. Wele qomitanêmin ez pê nizanîm.

Astegmen – Dewar kurrê dewara, ma hinê te nekirine. Gohê xwe veke. Ha hinbibe. Atatîrkê mezin, sazkarê dewleta Tîrk, sazkarê dewleta me ya dawîyê ye. Ew li dinyayê yeke û jê mezintir tinene. En mezin Tîrk Atatîrk. Hîn bibe vê. Temam, ka bêje; ka diyariya wiya xortan bêje.

Apê Eli – Êê... Hema weleh ji bilmîrem.

Astegmen – Ha ji ter van kaxida, rakê! Heta êvarê têr vana jiber bikî. Hey! Wun, wunê heta êvarê vana hînbikin. Ku heta êvarê hinnebe wê gavê ezê dê û xwişkên we sosret gerandî bikim. Hişt tu, ka bêje;

– Li ser nişana cumhûrbaşqanî çî heye. Û ev çî mane didin?

Mistefa – Min nekirîye xem ji xwe ra. Min neditiye. Û nizanîm çînin jî.

Astegmen – He, he... Ka, ka were bi vê va. Ha, ha, haştera hah!!! Ka îca wê bibê xem an na?! Rabe, rabe piya îbne! Çewaye ha...?

Tabî helbet wunê nizanibîn. Lawên Atatîrk emin, em. Ne wunin ku zanibîn. Wunê hemû vê jiber bikin. Li ser nişana cumhûrbaşqanî 16 sitêrk hene. Her yek ji mana dewleteka Tîrk dide nişandane. Temam, ew tirêjen rojê jî sembola cumhûrîyeta Tîrk ya dewleta dawîyê dide nişandane.

Tu hê ranebûyî ne wilo. Rab û xwîna dev û serçavê xwe paqij 'ke. Hê ezê nişanê te bidim; ka tu bise.. hişt tu were vêderê zû, ûla pûşt.

Xelîl – Xelîl Ordek, Rûha, Emîrke qomitanêmin.

Astegmen – Ji neha pêve baştir çavê xwe veke, guhên xwe mûçke, tişteki mîna serê derziyê jî ku ji çavên te, dengê bayê jî guhê te dîr bimîne... Wê gavê dema tu hatî tu zanî. Mûç be. Tişt dibin em pê nahisin. Nabihizin.

Xelîl – Emîrke qomitanê min.

Astegmen – Bazde çiyê xwe. Marş!

Hişt qerdiyan ev pûşt hê ranebûye ser xwe. Wî rakîn bikişîşîn, bîn.

Qerdiyan bi çepê Mistefa digrin bi lêdanê ve li erdê da dikişîşîn û dibin.

Xelîl – Hevalno, wuha nabe.. Ji ber du kesên qawîşa me diherime. Navê wê nebaş dertê. Çima ji sedemê wan emê ji lêdan û işkencê bibîn. Û lêdanê

bixwin. Dîbî ku di nav me da jî nîzamek hebe. Bi xwe wulo nabe. Tu kesek ji me jî vê yekê naecibine. Nexwe ewê me temaman jî bikujin. Wê bikujin lawo! Ji sedemê kesekî, du kesa! Çima? Karbidestên me çî dibêjin, emê wilo bikin, wê yekê bicîh binin. Emê hember wana bédeng bin. Kî ji we ray li vê nayne. Ji bo çendeka kuştin û lêdanê dide berçavê xwe.., kî?

Salih – Welleh ewê Mistefa bikujin. Bîrina wî ne jî têrêraye. Welleh ewê wî temam bikin.

Apê Eli – Lawo, lawo, deka, deka êhh, hîh ka ezê çikim jî vana. Evê vana bi min re çibikin lawo? Lawo wilo mekin! Ka ezê hewqasan çewa jiber bikim. Lawo qena aliyê min tê te ev çiyê lawo?

Xelîl – Were vê, wer ha hah. Dest pêke “Ben Turkum”
Apê Eli – Min Turka.

Xelîl – Rast bêje, rast. Rast bixwine...

– Ben Turkum.

Apê Eli – Bin Turkim.

Xelîl – Ha dibe ha, bêje, bêje!

– Doxruyum.

Apê Eli – Doxriyam

Xelîl – Ka dev ji vi zmanî berde. Ev çiyê?

‘Doxriyam’ na! ‘Doğruyum’ bêje!

Apê Eli – Doğ-ri-yum.

Xelîl – Ha, ha, hişê xwe baş bide serê xwe. Baş. Haydê bêje.

– “Çalışkanım”.

Apê Eli – “Çalışkenim, hişt çibû disa dinikê me, çibû jî te dinika.

Osman – Ha ji we re lawo, ha ji we ra bikişîşîn. Bikişîşîn ji xwe ra. Min dev ji çixarê berda? Berda, a.. a bise telaqê min berda..

Xelîl – Çiyê lawo, kî neşter xistiye ku wilo diciyê xwe da nasekîni. Vî seri-wî seri çiyê dipivî. Heval dixwîn, dersa xwe dibîn. Ev çiyê dest û lingên te nasekînin. Wax be! Wax, wah, jina min abûkat û hakîma diye. Jêr gotine en kêw wê deh sal bixwe. Ûla wax, wax. Ew jî dibêje ezê çikim ji te! De were li çoka xwe nede, de were. Lawo ka, ka, ka, çixarekê bidne min, ka çixarekê!

Xelîl – Disa çibû? Çibû ûlan?

Osman – Ûla pûşt. Li vêderê namûs ji diçe, ûla qûnê me jî vedikin, dinêrin ka tiştêk heye, tune? Tûh ûla, ûla.

Xelîl – Sebir ke. Bila lêdana te hebe. Mêze em ji xwe ra

dersa xwe dixebitin.

Osman – Ma hema Xelil qena tu neke qurban, hema tu wilo neke.

Xelil – Ka tu ji bêje lo, haydê: “Yaşam”.


Apê Eli – Lawo ev çi “yaşim”e.

Xelil – Tu ji bese 10. Jiberke bese..

Vê gavê qerdiyan bi hewrikên nan dikeve qawî-
şê.

Berpirsiyarê Qawîşê – Diqet! Em li ber emrê te hazirin
qomitanê min.

Qerdiyan – Ha ji we ra. Raknê, nanê iro ha tu ji rake



“moruk” bi xwee.

Apê Eli – Naxwim..!

Qerdiyan – Dawiyê tê birçî bimîni, tê...

Dema derdikeve tegmen dikeve hundir.

– Diqqat, em hazirê emrê qomitanêminin.

Astegmen – “Moruk” were virê... wer!

Apê Eli – Hiii, qomitanêmin, hiii.

Tegmen – Ne wilo. Dema em hatin, hima pût bisekine, û
tê kunya xwe bixwinî, haydê ka çê bike!

Apê Eli – “Memleket” Diyarbekir; navê min: Elî.

Tegmen – Naa, na! Ne wilo. Eliyê Diyarbekirî, ji emrê
te re hazire. Temam!

Apê Eli – Înşallah.

Tegmen – Ka sonda me bêje?

Apê Eli – “Turkem, doxriyam”. Êêê “Turkum,... dox-
rüyum!!

Tegmen – Rast bixwîne, mîna pilaqa xerabe nebêje..!

Apê Eli – “Dox-riyam”! “Tirkam”!?

Tegmen – Bêje, dawî?

Apê Eli – Qomitan. Bilmîrem. Wellah bilmîrem!!

Tegmen – Ûla moruk, Xumeyni kîye?

Apê Eli – Xumeyni...?! Xumeyni?! Rehberê qomitanê
min.

Tegmen – Pûşt.. Atatirk kîye?

Apê Eli – Û xwedê bela wî bidê, bê şerefe, bê namûse!!
Tegmen şaş û metal dimîne, çavên wî sordibîn,
dirêne wî lihev dikêvin, di xweydanê de di-
mîne.

– Namûsîz, pûşt, pûştê kurrê pûsta. Deka bise,
hajtere, ha qûnde,ker kurrê kera. Çima te wilo
got.

Apê Eli – Çi... çima ew... ew ji... ma ew ji qomitanêmin.
Ax, oy... uff. Qey lawo, uxxx şikir ji xwedê ra!
Ûxxx ji xwedêra şikir. Destê te saxbe..! Ûyy,
uff qomitanêmin

TABLO V

Li meydanê maseyek. Çend îşkenceci, lédan-
van. Muhsîn di revê da hatiye girtine, çavgirtî
di nav xweydan û xwinê de ifada wî tê sitendinê.

Serleşker – Ev çi mêrani!? Ji hepsê birevin he.. Bê
derketina laşê te, tê ji vê derê derêyi he?! Nav?

Muhsîn – İbrahim Şenol.

Serleşker – Navê bav?

Muhsîn – Reşat.

Serleşker – Navê dê?

Muhsîn – Fatma.

Serleşker – Çih û diroka çêbûnê?

Muhsîn – Rûha, Hilwan, gundê Owacik, 1955.

Serleşker – Kunya kesên bi te re hatibûn girtinê derkete
derva. Hemû derewin hê diparêsi? Hê ji navê te
İbrahim Şenol e?

Muhsîn – Ji xwe ez wan naznakim.

Serleşker – He, he. Na lo, na!? Tu wan nazdiki, nasdiki.
Qaseke din tê nazbiki. Hişt nivîskar lawo, tiştên
hat gotinê te nivîsand?

Nivîskar – Bellê.

Serleşker – Derew û rewşa te ji hindik maye. Ew ê der-
bikeve derva. Ka bêje: Ki li derva û li hundir alî te
kir; kîne?

Muhsîn – Ne li derva, ne li hundir kesekî alî min nekir.
Min tenê kir.

Serleşker – Binivise! Bi serê xwe kiriye! Ûlan, Ûlan
derew nebêje, qambocik. Bi vê bejna xwe tê dew-
leta Tirk bixapîni?! Ger rastiyê nebêji; ew ê qa-
sekê dinê miriyê te ji vê derê, der bikeve...

Muhsîn – Min dikarin.

Serleşker – Ji bo çi tu reviyayî? Çima?

Muhsîn – Li derva çar birayên min, xwişk û dêkamîna
jinebî heye. Ez mecbûrim li wan birênim. Xeyn vê
bê sûçim, bê sabîqa me. Û hinbûyê hepsê nînim. Ji
van sedeman ez reviyame.

Serleşker – Binivise: hinê hepsê nebûye; way way.
Beranê dayka xwe. Tê ji hinbibi, netirse. An tê
kurm bigrî, pûç bibi û bicihimî, an jî tê bibi zîlam.
Rêyeka din jî tune ye.

Ha, tamam ne? Ka rake vî kaxizî, rake vê qelemê, ev ciyê nişandidim îmza xwe bavêjê, dawiyê tilika xwe...

Muhsin – Piştî ez bixwinim...

Serleşker – Ji me bawernakî ne, ka dinya çewaye bibine. Hah wilo hah, ha, bixwinim ne! Xweş navêjîyê ji dibe, emê ji dilva te va bavêjin. Xayinên welat ji me bawernakim. Pûşt! Ka tê bibinî, Ûla qerdîyan!?

– Emirke qomitanêmin.

Serleşker – Vî bavêjin hucra serşoyê, qata bin, ya hejmar 3 ya.

– Emrke qomitanêmin.

Serleşker – Emê qaseke din hev bibinin, ka dinya çewaye.

Qerdîyan di nav lêdan û çêr û gefan de geh lê siwar dibin, geh bi erdê ve dikişinin û davên serşoyê..

Qerdîyan – Çi serşoyeka xweşik!!!

– Tê baş hîne ajberîyê bibî.

Piştî qerdîyan dertên diçin, ji qata jorê dengê xeniqokî, bi dizî, deng li xwarê kir.

–Keko.. keko?!

Muhsin – Bellê!

– Ez şoreş, dême tu hatî girtin ne?

Muhsin – Wilo çêbû.

– Haya te jê hebe qolonyalîsta kunya te kifş kirine. Tê peyvandinê, haya te ji te hebe.

Muhsin – Di gumana min da bû, tişt nabe. Bi biryari, tekoşin û berxwedan berdwame.

– Bellê.

TABLO VI

Cihê hingavtin û pirsê. Pîsiya avşoyê herikan-diye eywanê. Serleşker tegmen û lêdanvan û Hesên lê dimînin.

Serleşker – Hesên, em naxwazim zêdetir hingavtin li te bikin. Dilê me dişewite!! xortekî mîna şêrî. Evder ne ciyê te ye! Heyfa te hema, dê û bavê xwe bide berçavê xwe... Ez bi te dêsêm. Bi vî awayî ku here tê bimri!? Tu sebeb tune ku xwe veşêrî. Derheqê te de gellek delil hene. Hêjî tene pîrskirin û delil tene livandinê. Di nêz de ewê her tişt derbikeve derva. Di nav vî rêxistinî parvekar de cihî pêwîst digrî. Rewşeka wuha heye, di pêş de ewê her tişt ronahi bibe. Lê mêze ez çî dibêjim. Me zêde ne gewgirîne. Xwe jî nexwe tengasiyê. Bi me ra lihev were. Ji me ra bêje. Ê di ji mera bihêle; em li benda gotinê tene! Xeberde! Haydê wilo neke. Te anî wê qeysê, wa hindik maye ku ez xwe bavêjime lingê

te. Mêze va ez gellek ji te bi emrim. Bi hindiki be ji dibi ku vî qedrî tu bigrî. Ma ne wilo ye?

Hesên – Tu tiştêkê ez bidme we tune ye.

Serleşker – Ez soz û bextê mîranîyê didim te ku, em tu tiştêk ji te nakin û nadin kirinê jî. Dixwazi bersiv ji pîrsên min re bide. Abdullah Öcalan li welate? An li dervayî welate?



Hesên – Nizanim.

Serleşker – Ha keremke çixare bikşîne.

Hesên – Nakşînim.

Serleşker – Wê gavê tu dikarî bêjî; li nav welat û derî welat tîkiliya PKK bi kîjan rêxistinî û heta çî qeysî heye? Di nav rêxistinê de navê kê berpirsiyar dikarî bidî. Kesekê tu nasdikî, an jî navê wî te bihistibe ji dibe: mesela Şahin Dönmez...

Hesên – Kesekê naznakim û ez nizanim.

Serleşker – An jî niha yek kesekê di hepsê de, an jî yekê ku ji berê ve te wî nazkiribe...

Hesên – Wun bele-sebep pîrsan ji min dipîrsin. Tu tiştêkê nizanim.

Serleşker – Mêze Hesên! Bi her awayî berpirsiyarî dane destê min. Em biryar didine mirov; biryarê bidarvexistinê didine mirov. Lê danaleqînî û ji vî derê em dişînin cem dê û bavê wî. Lê te di ku dadgeh biryar neda. Ceza nedayê. Em li vî derê ceza didinê. Ew kesê em bixwazin, emê li vî bikujin. Tu kesek ji min; ji me hesab hapirse. Lewra ev di destê min da ye. Ji xwe ez ne girêdayê “Qolordî-molordîya” me jî. Tayîna min rast birast ji Anqerê hatiye vêderê. Xeynê vê, di sala 1974an de li Kîbrîs’ê ji min eskerî kirîye. Ez li wê jî serleşkerbûm. Ez ji kûrmayê pêştir kesî jî nabînim. Tiştên tu bêjî, ji min, ji te û ji kûrmayê pêştir tu kes pê nahise. Dîbî ku em li hev û dû bikin. Tu kesê nabihîze. Dernakeve derva, piştî demekê di mîna bêsûçî, emê te berdîn derva jî.. Hetta dikarî tîkiliyî bi me ra biki. Hetta emrê te hebe hemû îmkân ji te ra emê bikemilînin. Heyfe emrê xwe pûç neke; tu hê xortî. Ji xwe Rêxistinî jî qedîya!? Hil-

weşiya! Çend kes mane ew ji ha hatin girtinê ha hatin girtinê!? Were li ser serê me nebe donkişot!? Tiştên em dixwazin were bide me û xelas bibe. A niha ji bêje erê; ezê te bişînim qawîşeka serbixwe. Dawiyê ji emê bipeyvin.

Hesen – Ji wa tirê ez tişna zanim. Wun xwe dixapînin. Wun hestiyên min ji hûr bikin, ji xwe we tişt ne hiştiye ji. Tu tişt bi dest we nakeve. Wun dixwazin niha bikujin, ez ji mirinê natirsim.

Serleşker – Ezê te û hina binime hafa hev...

Hesen – Natirsim, dixwazî a niha ji...

Serleşker – Himm! (Ji nişka va sejderbê tê dixê cênîkê Hesen) Tê xebirdî? Tenê gotinekê.. haydê!?

Hesen – Çima disekinî, tiliyê bikşîne?!

Ku dibine mûkên Hesen ji nalibitin, kor û poşman, serxwar sejderba xwe dadixe qewlikê wê û;

Serleşker – Ez te hema bi neqlekî nakujim. Bi kişandî-neka zirav, hêdî-hêdî. Mirin ji te ra xelasiye. Tê hêdî-hêdî bihelî, li ber çavên min. Wê gavê ezê sifra araqê bixemlinim û tê bi terpiştî û bi vî awayî ezê te bidar de vebikim, bihejinim, tê gihîştî?

Hesen – Tu ji dawîya Hitler, Şah, Somoza bide berçavên xwe...

Serleşker – Û emê hê bêtir binin serê parvekar û qomînistan, te famkir ûlan?

Hesen – Sûç-bêşûç ji xwe vî yekê wun dîkin.

Serleşker – Emê bikin û em dîkin; emê li te ji bikin. Ka bêje: bi dîzi li hundir tevgera berxwedara sazîkî ne? Hemberî kî? Li hember me ne? Lê, emê xwezîyan di dilê we de bihelîn. Ûla-ûla deme wunê dewleta Kurda ava bikin ne? Çi Kurd; çi Kurdistan e? Ji Tirkan pêştir kî hene li ser vî erdî? Me koka we birrî û emê hêji bibirin. Em vî welatî bidestê tu kesî ra bernadin. Ûla ji îdolojîya Atatirk mezintir çi îdolojî heye. Haydê avakin, ka wunê çewa Kurdistanê avakin? Şêx Seit, 1938 Dersimê jibîr nekin! Emê we mîna goştê hûrkirî, hûr-hûr bikin. Ka te ji mîraniyê bixînim tu bibine.

Lingê wî pêşîyê girê de (îşkencekar dijar dest pêdike. Lingê wî girê didin. pîzmar li lingê wî didin, dawiyê wî datînin, rast didine seknandî. Ji cîyê destavapîçûk ve girê didin, kindirê daleqandî hêdî-hêdî dîkşînin. Hesen ber bi jorê ve bilind dibe. Ta serê pêşîyên lingê xwe. Ji êşê hatiye ber qeysa bêhişîyê. Serleşker di nava pîrs û cîran de nêzî Hesen dibe û wî bi ser tiliyên lingan ve dav dide û dike qêrîn.

– Pêl paniya bike. Pêl paniyê xwe bike.

Di vî rewşê de Hesen bê hiş bi werîs va dimîne.

Serleşker hêrsa wî neşikiya ye. Mîna gurê Sebatê çavsor:

– Wî hildin, wî hildin.. disa, disa.

TABLO VII

Qerdiyan – Fermo qomitanêmin, girtiyê we dixwesta.

Sawcî – Temam, derkev derva.

Were Muhsîn, rûnê li vî derê. Me gotibû ku emê li te bipîrsin. Çima te vî leystikê li me leyist? Ji bo bersîva pîrsan, tu serbestî, çewa bixwazî wî bersîv bide. Çima te di nav tevgereka wiha de cih girt? Amaca we çiye? We çi daye pêşîya xwe?

Muhsîn – Berî peyvê dixwazim vî kifş bikim ku; ji ser-xwebûn û azadiyê bi rûmettir tu tiştêk nîne.

Sawcî – Belê.

Muhsîn – Kurdistan, welatekî qolonî ye. Hem ji qoloniya kevnare ye li ser Kurdistanê.

Sawcî – Ev çiye; ev çi gotine? Ma tiştên wî ji hene? Çewa ketiyê bindestiyê; çewa vî dibêji?

Muhsîn – Bisekne, ezê bêjim. Bellê, gelê Kurdistanê ji mîna gellek gel'an, gel e. Û ji dirokê ve di gellek pêvajoyan de bihuriye û heta rojên me hatiye. Çewa ku keda insan zêde û kêrhatî bû, hêzên ne kedkar destavêtin keda zêdeve, bindestiya mirovî û gelan û dema kedxwariyê vebû. Bi diroka civaka çînî ve hêzên serdest destikên serdestî û pêkanînen kedxwarinê afirandine.

Gelê Kurdistanê ji Hind û Awrûpi ye û B.M. salên 100î de li hêlên gola Wanê, û bahra Hezarê li axa Mezrabota bicih bûne. Û vî derê kirine welatê xwe. Li hember împaratoriya Asûr, bi hevkarî û piştgirtina gelên Rojhelata-Navin ve şerrekê dirêj domandine û B.M. 612an de vî sazûmanê hilweşandine. Di vî pêvajoyê de, gelê Kurd digihîje rêyeka vekirî û xwe di vî dema serbixwe de dikemilîne. Di alî aborî, çandî, sinet û sazûmanîyê de pêşketinan pêktîne. Bi B.M. 550î de ji alî Persan em dibînin ku sazûmana Med tê hilweşandinê. Ji xeynî vî, dem bi dem mîna dewleta MERWANÎ, B.M. 900-1000î de, car-bicar di gellek alîyan de pêşde diçe. B.M. sedsala XIan de em dibînin ku qewmeke siwarî, ji Asya'yê, ku bi talanbaziye debara xwe dimeşîne, koçberî diji, zerpaz û qetliamkar û hêzeka hov em dibînin ku tê Anadolê. Yanî em qewmên Tirk dibînin. Ev êrîşên nuh, li hember rewşa cihgirtî, aborî û civata pêşketiya Kurd'a xwe nagirin. Lê, ev êrîş demek dirêj û li ser hev didomin. Ev hêza ku ne kedkare - Jiyana wan ku li ser êrîş û talanê pergal girtiye hemberê gelê Kurdistanê dibine bendeke dijar û li ser gelên hêlê dibin darê zerp û qetliam û talanê.

Sawcî – Tu vana ji ku dizanî?

Muhsîn – Bi gellek bişkaftinên îlmî û danezanan.

Sawcî – Bellê.

(Dûmahik heye)

QONAXA DAWÎYA XWESÎPARÎYÊ ...

(Destpêk di rûpelê 24an de ye)

dike. Emperyalizm, bona mayîna hebûna xwe, bona jîngari ajotina xwe, Rojhelata Navîn pir giring diderivene. Mina Libanê tê ditin, bi navê "hêza aşiti" êrişên xwe rastûrast dajo. Mina li êrişa ser Kurdistanê Başûr tê ditin, bi destê nokerên xwe, qomplo hwd. êrişan birêdixê. Her babet êrişên bi her teqûq jine de pêk tene. Ji hêlekî diwarî vana çak dike, ji hêla di, bona bikaribe pêşketinê biqulîbêne ser maf û doza xwe, her babet leyistokên veşartî û nemirovî sazî dike, dakû nav tevgerên him dibin de, meylên xwesîpar germ û zixtbike, û bi destê van hêzan planên xwe bihilmine û rêya helkirina çarawara şoreşger bixitimene. Demajoya heremê de tê jîyan, ger bo emperyalizm û paşverûkatîya xweyîçî, ger ji bo sosyalizm û hêzên gelan, mafê jîngariyê tê ceribandîne. Zelale ku, emperyalizm û paşverûkên xweyîçî, hazîrî û amadekariyên xwe, bi yek gav li ser vê rîknê pêktênin, êriş û qomployên hov û xwînaxwar pêşdixin. Vêna, ji ber ku hêzên şoreşger û radiqal hêj tenikî û kêmasiyên wan hene, bêtirs dikarin birêbixin.

Nexasim, ji ber vê rastîyê, li hemberê êrişên emperyalîzmê divê li welatan û gelemperîya xopanê, eniyên şoreşger yên bihim û zexm çap bibin. Beyî vê, tirsandina emperyalîzmê nerêdare. Herweha çin cilên li serxwe kiri bûn, lê ne yên wan bûn, vêca derdixin û davêjin, bi kesbûna xwe a

rast û tazi xwe pêşkêşî temaşê dikin. Ev ûst û rewş, bingeheke baş bo bizav û livbaziya xeta berxwedanê tenê ronahiyê. Xwesîparî û reformîstî, mîna hinkera Filistinê de tê şopandin, hişk lihevhatin û bihevrexebatdarî, bi emperyalîzmê re sazî dike û eşkeretî xwe dighijîne qonaxa bêbextî û îxanetê. Nuha, seranserîya pîrsgirêkê ev e; hêzên berxwedanê wê bikaribin ji vê rewşa, tûj û zelalbûyî mafên xwe re fêki bikşênin, an ne. Ango divê ev hêz gavê tali bê avêtin de, bi serkeftî xwe ji rewşê derxênin rojê. Emperyalizm hemû qozên xwe di Rojhaleta Navîn de, da leyistandin, an jî rastûrast leyist. Piştî plana Reagan û politikên din ketin zikakên alozî, tengasî û bêçarawariyê, pergala pîrsgirêkê sistemî behtir nexweş ketin û birindar bûn. Rewşa jîngar a heremê, rê nadê bi azînen reformîst û aşîtkar pîrsgirêk bîrî halkirin, jê re karlêkirî nasi nake. Bona ditîna vê rastîyê, meyzekirina ser Filistin û Kurdistanê bese. Ger mirov li van herdu welatan hinek kûr temaşê bike, dikare bi hêsanî rastî cihde bişopîne.

Berî civîna civata Awrûpî ...

(Destpêk di rûpelê 19an de ye)

emperyalîstên Awrûpî, bingeha demokrasîyê bi cih girtina "Dogru Yol" û "SODEP" hîlbijartînan de, diderivênin. Ev rastî şanî me dide, ku ev liberhevdan û dubendî ser kîjan rîknî ne. Tiştê tê parastin û palandin, iro sazûman destexwe digre komek bihevrexebatdar, mejindîna yên weke xwe û girsên gel de, behtir rê dayîn bo vebirîya gelê me ye. Bûna vê yekê di xwazin sazûmanê de xwedî peyv û gotin bibin. Herweha tê ditin, demokrasîya ser disekinin ev e ku, hêzên emperyalîst ji talanî bikaribên parbigrine û behtir gaf kirine. Ango ev "şerîni" tenê ji hin hêlwestên burjuwaziya yekdest newê xwarin, lê "wekhev" parbûnê xwestin. Sedema emperyalîstên Awrûpî ser Tirkîye hewqas dimînin ev e. Tewrê wan ne

parastina mafên mirovane û nikarê bibejî.

Mîna me li jor ji diyar kir, pîrsgirêk iro piştigirtina tevgera gelên me ye an jî a cunta ye. Ji ber ku mafên mirovani ji aliyên wan bixwe tîr perçiqandin, û bîlî baweriyên wan bo parastina demokrasîyê, iro li Tirkîye faşîzm gava bi gava bîngehsazî bûye. Ne tenê li hemberê gelên Tirkîye û Kurdistanê, li hemberê gelên heremê, hazîrîyên herbê heye. Ev sazûman, ji hêla hêzên emperyalîst tê kemilandin, sedarsed alîkarî digre û bi vî awayî amadekariya xwe berûpêş dike. Dema mirov leza pêşketinê xopanê de ji berçavî bîne, bizava hêzên demokratîk yên Awrûpa bo pişange û bîrbîrinê cunta, pir giring û pêwîst e. Şerê li hember dîktatoriya faşîst ji van hêzan alîkarî bigre, wê diwartir bikaribe bê ajotin.

Çima rojîya Mirinê ...

(Destpêk di rûpelê 4an de ye)

pergal û rengan xwe ji bo gihîştina vê armancê kar dike. Û di vî alî de gavên ber bi şerê gelî ve hatiye avêtinê, dixwaze tunebike, ji holê rabike. Ji bo vê pêkanîyê ji êrişên hêlên tixûb didomîne, hêl û gundên stratejî avadîke, ji bo hev girtina şoreşgeran û gel ji hev bipejirine, destûkan dixebitîne. Ku di aliyên vê armanc û xebatên xwe da pêşverûkên hêlê û emperyalîst piştigirtiyên wî re û bi hevkarîya "hêza çeleş" ev yek gihîştîye qeysa bilindî û şerê vekirî. Ku cunta li hêlên gundan karbûna qirkirina pêktîne. Ji alîkî ve di girtixanan de kuştina şoreşgeran, di alî din da ji li hêlên welat zerpo û êrişa xwe li ser gel diwartir dike. Ku tevger û tekoşîna Rizgarîya Netewa Kurdistanê tune bike.

Hêsiyên şer bi vê berxwedana mirîna rojîyê, pêkanîyê û êrişbazîya dijîminê qolonîalist armancîkirine ku daxuyanê gelên cihanê bikin. Ew ji bo jiyana gel û tekoşîna jiyana xwe bizanebûnê hember diwartiyên qolonîalistan danîne holê û li hember vê armancê xwînrij rawestîya ne.

● Ji hêla din ve, berxwedana rojîya mirinê, berxwedana girtîngeha leşkerî ya Diyarbekir bûye domandane berxwedanên girtixanên Tirkîyê ku di 7ê Tirmehê de destpêbûn û netîceka berbiçav bi destnexistîne, bi vê berxwedana xwedî taybetên bi hêz, armancên cuntayê ku li ser girtixanên Tirkîyê dixwaze pêk bîne hember wan armancan ji berxwedanê bilindkirîye.

"Ez dilxwazekî PKK ..."

(Destpêk di rûpelê 15an de ye)

destavêtin bûkamin û kêfa xwe pê anîn." Kal ji alîkî ve dipeyîvî, ji alî din ve li rûyê xwe dida û digot "ez naxwazim bijim, di-xwazim bimirim."

Roj, di bin zerp û hingavtînan de derbas dibûn, jîyanê bidebar bû. Yê eşkere nedikirin, an yê tişt li ser wan nedihate îspatkirin, berdidan. Yê bîrîyarê berdanê diderheq wan de dihat dayîn, navê wan dixwendin, lê ji me re digotin "xatîran ji hevalên xwe bixwazin, derheq wî de bîrîyarê bidarvekirinê hatiye sitandin, emê wî bibin bidarvekin." Hinek hogirên me bi darê zorê diçûn, hinek ji bi serbilindî, bi mîrani diçûn. Em paşî pê hisiyên ku ev leyistok e. Armancê di şavtirsandina psikolojîk û bergirtina berxwedanê bû.

Dema min berdan, vî tiştî ji min re ji gotin. Dema min berdan, timî sancû di zikê min de bû. Çûm ser hekîmekî. Hekîm got "gurçîkê te îdap girtine." Got ji serma û hingavtîne ye. Min got raporekê bide min, lê wî got "ev ne di destê min de ye, nikarim".

Çend meh di navde derbas nebû car din min girtin. Vê carê ez rojekê girtî mam. Piştî hinek lêdan li min kirin, min berdan. Êdî her serê pênc-şes rojan carekê min digirtin. Lê weke berê min domdirêj girtî nedihîştin. Ev yek ta sala 1981ê berdewam kir. Cara dawî di sala 1983an de min girtin...

Disa dema bi ser gund ve gîştin, piştî bi hemû gundiyan re li min ji dan û hingavtînan, bi çavtirsandîne gotin; "tu bi rewşa Ruhayê zani" û min berdan.

● Bimre Cunta Faşîste Kedxwar!

● Biji Tekoşîna Serxwebûna Kurdistan!

Dilxwazekî PKK

BANG

Em, rencgahên (zindanên) mêtîngeran de agirê berxwedan û berrabûnê pêlûgeş kirên. Ji xwîna KAWA yê hemdemi MAZLUM DOĞAN û rêhevalên wî; bûye malê dirok û mirovatîyê, ber bi pirozbayîya NEWROZ'ek nûh ve diçin.

Hêzkesîya pêşenga gelê me de, dij zinatê, ala serkeftina berrabûnê damizandên gelên Rojhelata-Navîn; roja 21 ê Adar'ê, bili sedsalên derbasbûyî, ger bin nîr û qeydên kedxwaran de be jî, hersal agirê berxwedanê jî nûh ve de dager dîkin; û cîlsa vê rojê ser bandavên çîyan bi navê cejna NEWROZ, tê pirozkin.

Domana sedsalan bin pikolî û kedmijandina bêsînor, hatî girtê gelê me, di rojêke bîvî babetî, dilxwaziya xwe bo yekîtî, tekoşin û berxwedanê yekcardin berbizman dîke. Vê rojê, hersal rêhaceta jî nûhve de za û jînbûne dîke. Bêvî pêşîya sîtemkariyê situxwarkirin, giyana (rûhê) berxwedana hêza Medîya û lehengê wê KAWA jîngar dîkê gelê me, hersal bi tuj û dijiwarkirina gir û hêrsa xwe li dij mêtîngeriye, vê rojê pirozin dîke.

Pîştî tekoşîna rizgariya Kurdistan giha qonaxên nûjen pêde, bi têdayîkî rûmetir xemiliye cejna NEWROZ: xwe dirêjî MAZLUM DOĞAN'an kir, ku bo serxwebûn û azadiyê, zindanên mêtîngeran de, hemberê zîlm û zordariyên çavsor, ser bîngeha berxwedana bêhempa, peltên agira berrabûnê dadane. Newroz, jî ber vê sedemê, tekoşîna diroka gelê me de, bûye sadirê nişanek nûh a xwebûnê.

Pay tariya pêvajoya qurna salan, bi rêya xogirên çarekdin jîn kirinê, bi têdayîkî hêja him bûye serpahtîya berxwedana me Newroz: li dij mêtîngeran, paşveçûyên xweyicîh û li hemberê dîtînen jî her rengî yên reformîstên xwesîpar û xwedestdar, bûye giyana berxwedana gelê Kurdistan ku enîşka tunebûna netewî de bû, bin rêberîya proletarya tê ajotin bi tekoşîna rizgariya netewî cîhê xwe girtiye û bin berpirsiyariya rasti, bona wê şer dixwazê, bi rûmetîkî hemdemi-netewî bûye warê dirokê.

Ji dema bin pêşenga proletarya tevgera me a rizgariya netewî afîriye virde, qestî hebûna gelê me dijiwartir dikên mêtîngerên Tirk, her babetê erîş û vebirîyên xwe û planên tunekirina gelê me derxistne merhelên bilindtirin, bi azînen nenasê-hemdemi û hovber bi sedan militanên şoreşger kuştine û xwestine bi vî awayî zexma berxwedana gelê me bişkênin. Belem, diji va bikaranînan hundurê welatê, ser baniyên çîyan, li berîyan, di rûreşîya mirovatî rencgahên faşîst de, ala berxwedanê berbîjor bûye û bili hundakirina jiyana keleş û mîrxasên gel, mêtînger jî aliyê rêzanî (siyasî) de, hatine binkeftin kirin.

Dijmînê dît ku tekoşîna me a rizgariya netewî bi rewşekî him û hêz jî nûh ve de agir girt, bi tîrsê erîşî wir û vir dîke. Ger jî hêla neyar û hevalbendên wî yên derveyî hêzên emperyalîst, ger jî jî hêla bi wan re xebatamadekarên burjuvên piçûk yên reformîst, hilweşandina tevgera proletarya tê xwestin. Li dij planên wan, yekîtî û piştgirtî, bêaxaf bûye armanca hewce. Ev dem, demêke ku li hember dijmin li dora tevgera proletarya mîna yek-kulmê em xwe bicivînine. Em bona, piştgirtîna tevgera serxwebûn û azadiyê a li welatê ajotin, bi cîh bînin, bona yekîtî di nav welatperwerên Kurdistan bîngeh bikin û bona şîyariya wanan zelaltir bikin, daxwaza me ye ku em Newroz'ê bi hev re pirozbayî bikin.

Bona vê yekê, şevên Newroz'ên sazibûne de girînge em agirê berrabûnê carek din pêlûgeş bikin!

Newroz bi xwîna Mazlum Doğan'an, Ferhat Kurtay'an û hogirên din avibûye, hewceye em wê biqulbênên hacetên yekîtîyê, dilsoziyê, hevalbendîyê û tekoşînê!

Divê em, cejna xwe Newroz, di şevên berûpêş bibin de, bi hev re piroz bikin, dengê xwe a berxwedanê carek din qêrîn bikin!

- KAWA YÊ HEMDEMÎ MAZLUM DOĞAN Î
HEVALÊN WÎ YÊN RONAKREWAN BÊ MÎRÎNÎN!
- BÎJÎ SERPAHTÎYA BERXWEDANA ME CEJNA NEWROZ!

SERXWEBÛN

NEWROZ

